Arşîva Bîra Kurdan: Ana-Helena Krulich-Ghassemlou têkoşîna Kurdên Îranê û Ahmad Faroughy jî rewşa gelên li Îranê dinirxînin! (1979) ▶R.12

LE MONDE diplomatique kurdî

Sibat 2011 - Hejmar 15 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

**Camille Sarret**
Li welatên Asyayê, Mexrebê û li welatên din yên Afrîkayê rewşa tevgerên femînîst çi ye?
Gelo ev tevger ji têkoşînên neteweparêz derhatine?
▶ R. 7

**Cathy Fourez**
Her çîrokeke jiyanê yekane ye, lê belê yên feqîran dişibin hev; tenê di vegotinên wan de, mîrateke hevpar a xiraker xuya dibe. Li zindana Santa Martha Acatitla ya Meksîkayê rewşa jinan…
▶ R. 8

**Maurice Lemoine**
Amerîka Latînî çima çav berda Rojhilata Navîn? Piştî Kuba, Venezuela, Nîkaragûa û Kosta Rîkayê kîjan welatê Latîn Amerîkayê di dorê de ye ku Filîstînê binase?
▶ R. 9

**Marc Lavargne**
Çîroka serhildana Başûrê Sûdanê kengê û çawa dest pê kir?
Gelo hêvîya di çarçoveya dewleteke yekpare de, mafê wekhevîya tevahîya sûdanîyan, mir?
▶ R. 10

**Sébastien Guex**
Gelo bi rastî jî dawîya sira bankayên swîsreyî tê? Ev sir di navbera welatan de dibin sedemê kîjan pirsgirêkan. Washington çima ji Bernê gilî û gazindan dike?
▶ R. 22

KURDÊN SÛRÎYÊ

# Hişyarîya bi xwe, di navbera nasnameya niştimanî û neteweyî de

MARWAN OTHMAN *

### Navendîbûna nebeşdarîyê, asoyeke giştîyane

Di bin sîwaneke siyasî a berfireh de, ku wan velû dike, dijîn. Sîwan, weke gumanekê, xwe li ser hebûna wan a dîrokî vedigire. Di gumana hebûna xwe de, kurdên Sûrîyê dixwestin ku xwe li qada siyasî û qanûnî peyda bikin. Dergeh girtî bûn. Hişyarîya xweyînî, ya "bi xwe", di hokar, merc û pêvajoya afirandinê de pirsgirêkane bû.

Ji damezirandina dewleta Sûrîyê ta roja îro xweyîna kurdên Sûrîyê ya rewa û zagonî pêk nehatîye an wan nedikarîbû pêk bînin. Tarîtîyeke mezin li ser wan hatibû vegirtin an nikarîbûn şanên hebûna xwe diyar bikin. Çavên wan li alîyên din ên sînoran diman. Bi qasî ku sînor li ba wan dibûn nêrgizên hêvîyan, ji bo hêz û navendîkirina qad û asoyê karê wan re jî dibûn herifandinek berdewan. Nasnamene firehalî û heya radeyeke mezin li dij hev û pirsgirêkane ew dorpêç dikirin. Bi qasî ku ew nasname gerekîya xwe ya dîrokî-komelayetî di nîr û hoyên hebûna wan de didîtin, ew qas jî qelsî û kêmbandorî davêtin nav liv û tevgera wan. Nasnameya xwe bi sînoran re dihûnandin û sînor, di bendewarîyên wan de, dibûn spîdeya hilatina dîrokeke nû.

Gava ku kurdên Sûrîyê nikarîbûn xwe bi xwe bibînin, xwe di birayên xwe yên li alîyên din ên sînoran de didîtin. Gava ku wan nikarîbû hebûna xwe ya siyasî di cografyeke siyasî a nû tête damezrandin de, bi dest xin, bi awayine dastanî hebûna xwe ya neteweyî parastin û heya radeyeke mezin hebûna xwe ya xwezayî di herêmên xwe de berdewam kirin.

### Komelgeha navxweyî û nasnameya neteweyî

Desthilatdarîya komelgeha navxweyî li Rojhelata Navîn, bi gelemperî li ser bingeh û binyadên ol, êl û malbatê û li gor pêdivîyên wan tê ava kirin. Dema ku dewlet bi sazî û dezgehên xwe ve tunebe an kêm hebûn û bandor be, rola serekî di komelgehê de dibe a komelgeha navxweyî. Ev yek dibe sedem ku bîr û boçûn li gor vê pêkhatina civakî-siyasî ya serdest werin bi sînor kirin an – bi awayekî ji awayan- rengvedana vê pêkhatinê bin.

Herêmên kurdan li Sûrîyê, berî herifîna Împeratorîya Osmanî, bi herêmên kurdên bakur ve girêdayî bûn. Ji ber hemû herêmên kurdan li Sûrîyê dirêjahîya herema bakur in û em dikarin koçberî û cihguhertina kurdan ji navçeyekê bo yeke din tê bigihêjin û em dikarin bandora mezin û dîrokî ya ku serkirde û ronakbîrên bakur (1) li kurdên başûr kirine, şirove bikin. Berî ku sînorên avakirî di nav herêmên kurdan de, akamdar bibin, civaka kurd li Sûrîyê, bi hemû nirx û bingehên xwe ve wêneyek ji komelgehên beşên din ên Kurdistanê bû.

Komelgeha kurd, heya destpêka sedsala 20ê di bin bandora hizir û ramanên ol û êlperestîyê de bû û dam û dezgehên navxweyî ji yên hikûmeta navendî desthilatdartir bûn, tevî ku -gelek caran- ew dibûn destê navxweyî yê desthilatdarîya hikûmeta navendî.

Di dawîya sedsala nozdehê û destpêka sedsala bîstê de, hîn jî jîyana civakî li piranîya navçeyên kurdî li Sûrîyê -ya ku dûv re wek welat û dewlet hate damezirandin- xwedî taybetmendîyên komelgeha koçerîyê bûn. Tevî ku hin navçeyan jîyana koçerîyê ji mêj ve derbas kiribûn jî, lê bandor û akama wan li ser komelgehê kêm bûn.

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK, Swêd: 50 SEK, Swîsre: 6,50 CHF, Tirkiye: 7 TL

## LI CÎHANA EREB PÊLA ŞOKÊ

Dema ku agir bi fitîla çirûskê ber bi barûdê ve dibe, dikeve, xuya nake. Li Tûnisê ev agirê bi fitîlê ve nêzî mehekê şewitî û paşê Zeynelabidîn Bin Elî ji textê desthilatdariyê anî xwarê: nûçegihanê Le Monde diplomatique yê taybet birêveçûna rûdanan heta bi encamê şopand. (Olivier Piot, rûpel 14). Wê çi biqewime? Hebûn û koza sereke ya serhildana Tûnisê ango spontanbûna gelo wê têrê bike ku statukoya aborî û civakî serûbinî hev bike (Hicham Ben Abdallah El Alaoui, rûpel 18, û Amin Allal, rûpel 16)? Li Misirê hêrsa civakî ya ku bi agirê Tûnisê gur û geş bû, desthilatdariyê neçar dike ku manevrayan bike (Sarah Ben Néfissa, rûpel 21). Li Cezayîrê, tevî tepisandin û darê zorê jî serhildanên piçûk zêde dibin (Kader A. Abderrahim, rûpel 20).

JI TÛNISÊ HETA MISIRÊ, JI SÛRÎYÊ HETA YEMENÊ

# Gava rejîmên ereban dihejin

RIZA DÎNÇ

Ji Bakurê Afrîkayê heta Rojhilata Navîn gelek welatên ereban ji serdemeke bi xirecir derbas dibin.

Protestoyên bênavber yên ku di dawîya salên derbasbûyî de li Tûnisê dest pê kirin û her ku çû veguheziyan berxwedaneke sîvîl, kir ku serokdewlet Zeynel Abidin Bin Alî ku 23 sal bûn li ser desthilatdarîyê bû welêt biterikîne. Xwepêşandanên ku bi navê "Şoreşa Yasemîn" jî tê bi nav kirin, di maweyeke kurt de, di serî de li Misirê, li gelek welatên ereban belav bû. Kursîyê serokdewletê Misirê Husnu Mubarekê ku ev 30 sal in desthilatdar e, hejiya. Ji Cezayîrê heta Urdunê, ji Sûriyeyê heta Yemenê, li gelek welatên ereban, bi sedema ku protesto bêne kêm kirin, di kabîneyan de guherîn têne kirin, sozên bi rengê "cara bê em nabin berendam" têne dayîn, behsa pêkanîna reforman têne kirin.


Ev geşedanên ku li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn ji nişkave pêk hatin û kes ne li benda wan bû, li hinek deveran wekî "Şoreşa Ereban" tê bi nav kirin û tê nirxandin ku ev yek wê li ser rejîmên li herêmê bandora domînoyê pêk bîne. (1) Dîsa li gor hinek nirxandinan, paralelîyek di navbera van bûyeran û rûxandina Bloka Rojhilat ku di dawîya salên 1980yê de pêk hat, heye û şîrove têne kirin ku heye dîktatorîyên li Rojhilata Navîn jî bi vî awayî ji holê rabin. (2)

### Li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn karakterên wek hev ên rejîmên ereban

Dewletên ereban ku xwepêşandanên protestoyî bi awayekî gur û geş lê pêk tên, xwedîyên strukturên sosyo-ekonomîk û rejîmên siyasî ne ku gelek dişibin hev. Urdun û Fas ne tê de, nêzî tevahîya welatên Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn, bi rêveberîyên komarî yên ku xwe dispêrin sîstemeke serokatîya otorîter û xurt, têne bi rê ve birin. Ev rêveberîyên ku piranîya wan bi derbeyên leşkerî hatine ava kirin, hê jî di bin vesayeta olîgarşîya leşkerî de ne û bi piranî jî rejîmên otokratîk in ku xwe dispêrin yekpartîtîyê. Li Tûnisê Zeynel Abidin Bin Ali, Li Sûdanê Omer El Beşîr, li Yemenê Ali Abdullah Salih, rasterast bi derbeyên leşkerî hatin ser desthilatdarîyê. Li Sûriyeyê Beşar El Esed, kete cihê bavê xwe General Hafiz Esed ku berê bi piştgirîya artêşê, bi riya derbeyê hatibû ser kar. Li Misirê Husnu Mubarek, kevnegeneralek bû û hê jî bi piştevanîya artêşê, desthilatdarîya xwe didomîne.

Li van welatên ku mafên siyasî bi her awayî têne sînor kirin, bênavbir rejîmên rewşa awarte têne pêk anîn, partîyên cihêreng an jî dijber têne qedexe kirin û rê li ber beşdarîya wan a hilbijartinan tê girtin, parlamentoyên heyî bi piranî wekî organên yekdeng

▶ R. 6



FEWZÎ BILGE: **Payîz V**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 40 x 38 cm

www.arsivakurdi.org

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## Hizbullah, PKK û hikûmeta AKPyê

Piştî ku di xala 102. ya Qanûna Cezayî ya Tirkîyeyê de guhertin hat kirin û maweyên destesermanê hatin bisînor kirin, ji 1ê çileyê û vir ve gelek endamên Hizbullahê jî hatin berdan. Di nav wan kesên berdayî de, rêvebirên pêşîkêş yên vê rêxistinê Edip Gümüş û Cemal Tutar jî hebûn ku piştî demeke kurt xwe dan alî û neçûn qereqolan û îmze jî nedan.

Hevdem di 15ê çileyê de Ajansa Nûçeyan a Firatê (ANF) nivîsand ku Hizbullahê li hember PKKyê agirbestek ragihandiye û gotiye ku "heta ku kêr negihîje hestî" ew xwe ji êrişan dûr dihêlin û ji peymanan re jî vekirî ne. Vê serbestberdanê gelek şirove û rexneyên li dijî hikûmeta AKPyê û dadgerîya tirk jî digel xwe anîn. Herweha hat îdîa kirin ku AKP digel Hizbullahê peyman danîye.

**AKP, ji mêj ve ye li Kurdistanê li dijî tevgera azadîxwaz a kurd, îslamîzasyonê bi kar tîne**

Di nivîsê de wekî din tê nîqaş kirin ku AKP dê vê yekê li gor berjewendîyan biguherîne. Nivîs weha didome: "Bê guman AKP, li dijî tevgera azadîxwaz a kurd, li Kurdistanê îslamîzasyonê ji mêj ve bi kar tîne, daku dengên xwe zêde bike û dê mîlîtanîzma îslamî ya ku bi serbestberdana endamên Hizbullahê careke din vejîya, bi kar bîne." Di dawîya nivîsê de tê gotin: Hêviya AKPyê ew e ku Hizbullah li dijî tevgera kurd jê re bibe alîkar.

Ji alîyê din jî, di 14ê çileya 2011ê de beşa BBC ya brîtanî beşa tirkî hevpeyvînek digel Gareth Jenkins, di warê rêxistinên çekdar ên li Tirkiyeyê bispor, weşand. Birêz Gareth di hevpeyvînê de dibêje ku serokê heqîqî ê Hizbullahê li Ewropayê dijî û ev rêxistin dê digel kadroyên xwe ku ji girtîgehan hatine berdan, xwe ji nû ve organîze bike, lê belê ne dîyar e ka ev kadroyên serbestberdayî dê bikarin xwe hînî stratejiya nû ya Hizbullahê ku bêhtir sîvîl e, bikin.

**Hizbullah êdî bêhtir nasnameya kurdî dide pêş û herçend di dema avakirina rêxistinê de qala kurdîtîyê nedihat kirin jî, niha di xebatên xwe de zimanê kurdî digel zimanê tirkî bi kar tîne**

Şarezayê brîtanî wekî din dibêje ku Hizbullah bi PKKyê re di nav pêşbirkê de ye ku bandora xwe li ser xelkê zêde bike û ji ber vê yekê daku piştgirîya xelkê werbigire giranî dide nasname û neteweperestîya kurdî. Goya mebest ew e ku îslam û neteweperestîya kurd bên tevlihevkirin û Kurdistan wekî ku di dîrokê de weha bû, di nav cîhana îslamî de bikin xwedî îtîbar.

Hizbullah herweha Sa'îdê Nursî jî wekî avakarê ruhanî ya rêxistinê nîşan dide û bi vî avayî hilweşandina bandora Fetullah Gülen a li Kurdistanê ji xwe re dike armanc. Gareth Jenkins dibêje ku li Kurdistanê têkoşînek di navbera PKK û tevgera Gülen de heye û niha Hizbullah jî, tev li vê yekê bûye.

Gareth Jenkins guman dike ku di hilbijartinên 2011ê de, ji ber ku Hizbullah bi rêxistinên xwe yên civaka sîvîl ve xwedîgirseyekê ye û dikare li hember AKP û BDPê ya sekuler bi namzetên xwe yên serbixwe bikeve hilbijartinan.

Li gor daxuyanîyên serokê PKK Abdullah Öcalan ku tê de gotibû serbestberdana endamên Hizbullahê karê plankirî yê dewleta tirk e, ew dixwaze vê rêxistinê li dijî PKKyê bi kar bîne, Jenkins dibêje ew bawer nake ku ev tişt hatibe plan kirin, lê belê mumkin e, çawa ku li Filistînê Hamas li hember El Fetih derketibû, li Tirkiyeyê jî Hizbullah li dijî PKKyê rola Hamasê bilîze.

**Heger Hizbullah û PKK mîna salên 90ê şer bikin, ji vê yekê herî zêde dewleta tirk dê sûdê werbigire. Ji ber ku ev yek hêza her du alîyan jî dişkêne, dê bi kêrî tevgera Gülen jî bê.**

Lê li ser gotina xwe zêde dike û dibêje, Hizbullah dikare bêhtirî PKKyê li nav bajaran tev bigere û PKK hertim xwe ji şerekî li dijî Hizbullahê dûr hîştiye. Di dawîya hevpeyvînê de pisporê brîtanî dibêje ku PKK di warê hucreyên bajarî de bi qasî Hizbullahê jêhatî nîne û giranîyê dide rêxistina girseyî ya civakî. Lewma hertim hêzên dewletê pir bi hêsanî karibûne wek sîxur bikevin nav wan, lê belê Hizbullah ji bo deşîfrenebûna ragihandina xwe, di nav hewldaneke mezin de ye.

## Sûdan û Kurdên Îraqê

**Divê îraqî kurdan wekî kesên ji xwe bibînin û mafên wan ên destûrî nas bikin. Yan heger hewlê bidin ku pirsgirêkê bi riya şer û zextê çareser bikin, wê demê ya li Sûdanê bûye, dê li Iraqê jî çêbibe.**

Piştî referandûma li Sûdanê, di 19ê çileyê de rojnameya Rûdawê hevpeyvînek digel serokwezîrê berê yê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî kir.

Di hevpeyvînê de serokwezîrê berê bi bîr dixe ku li gor madeya 140ê a destûra Iraqê diviyabû di sala 2007ê de referandûma li ser Kerkukê bihata li dar xistin, lê ev yek pêk nehatiye û koalîsyona Kurdistanê dozê dike ku referandûm di nav du salan de an di sala 2012ê de bê li dar xistin. Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malikî jî di vî warî de digel kurdan hevbîr e. Wî wek din gotiye ku heger pêkneanîna referandûmê tê wateya binpêkirina destûra welêt, ew dê hemû riyên guncaw ên siyasî û hiqûqî bi kar bînin daku referandûm pêk bê. Nêçîrvan Barzanî li ser gotinên xwe zêde dike: "Ji ber ku ev mesele rasterast bi aştî û pêşveçûna Iraqê re têkildar e, divê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê jî di pêkanîna referandûmê de israrê bike."

Barzanî herweha dibêje "ji niha û pê ve, ji serokdewlet Celal Talebanî heta hikûmeta herêmî, peywira hemû kurdan e ku di warê sepandina vê referandûmê de digel hukûmeta navendî hevkarîyê bikin".

Sebaret bi rewşa li Sûdanê jî serokwezîrê berê dibêje ew pê kêfxweş e ku nemaze li welatekî ereb ê misilman kêşeyeke nijadî- neteweyî bi riyên şariştanî tê çareser kirin. Wî herweha daxuyanîyên rewşenbîrên ereb ku tê de ji ber nebûna edaletê doza lêborînê ji sûdaniyan û kurdan dikin, bi erênî dinirxîne û dibêje ev yek hişdarîya rewşenbîran nîşan dide. Barzanî di dawîyê de weha dibêje: "Ji sala 1992ê û vir ve, di çarçoveya mafê çarenûsî de gelê kurd li Iraqê ji xwe re federasyon hilbijartiye û digel parçeyên din ên Iraqê di nav aştîyê de





Hîn ne dereng e!

Hûn dikarin salnameya bi zimanê kurdî û bi wêneyên şêwekarên kurd yên bi nav û deng bikirin:

Ebada biçûk: 5€ + heqê postayê
Ebada mezin: 10€ + heqê postayê

LMdkurdî



**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Celîl Kaya
Semra Polat
Ergün Yetkiner

**Revîzyona Wergeran**
Simko Destan
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Webdeveloper**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

# Ya nemumkin diqewime

SERGE HALIMI

Berpirsîyarên siyasî hez dikin behsa "tevlihevîya" tiştan bikin da ku rave bikin ku daxwaza veguherandina wan, dînane ye. Lê belê di hin şert û mercan de her tişt dîsa gelekî hêsan dibe. Çawa ku, weke mînak, piştî 11ê îlonê, kevneserokê DYAyê George W. Bush li ser herkesî ferz kir ku di navbera "*me û terorîstan*" de tercîha xwe bike. Li Tûnisê ev tercîh di navbera dîktatorekî dost û "*rejîmeke mîna ya Talîbanan li bakurê Afrîkayê (1)*" de bû. Alternatîvên bi vî rengî protagonîstan xurt dikin: dîktator dide zanîn ku ew tenya keleha li dijî îslamperestan e; îslamperest jî xwe weke tenya dijmina dîktatorîyê didin nîşan.

Lê belê heke tevgereke civakî yan jî demokratîk bike ku aktorên koreografiyeke heta hetayê kilîtkirî derkevin holê, hingê nîzama baleyê xira dibe. Ji ber rewşa xwe ya zehmet, desthilatdarî di xwepêşandan û protestoyên gel de guhên xwe li şûn û şopên herî kêm ên "kirinên dij dewletê" bel dikin. Heke hebin, ew wan bi kar tîne û sûdê ji wan digre; heke nebin jî, ew wan çêdike.

Erefa reva Zeynelabidîn Bin Elî ji welêt, ango 13ê çileyê, rewş bi vî rengî bû. Li hemberî sefîrê Tûnisê yê UNESCOyê Mezrî Heddad, muxalifê dîktatorîyê yê laîk Necîb Çebbî "*modeleke pêşketinê ya ku mûçeyên kêm weke yekane feydeya liberhevgir a hevrikîya navneteweyî bi kar tîne (2)*" gunehbar kir. Wî êrîş bire ser "*danîşana provakatîv a dewlemendîyên neexlaqî yên li bajarên mezin*", işaret pê kir ku "*tevahîya xelkê welêt vê rejîmê ne ji xwe dibîne*". Heddad aramîya xwe ji dest da: "*di demeke nêzîk de ew ê bên hundirê qesra te ya li Marsayê, da ku talanê te rakin, ji ber ku mentiqê tevahîya civakên ji cendermeyan natirsin, ev e.* [...] *Bin Elî Tûnis sala 1987ê ji qefleyên bêkêr û beredayîyan ên fanatîk û tundrew rizgar kir* [...] *Çi dibe bila bibe, divê ew desthilatdar bimîne, ji ber ku qefleyên bêkêr û beredayîyan ên tundrew û nûbolşevîkên ku hevgirên wan ên stratejîk in, gefan li welêt dixwin.*"

Dîsa jî çend saetan piştre, Heddadî xwest ku "rizgarkerê Tûnisê" welêt biterikîne. Çebbî jî 16ê çileyê bû wezîrê pêşxistina herêmî yê welatê xwe... Gelên ereb her roj şoreşan nakin, lê ku dikin bi lez dikin. Di navbera xweşewitandina Muhemmed Bûezîzî, defterên gilî û gazinên mezinên lîseyê yên bêkar, bidestxistina qesra Kartacayê ya malbata Trabelsî, azadkirina girtîyên zindankirî û doza jêbirina îmtiyazan a gundîyên hatin Tûnisê de, ya rastî, mehek derbas bû.

Beyî ku bi rengekî misoger îşaret bi Şoreşa Fransayê bike, dewra dîrokî ku Tûnisê şahidî lê kir, bi me nas xuya dike. Tevgereke jixweber belav dibe, tevahîya tebeqeyên civakî yên gelekî cihêreng kom dike; desthilatdarîya mutleq diheje. Divê bi lez biryar were dayîn û tercîh were kirin: yan mirov wê dev ji lîstikê berde û tiştên bi dest xistî bide hev, yan jî ji bo ku karê xwe du caran ji berê zêdetir bike, lîstikê bidomîne. Di vê kêlîyê de beşeke civakê (bûrjûwaziya lîberal) çalak dibe, da ku çem bi ser cihoka xwe ve bibe; yeke din (gundî, karmendên siberoja wan nemisoger, karkerên bêkar, xwendekarên ku statuya wan hatî kêmkirin) dikeve şert ku şapeya protestoyan wê pêşî otokrasîyeke pîr dibe û klaneke yekdestdar bide ber xwe û bibe. Wekî din, ev tebeqeyên gel, nexasim ciwan pê nahesin ku jiyana xwe xistine tehlûkeyê da ku yên din ku bi qasî wan wêrek nînin, lê baştir hatine danasîn, ji rewşê sûdê wergrin û heman pergala civakî biparêzin, lê belê ji pirzikên polîsiyê û mafyawarîyê paqijkirî.

Li gor vê îpoteza dawîyê, dê şerê li dijî dîktatorîya ferdîkirî ya malbata Bin Elî fireh bibûya û veguheriya ser şerê li dijî serdestiya aborî ya olîgarşîyekê ku ne dilê şirketên tûrîzmê, ne yê bazarên malî û ne yê Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) jî xweş dike. Heke ne ji bo tûrîstan, herêmên bazirganîya serbest û tevgerên sermayê be, ew bi xwe hez ji azadîyê nakin. Ji 19ê çile û vir ve ajansa notdayînê Moody's nota Tûnisê bi behaneya "*ji ber guhertineke mirov ne li bendê ya rejîmê, welat bê îstîqrar e*" kêm kir.

Şahî û kêfxweşî bi heman rengî li Cezayîr, Trîpolî, Beijîng û serokwezaretîyên rojavayî jî nebû. Dema ku girseyên piranîya wan misilman dirûşmên azadî û wekhevîyê digotin, Fransayê bi awayê xwe "nîqaşa" li ser hevgirtina di navbera demokrasî û îslamê de rohnî kir: wê "*zanîn û tecrûbeya hêzên* [xwe] *yên ewlekarîyê*" pêşniyazî rejîma Bin Elî kir ku textê desthilatdarîya wê diheje. Çi misilman, çi laîk yan jî xirîstiyan, olîgarşîyên desthilatdar dema ku xelkê wan serî hildide, pişta hev digrin. Li dijî tundrewên dînî, kevneserokê Tûnisê xwe weke stûna laîkiyê û mafên jinan îlan kir; ew serokê partîyeke endama Enternasyonala Sosyalîst bû: wî xwe spart .... Erebistana Suûdîyê.

Ka lê bifikirin ku li Tehranê yan jî Karakasê bi sedan cenazeyên xwepêşandêran ên bi gulleyên polîsan hatine qulqulî kirin, derdikevin holê... Berî bêhtirî sîh salan, di gotareke diyarker de, Jeane Kirkpatrick, mamosteya zanîngehê ya amerîkî ya ku hingê demokrat bû, libergirtineke bi vî rengî pûç kiribû (3). Li gor wê, rejîmên "*otorîter*" yên ku hevalbendên Rojava ne, timî çêtir in (û ew difikirî ku hêsantir tên reforme kirin) ji rejîmên "*totalîter*" ku mumkin e şûna yên "*otorîter*" bigrin.

Ev analîza wê çirîya paşî ya sala 1979ê hat weşandin. Vê analîzê namzetê serokatîyê Ronald Reagan ewqasî heyranî xwe hişt ku çawa hat hilbijartin, Reagan, nivîskara gotarê weke sefîra DYAyê li Neteweyên Yekbûyî dest nîşan kir. Kirkpatrickê li du stratejîyên dijberî hev yên ku Waşîngtonê di nav heman salê de bi kar anîn, kola: şoreşa îranî û şoreşa sandînîst a li Nîkaraguayê. Ew sedeman weha derdixe pêş, di her yekê ji van rewşan de ji bo destekkirina demokrasîyê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di bin serokatiya Jimmy Carter de, "*bi awayekî çalak hevkarî kir da ku otokratên tundrew ên ku li hemberî me kêm dostane ne bikevin şûna otokratên nerm yên li beramberî berjewendîyên amerîkî qenc bûn [Şahê Îranê û Augusto Somoza].*"

Hemin, her du rejîmên dawî li desthilatdarîya wan hatî anîn, gilî û gazin ji wan dihatin kirin: "*ew ji alîyê zilamên nehatî hilbijartin ve dihatin bi rê ve birin* [...] *ku ji bo girtin, zindanîkirin, mişextkirin û carinan jî wisa dibêjin* [bi rastî jî di gotarê de wisa dinivîse] *ji bo êşkencekirina li muxalifan, carna qanûna şer îlan dikin.*" Erê, lê belê Kirkpatrîck diwezinîne "*ew bi rastî jî beramberî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dostane bûn, wan zarokên xwe dişandin zanîngehên me, li Neteweyên Yekbûyî dengê xwe bi me re bi kar dianîn, ji bo wan zirar jî bûya bi rêk û pêk piştgirîya berjewendîyên amerîkî dikirin. Sefîrên her du hikûmetan mêvandarîya amerîkîyên xwedî hêz dikir. Şah û Somoza li cem me, li cihê ku gelek hevalên wan hebûn, mêvanên ezîz bûn.*"

Paşê birêvebirîya Carter a ku "*girtîyê şêweyekî fikrê pêşketinê yê roja me ku ji serdema rohnayîbûnê ve tesewwûrên rojavayî trawmatîze kiriye*" bû, destek da guhertineke rejîmê. Şaşîyeke bêyom: "*Waşîngtonê pirrengîya siyaseta muxalefetê ji ya heyî meztir hesibandibû –bi taybetî jî hêza 'derdorên nerm' û 'demokratan'– hêz û hişkbûna radîkalên di nav tevgerê de jî ji ya heyî kêmtir hesibandibû û bandora Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser hikûmet û muxalefetê şaş hesibandibû.*" Encama vê li alîyekî teokrasîya Ayetullahan û li alîyê din, sandînîst bûn.

Em tê de fikra "dîktatorîya herî kêm xirab" dibînin, lewra hevalbendên Rojava û îhtîmala dibe ku rojekê xwe baş bike (bi şertê ku em demeke bê dawî bidinê ji bo bigihîje wir), tirsa ku mumkin e tundrew (berê ev tirs ji komunîstan bû) li pişta xwepêşandêrên demokrat bin, ev hemû nû nînin û ji berê de hene. Lê belê van hefteyên dawîyê, asoyê Jeane Kirkpatrick weha xuya dike ku ji Waşîngtonê bêhtir Parîsê aciz û nerehet dike. Lewma rola jêbirî ya îslamperestan ya di serhildana tûnisî de –ya ku kir bereyeke fireh a civakî û siyasî li dijî Bin Elî were damezrandin– tirsa Dewletên Yekbûyî kêm kir û ew aş kirin. WikiLeaksê hisên Wezareta Derve ya DYAyê di derbareya "*rejîma mîna mafyayê*" û "*rejîma hişkbûyî, kevirgirtî*" ya eşîra desthilatdar de aşkere kiribûn; Qesra Spî serê xwe bi wan naêşîne, lewra bi hebûna serhildaneke lîberal û bûrjûwa piştrast e.

Lê belê serhildana tûnisî li seranserê cîhana ereb deng vedide. Teqemenîyên qeyrana tûnisî li cihine din jî peyda dibin: mezinbûneke aborî ya newekhev, bêkarîyeke zêde, protestoyên ji alîyê polîsekî zêde mezin ve tên tepisandin, ciwanên xwenda û derfetên kar peyde nakin, bûrjûwazîyên kurtêlxur ên ku weke tûrîstan li welatê xwe dijîn. Van sedeman hemûyan wê di heman demê de serê tûnisîyan neêşanda, belê wan nîrê çarenûsê û qederê ji ser xwe rakir. Li ser hev, li nav ser û çavên wan hatibû xistin: "alternatîv nîne". Li me hatibû vegerandin ku "carinan, ya nemumkin diqewime" (4) ...


1 Daxuyanîya Nicolas Sarkozy 28ê nîsana 2008ê li Tûnisê dayî

2 "L'invité de Bourdin & Co" ["Mêvanê Bourdin & Co"], RMC [radyoyeke fransî ye], 13ê çileyê 2011ê

3 Jeane Kirkpatrick, "Dictatorships & Double Standards" ("Dîktatorî û cotstandart"), Commentary [Şirove], New York, çiriya paşî ya 1979ê

4 Bixwîne: Slavoj Zizek, "Pour sortir de la nasse" ["Ji bo rizgarbûna ji xefikê"], Le Monde diplomatique, çirîya paşî ya 2010ê

Wergera ji fransî: Lokman Guldivê



## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



### Fewzî Bîlge

Fewzî Bîlge di sala 1962ê de li Mêrdînê, li Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyayê. Di heman salê de malbata wî koçî Qoserê kiriye. Heya lîse qedandiye li wê derê maye. Di 1978ê de li Zanîngeha Stenbolê, beşa wêjeyê xwendiye. Xwendina xwe ya duyem beşa zanistiyên civakî di Zanîngeha Marmarayê, di sala 1987ê de qedandiye û pê re jî di ajansên girafîkî de xebitiye.

Ji wêjevanekî bêtir wek wênesaz tê nasîn. Wî li çar aliyên welêt bi dehan pêşengeh li dar xistine. Şeş–heft salan di navendên çand û hunerî, di gelek beşan de, bi taybetî jî, di beşên hunerên şêwekariyê de berpirsiyarî girtiye ser xwe û gihiştiye gelek xebatên serkeftî. Bi sedan nivîs û xebatên wî yên wêneyan di kovar û rojnameyên kurdan yên wek Nûdem, Pelîn, Roj, Medya Güneşi, Jiyana Rewşen, Kevan, Tîroj, Evrensel ûwd. de hatine weşandin.

Fewzî Bîlge, di heman demê de yek ji damezirînerê Navenda Çanda Mezopotamyayê ye û li vê derê 6 salan xebatên xwe domandiye. Di van deh salên dawî de li Batmanê bi cîh bûye. Li vê derê atolyeyek bi navê "Soresor" ava kiriye û karên xwe yên hunerî didomîne. Ev çend sal in li Batmanê dijî û di kargeha xwe ya hunerên şêwekarî de gelek şagird gihandine. Di salên dawî de wek çîroknivîsekî tevdigere û pirtûka xwe ya yekemîn ji dosyayên xwe yên çîrokan bi navê "Jidilara" di 2002ê de weşandiye. Li gelek bajarên Kurdistan û Tirkiyê pêşengehên xweser li dar xistine.

Pirtûkên wî yên hatine çap kirin ev in:

Jidilara
(2002 Weşanên Sî)

29+1
(2005 Weşanên Belkî)

Dîn in
(2006 Weşanên Belkî)

Qahpikên kuçeyan
(2007 Weşanên Belkî)

Bi şev Mêrdîn stêrk in
(2007 Weşanên Avesta)

FEWZÎ BÎLGE: **Ba**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 50 x 80 cm

# Hişyarîya bi xwe, di navbera nasnameya niştimanî û neteweyî de (Dewama rûpela 1.)

Ji vir mirov dikare hin nîşanan li ser bingeh û xweristîya nasnameya neteweyî ya wê qonaxê bide; rast e di hicrik (2) û mêvanxaneyan de, kurdbûn wekî hest û hiş dihate gotin û pêkoline lerzdar jî bo bikaranîna zimanê kurdî dihatin kirin, wek yek ji stûn û rahêjerên hestê netewebûnê, lê rola bingehîn di hicrikan de ya nasnameya olperestî û di mêvanxaneyan de jî ya êlperestîyê bû.

Di dawîya Şerê cihanê yê yekemîn de û piştî şikestin û têkçûna serhildan û şoreşên bakûr li dijî dewleta tirkî, ya ku şûna Împaratorîya Osmanî hatibû avakirin, jimareke mezin ji ronakbîr, sîyastmedar û pêşawerên kurd ber bi alî Sûrîyê ve çûn. Ji xwe beşekî mezin yê herêmên kurdî, bi destê Fransayê, li gor peymana Sykes–Picot (1916) tevî nav dewleta Sûrîyê - ya nû çêbûyî - bûbûn. Wan kesayetîyên xwedî serpêhatî û ezmûn, karîn roleke mezin di avakirina nasnameya neteweyî di nav kurdên Sûrîyê de bilîzin. Rola wan li nav kurdên Sûrîyê bû sedem û bingehê serekî yê avakirina sazî, rêxistin û dezgehan (3). Ew komên rewşenbîrî û siyasî yên ku hatin avakirin, di civata kurdan de sînorên dam û dezgehên klasîk derbas kirin û hişyarîya neteweyî berfirehtir bû. Li vir nasnameya neteweyî hin rol ji nasnameyên din stand û mirov dikare -heya asteke destnîşankirî- bibêje nasnameya neteweyî bû nasnameya serekî.

Li alîyekî din ew sazî û rêxstinên neteweyî li ser asta destnîşankirina bazina navendî ji bo têkoşîna neteweyî hatibûn avakirin û bazina navendî ew bû ku hemû hêz, xebat û çalakî li dijî dijminê serekî werin terxan kirin û dewleta Tirkîyê wek dijminê serekî hatibû destnîşan kirin. Ev yek di daxwazên Xoybûnê (4) de bi zelalî hatibû eşkerekirin. Di wê demê de Xoybûnê xwestibû ku tu karê dijminayetî ne li dijî Îranê û ne li dijî Sûrîye û Îraqê werin kirin. (5)

### Mirov dikare mebesta Xoybûnê weha şirove bike:

1.Fransaya ku çarenivîsa gelên Sûrîyê di destê wê de bû tu rêbaz û siyasetên awarte li dijî kurdan neajot. Kurdan dikarîbûn sazî û rêxistinên xwe bi serbestî ava bikin. Ango berjewendîya neteweyî pêwîst dikir ku li Sûrîyê di paşeroj (musteqbel) a nêzîk de tu çalakî li hember Fransayê neyên kirin. Di belgeya damezrandina Xoybûnê de ji kurdan hatibû xwestin; ku tu mafên dîtir ji dewletên Sûrîye û Iraqê nexwazin (6) Lê berevajî vê yekê kurdan roleke mezin di çalakîyên li dijî Fransayê li Sûrîyê lîstin (7).

Di sala 1919ê de bi destên kurdan yekemîn gulleya yekemîn serhildanê hemberî Fransayê li Sûrîyê hate teqandin (8).

Di heman salê de şoreşa Îbrahîm Henano (9) yê kurd, wek mezintrîn Şoreş li bakurê Sûrîyê li dar dikeve. Û jimareke mezin ji çalakvan û şervanan kurd bûn.

Di sala 1920an de şerê Meyselûnê bi serdarîya general Yusif El-Azma yê kurdnijad (10) diqewime û di encamê de jîyana xwe ji dest dide. Ji evan herdu nimûneyan mirov dikare wêneyekê li ser rola kurdan a haykêş di çalakîyên li dijî dagîrkirina Fransayê ji Sûrîyê re wergire. Ji bilî van nimûneyan, kurd di hin dever û navçeyên xwe de, bi gellek çalakî û serhildanan li dijî hêzên Fransayê rabûn wek serhildana Amûdê 1926ê de û Toşa Amûdê (11) ya 1937ê de, bi serdarîya Seîd Axayê Deqorî (12). Di sala 1923ê de şerekî mezin li gundê Beyandûrê li dijî hêzên fransayê rabû. Beşdarîya kurdan di hemû şoreş û serhildanên ku li hemû deverên Sûrîyê li dijî Fransayê haykêş bû. Ev jî vedigere bandorên nasnameyên berî nasnameya neteweyî yên ku hîn di hişmendîya kurdan de beşdar bûn; wek nasnameya olperestî (13), û nasmameya êlperestî (14). Ji alîyekî din ve; kurdên ku di herêmen ereban de, ji mêj ve (15) niştecî bibûn, xwedanên roleke mezin di wan herêman de bûn (wek kurdên Şamê, Helebê, Humsê, Hemayê û hin deverên din) rol û cigehên wan ên civakî û abûrî ji wan dixwestin ku serkêşî an beşdarîyê di çalakîyên li dijî Fransayê de bikin. Ango hest û arezûyên olî, êlî û hokarên civakî û aborî xwedan akamdarîyeke haykêş li ser gellek beşên kurdan bûn.

2. Hin rewşenbîr û serkirdeyên kurdan dixwestin têkilî û peywendîyan bi Fransa û Britanyayê re xurt bikin da ku li dijî Turkîyê alikarîyê bidin kurdan bo avakirina dewleteke Kurdî. Nemaze Fransa û Britanya, piştî yekemîn şerê cihanî, di bin çavdêrî, serdestî û dagîrkerîya xwe de, bi hin awayan, bûn alîkar di avakirina dewletan ji ereban re (16).

Mebesta kesayetîyên welatperwer ên kurd ên ku daketin Sûrîyê, berdewamîya şerê li dijî dewleta trik û kirîyarên wê yên dirrinde li hemberî gelê kurd bû. Li vir xuya dibe çima rejîma Tirkîye weke dijminê sereke hatîye destnîşankirin (17).

Bi rastî ev hizra neteweyî ku di dema Xoybûnê de peyda bû, pêdivîyeke dîrokî bû –ger mirov bi dûrbîna kurtedemî lê binere-. Lê bi dûrbîna dirêjedemî ev hizira neteweyî yekalî û hinek seqet bû. Nîr û mercên nû ku bi avakirina sînoran re derdikevin, li ber çavan nehatin girtin, û ev yek jî bû sedem ku kurdên Sûrîyê bi çavên koçeran li xaka xwe binêrin an cudakirin û jihevdûrbûn, bi wateya abûrî, civakî û siyasî, ên ku di navbera herdu alîyên sînor- serxet û binxet de çêdibin an di pêvajoya çêbûnê de ne nebînin. Cudakirin û jihevdûrketin di navbera miletekî de ku di bin sîwana bêhtirî dewletekê de dabeş dibe, bi hêzbûna dewletê, wek desthilat û dezgeh, akamdar dibin. Ango gelê kurd li Sûrîyê û li Tirkîyê, di demên fermandarîya Osmanî de, di bin sîwana yek dewletê de dijîyan ji vê yekê di bin bandora yekrist- zagonî de diman û bi yekbazarê ve girêdayî bûn. Bi parçekirina Imaperatorîya Osmanî û avakirina dewletên nû wek Sûrîyê, Iraqê û htd. serdemeke nû ji herifandina komelgehên berê û avkirina komelgehên nû dest pê kir. Kurdan –Xoybûn û rêxistin û kesayetîyên dî- nikarîbûn li encam, akam û berhemhênanên serdema nû xwendineke hevgirtî bikin.Weha hişyarîya neteweyî li bal kurdên Sûrîyê nikarîbû bibe firehdîtin û firehaso û nikarîbû bandor û encamên avakirina sînoran di pêvajoyeke kiryarane de bingehdar bike. Ev hizir tevî hin mercin din, bû alîkar ji bo avakirina dîyardeyeke kambax ku heya îro jî bandora wê di nav kurdên Sûrîyê de xuya ye. Ew dîyarde jî bendemanîya ´siwarê hespê spî` yê rizgarker e, ku ji alîyê din ê sînor tê.

Qonaxa Xoybûnê, qonaxa peydabûna hişyarîya neteweyî, wek bingehê nasnameya neteweyî li ba kurdên Sûrîyeyê, heya asteke berfireh nasnameyeke "bejî" bû. Li ser bingehên arezû, hest û hin regezên hevdij hatibû damezirandin. Nasnameyê şêwene taybetmend standibû di avakirina dîtineke bîrdozî û praktîkî de nedikarî bibe rêbazeke hevgirtî û pêdivîyên qonaxê pêk bîne.

Gevizîna di nav evê nasanameya neteweyî de, nehişt ku kurdên Sûrîyê bi guhertinên di nav sînorên Sûrîyê de çêdibin, hestyar bibin û di wan guhertinan de kêrdar bin. Ne di bîra kurdan û xoybûnê de bû, ku hebûneke makzagonî û zagonî, ji xwe re, di damezrandina Sûrîyê, wek dewlet, di bin întîdaba Fransayê de bi dest xînin. Rast e kurdan li herêma Cezîrê di sala 1932an hewil dan ku dewleteke kurdî, di bin intîdaba fransî de, were avakirin, lê hewildana ji dervî daxwaznameyê pê ve derneket (18).

Pîşti derketina Fransayê, dewleta sûrî hate dizîn û di çarçoveyeke yekalî, yekdîtin, yekbawerî û yeknetewe de û bêyî beşdarîya kurdan ji nû ve hate danîn.

### Herifîna nasnameya hevwelatîyê, ya ku negiha were tekûzkirin

Ramana neteweyî, di nav bijarteyên siyasî, rewşenbîrî û leşekerî yên ereb de pir xurt bû û karî bi mejîyekî makyavelî peywendîyên bi beş û hêzên komelgehê re girêbide. Komelgeha sûrî xwedan rewşeke taybetmend bû; Fransayê dewlet û komelgeha sûrî ji çend komelgehên neyeksan ava û pîne kiribû, lewra jî komelgeha Sûrîyê, bi hesanî û kurtedemî, nikarîbû hevguncîneke niştimanperwerî di hundirê xwe de ava bike. Ev bû sedem ku nikaribe hêzên şaristanî yên xurt di nav xwe de ava bike.

Ev ji alîyekî ve. Ji alîyekî din ve raman, hizir û boçûnên çepgir di heman qonaxê de bi xurtî bandora xwe li bijarteyên siyasî û rewşenbîrî dikirin û gelek têgehên mîna; "derbaskirina qonaxan, çemkirina di ser qonaxan re" û "rewatîya şoreşgerî" wek hizir ketibûn nav piranîya kesayetî û rêxistinên siyasî de. Derfet li pêş avakirina komelgehekê, li Sûrîyê, bi awa û pêvajoyên dîrokane yên xweristî û normal hate tengkirin. Derfet nema hate dayîn ji wan dam û dezegehên –Perleman, makzagon û hemû dezgehên fermî-komelgehê re, yên ku bi avakirina dewleta Sûrîyê ve ava dibûn. Ew dam û dezgeh, heya radeyeke pejirandî, rewatîya xwe ji gel distandin, di pêvajoya demê naçar dê bûba ku karibe nûnerîya hemû beşên pêkhatîyên Sûrîyê bikin. Lê birrîna pêvajoyê di sala 1949an (19) de rê li pêşîya avakirina komelgeheke hevgirtî li ser bingeha hevwelatî û wekhevîyê girt.

Ji ber van sedeman û ji ber taybetmendîyên komelgehê, netewe perestên ereb tê gihiştin ku artêş hêza yekemîn e, ya ku dikare bi leztirîn dem guhertinên bingehîn di civakê de bi cîh bîne.

Neteweperestên ´ereb berê xwe dan artêşê û di nav rêzên efser û leşkeran de bîr û boçûnên xwe belav kirin, daku karibin bi hêza artêşê boçûnên xwe li ser siyasetmedaran ferz bikin. Hêzdarîya artêşê li dij hêzdarîya komelgeha sîvîl. Ango her ku artêş bihêztir û karîgertir dibû, rêxistin û sazîyên sîvîl qelstir û lawaztir dibûn.
Di 30/03/1949ê de general Husnî El-Zaîm bi yekemîn rêjîmguherîna leşkerî rabû. Piştî çend mehan, ango di 19/12/1949ê de general Edîb El-Çîçeklî li dijî general H. El-Zaîm bi inqîlabeke leşkerî rabû. Di wê qonaxê de makzagona (destûr) sala 1950ê wek yekemîn makzagona piştî derçûna Fransa ji Sûrîyê (1946) derket û bi awayekî zelal erebkirina dewlet û sazîyên wê hate aşkere kirin. Di seretaya makzagonê de hatîye gotin ku "bi erêkirina Xwedê û daxwaza gel a azad em nûnerên gelê Sûrîyê yên ereb, yên ku di komela bingehdanînê de civîyane..." "Em radigihînin ku gelê me, bi dîrok û îroroj û siberoja xwe, beşek ji neteweya ereb e, çavnêrî wê rojê ku neteweyê me ê ereb di dewleteke yekgirtî de bicive (20) û di benda yekem de weke danasîn jî: "Sûrîye, komareke ereb, demokrat û parlemanî ye " (21) hatîye nivîsîn.

Makzagona 1950yî, di nav Sûrîyê de bû bingehekî seretayî ku destlatdarî û dezgehên dewletê bibin alav jibo erebîkirina her tiştî. Makzagonên ku li pey makzagona 1950yî hatin, ji makzagonên dewletan zêdetir wekî programên partîyên nijadperest bûn. Nexasim makzagona 1973ê, ya ku heya roja îro serdest e (22). Di pêşgotina makzagona 1973an de hatîye (23): "Cemawerên ereb serxwebûn wek aramanca dawî,… ji xwe re nedîtin,, lê wek alava hihêzkirina têkoşîna xwe û weke qonaxeke lipêş, bi serdarîya hêzên welatperwer ên pêşverû, li dijî hêzên koledar, siyonîst û kedxur ji bo pêkanîna armancên neteweya ereb di yekîtî, azadî û sosyalizmê (24) de." Û li ser rêjimguherîna leşkerî ya ku partîya El-Baas, di sala 1963an pê rabû, di pêşgotina makzagonê de weha hatîye:" Û di herêma Sûrîyeya ereb de cemawerên gelê me têkoşîna xwe berdewam kirin û di pêvajoyeke ber bi pêş ve çûyî de, serkeftina xwe ya mezin, bi rêberîya Partîya El-Baas a Erebî a Sosyalist, di şoreşa 8ê adara 1963ê de pêk anîn, ya ku desthilat kir alavek ji têkoşîna avakirina komelgeha erebî ya sosyalist a yekgirtî re."

Erebkirin, wek bîr, netewe û hebûn bi tunekirina kurdan ve hate girêdan. Nemaze piştî gurbûna tevger û çalakîyên haykêş li Kurdistana Iraqê, yên ku bûn sedema balakişandina kurdên Sûrîyê.

Dibe dema ku ber û hêvîyên kurdan ber bi Kurdistana Tirkîyê ve bûn, berjewendîyên hevbeş di navbera neteweya kurd û ereb de dihatin sazkirin. Piştî têkçûna tevger û çalakîyên li hember rêjîma Turkîyê û geşbûn û gurbûna tevgera neteweyî ya ereb û karîna wê ku bi rêya hêzên artêşê, fermandarîya hin dewletên ereb, wek Mesir sala 1952an (25), bixe bin destên xwe. Neteweperstên ereb hewl dan ku kêmneteweyan di deverên ku ew tê de serdest in, tune bikin.

### Hin biryar, ferman û zagonên awarte yên ku li Sûrîyê li dijî kurdan derketine

•Zagona serokkomarî, hejmar 193 ya sala 1952yê ya ku parêzgeha Hisiça -para mezin ya niştecîyên wê kurd in- wek herêmeke sînorî bi nav dike, tevî hebûna hemû herêmên din ên sînordar. Ji bo herêmên sînordar rewşeke taybet ya qanûnî heye.

•Di 16/11/1953ê de zagoneke din ya serokkomar bi hejmara 1939, ji bo qedexekirina navên ne bi erebî yên hotel, xwaringeh, yane û firoşgehan derket.

•Di 23/08/1962an de zagona serokkomara hejmar 93 ya pêkanîna serhejmareke awarte li parêzgeha Hisiça "El-Heseke, berê nave fermî Parêzgeha Cezîre bû" serhejmara awarte di 05.10.1962an de hat kirin, di encama wê de nasnameya Sûrîyê ji 125-150 hezar kurd hate standin.

•Di sala 1964an li gor agahnameya wezîrê navxwe, hejmar 1360, "di parêzgeha Hisiça de, bê pejirandina wezareta berevanî-bergirî-yê kirrîn û fortina zevîyan qedexe ye."

•Di sala 1966an rêjîma Sûrîyê dest danî ser zevîyên kurdan ên seranserî sînorê dewleta Tirkîyê, bi dirêjahîya 375 km û pahnbûna 10-15 km (26).

•Di 24.06.1974´ê de serkirdeya beşê Sûrîyê "القيادة القطرية" ya partîya ba'as biryara bicihanîna projeya kember -zinar-a erebî li navçeya Cezîrê –bi pirranî, kurd e- derxist. Û dest bi avakirina 41 nişticîgehan li seranserî sînorê Tirkîyê bû, ta ku ereban ji parêzgehên Reqa û Helebê bînin û li wir niştici bikin. Ji xwe ev proje hate pêkanîn.

•Di 10.09.2008an de zagona serokkomarê, hejmar 49 derket bo bendkirina kirêkirin, kirrîn û firotina zevi, xanî û avahîyên herêmên sînordar. Zagonê ziyanên pirr mezin û kêrdar gihand herêmên kurd li Sûrîyê ji hêla çalakîyên abûrî û derfetên jîyanê ve. Ji ber ku, ji berê de herêmên kurd li Sûrîyê, li berevajî hemû herêmên Sûrîyê yên ku li ser sînoran e, rewşeke taybet ji wan re hatîye standin. Wek encamdan ji vê zagonê re, çalakîyên abûrî di herêmên kurd de gihan asteke pir nizim. Kirrîn, kirêkirin û firotina zevî û avahîyan, bi gelemperî dijwar bûye û bi taybetî ji kurdan re dijwartir bûye.

Û bi dehan ferman û zagonên awarte û nijadperst dijî ziman, çand û hebûna kurdan derketine û têne bikaranîn. Wek guhertina navên gund û bajaran, qedexekirina navên kurdî û qedexekirina ziman û çanda kurdî (27).

Mirov bi kurtî, dikare li ser van kiryaran nerîneke gelemper ji pirtûka Mihemmed Teleb Hilal (28) a bi navê Lêkolinek li ser parêzgeha Eljazîreh ji alîyên siyasi-civakî-neteweyî bistîne. Pirtûka ku bi rengê proje ji 12 pêşnîyaran pêk hatîye, bi rêyên bêparkirina ji kar, perwerde, nasame û hemwelatîbûnê, şêweyên koçberkirin û biderkirina kurdan ji herêmê pêşnîyar dike.

Ev proje û siyasetên bipaln û program, yên ji salên pêncîyan de li dijî kurdan hatine bikar anîn bûn sedem ku kurd ji jîyana siyasî ya Sûrîyê bi dûr bikevin. Û ew nasnameya nû ya niştîmanperwerane, ya ku hîn di gavên xwe yên pêşîn de bû, hate herifandin.

Kiryarên ku rejîma Sûrîyê li dijî kurdan ajotin, bandoreke mezin li asoyên hişyarîya neteweyî û niştimanî ya kurdan kir. Ew bandor di programa yekemîn ya partîya siyasî ya kurd a ku di sala 1957ê de hate damezirandin de, eşkere bû: Partîya Demokrat a Kurdistanê di destpêka damezirandina xwe de serxwebûn û yekîtîya parçeyên Kurdistanê ji xwe re kir armanc. Ev armanc, wek bersiveke bêçaretîya li hemberî wan kiryaran bû, ne wek xwendineke rastbînîya dorhêl û terazûya hêzan bû.

Li yekemîn rasthatina hemberî rêjîmê, serkirdeyên Partîya Demokrat a Kurdistanê nikarîbûn bersiva aramancên xwe bidin û pirranîya wan ji "azadkirin û yekkirina Kurdistanê" vegerîyan. Di 12.08.1960î de, gellek serkirde û kadroyên Partîya Demokrat a Kurdistanê hatin girtin, 32 kes ji wan radestî dadgeha leşkerî ya Helebê bûn. Siyasetmedar û nivîskar Mihemmedê Melle Ehmed, wek yek ji girtîyan, dinivîsîne: "Dr. Nûredîn

Zaza, serokê partîyê, yekemîn kes bû, ket oda dadwer de. Piştî demekê derket,( ...), got: ne bêjin ku armanca me azadkirin û yekkirina Kurdistanê ye weke çawa di pirograma me ya siyasî de heyî. Osman Sebrî, lê vegerand û got: Na, ez nabêjim nîne, ez ê bêjim di pirogramê me de heye. Ji vê dê çirûska agirê nelevkirinê, di nav girtîyan de pêket (29) û girtî bûn du alî; yek bi serokatîya Dr. Nûredîn Zaza û alîyê din bi serokatîya Osman Sebrî. Lê herdu alîyan, wek ku dû re, di parçebûna 1965an de hate xuyakirin, ji diruşma azad û biyekkirina Kurdisanê xwe dûr xistin (30). " Ji bo durişma (azadkirin û yekirina Kurdistanê) herdû alî gihan, bê goftûgo li ser çêbê, ku serdarî kete şaşîyekê de, dema ev durişma he di rêzana xwe de nivîsand û herdû alîyan dîtin ev duruşma he bê guhertin. (31)“

Ji ber kiryarên rejîma Sûrîyê, nasnameya nîştimanî ya kurdî nikarîbû di hişmendîya giştî ya kurd de cihê xwe yê haykêş bigre. Û herweha nasnameya neteweyî ya ku di hişmendîya kurdî de bihêz diket, nikarîbû wek dezgeh xwe bi gewde bike. Bi awayekî ji awayan, dîsa hişyarîya neteweyî ya kurd li Sûrîyê ji bo ku xwe li ser xakê pêk bîne, ket bendewarîya "siwarê hespê spî" yê ku -vê carê- wê ji hêla rojhelatê sînor ve were.

Ew rêbaza ku rêjimên Sûrîyê yên neteweperest dan ber xwe, ne tenê ziyan gihand avakirina nasnameya niştîmanî li ba kurdan. Bi gotineke gelemper, kişandin û ji holê rakirina jîyana siyasî ji komelgeha Sûrîyê bi tavayî bandoreke pir dijwar li ser nasnameya niştimanî ya hemû hevwelatîyên Sûrîyê kir. Ev yek bû sedemeke bingehîn bo vegerîyan û bihêzbûna nasnameyên kevin.

*Nivîskar û Siyasetvan

1 Wek: Celadet Bedirxan (1897-1951), Nûreddîn Zaza (1919-1988), Dr. Kamûran Bedirxan (1895-1978), Cegerxwîn (1903-1984), Osman Sebrî (1905-1993) û hinin din

2 Ew ode û tekiyeyên pîr û şêxan yên olî bûn

3 Xoybûn (1927), Komela Civata Alîkariya Belengazên Kurd li Cezîrê, 1932. Civata Azadî û Yekitiya Kurdan, 1937. Nadî Ciwanên Kurd li Amûdê, di navîna 30î de, bi serokatiya Mihemmed Elî Şiwêş. Yekîtiya Xortan 1938, dû re bû Nadî Kurdistan, bi pêşaweriya Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza û hin komelin din

4 Xoybûn wek derbirîneke hevgirtî ji nasnameya neteweyî re, ku dikarîbû li pirraniya deverên Kurdistanê xwe bide nasîn. Di sala 1927an de li Libnanê/ Bihemdûn hate damezrandin

5 Heman çavkanî, Dr. Bilec Şêrko, rûpel 109

6 Di benda çarê a armancên komeleya Xoybûnê de weha hatîbû: ``Damezirandina peywendiyên biratî yên dayimî û xweş bi ´hukûmeta Îranê û gelê faris yê bira re`. Û di benda pêncê de: ``Damezirandina peywendiyên biratî û xweş ´hukûmetên Îraq û Sûriyê re, besbûn bi mafên ku di belgeyên intidabê û peymanên navneweteyî de ji kurdên wan herdu welatan re hatine dayîn û ji bilî wan nexwestina ti mafên dî yên siyasî `. Ji xwe xuya ye mebest ji Iraq û Sûriye , Birîtanya û Fransa ye. Ji ber her du dewlet bi destên Birîtanya û Fransayê hatin ava kirin û wan desthilatdariya her du dewletan dikir

7 Rola kurdan, li gor rêjeya hejmara wan, di çalakiyên ku li dijî hebûna hêzên Fransayê li Sûriyê mezintirîn rol bû

8 Di buhara sala 1919ê de li bajarê Cendirêsê, li Çiyayê Kurmênc (Kurddax) niştecîyên navçeyê li dijî fransiyan, bi serokatiya Miho Îbo Şaşo û hevkariya Elî Îbo Şaşo, Seydo Dîko û Mistefa Çolaq bi çalakiyên dijwar rabûn û gelek şer bi hêzên Fransayê re kirin. Di sala 1921ê de Ibrahîm Henano yê kurd, serwerê mezintirîn raperîna li bakurê Sûriyê, serdana wan kir û têkiliyên her du aliyan ta demeke dirêj berdewam kirin

9 Îbrahîm Silêman Axa Henano, 1869–1935

10 General Yusif El-Azma, 1884-1920 di hikumeta ku şah Fêsel damezirand de bû wezîrê şervaniyê

11 Hemberî çalakiyên ku li bajar û gundên dora Amûdê dihatin kirin, Fransayê êrîşeke mezin, bi tang, top û balafirran bire ser Amûdê, di encamê de gelekan jiyanên xwe ji dest dan û gelek ji Amûdê û gundên li dorê mişext bûn, li nav gel û di hin çavkaniyan de bi navê Toşa Amûdê bi nav dibe

12 Seid Axa yê Deqorî, serokê eşîra deqoriyan bû, serdariya hemû çalakiyan di herêma Amûdê de dikir

13 Wek serhildana Mirîdan (Feqeyan) li Çiyayê Kurmênc û hejmareke mezin ji çalakiyên din ên kurdan li dijî Fransayî di bin bandora hest û arezûyên olî de bûn, ji ber ku li Fransayê wek dewleteke gawir dihat nihêrtin ku hatiye xaka musilmanan dagîr kiriye. Û kesayetiyên oldar di hemû herêmên kurd û deverên ku kurd li wan dijîn de bi roleke mezin rabûn

14 Dema ku xwestek li herêmen kurdî dihate kirin ku dewletek taybet were ava kirina mîna dewleta Helebê, Çiyayê Durziyan li Siwêdayê û dewleta Elewiyan, dijberiya serokêlên kurdan bû sedemeke bingehîn ku ew dewlet neyên ava kirin

15 Ji dema fermanrewayiya Eyubîyan

16 Li gor peymana Sykes-Pikot, herêma ku îro Iraq, Sûriye, Libnan, Urdun, Israel û herêmên felestiniyan tê binavkirin, li ser 3 beşan hate dabeşkirin: beşa A. di bin serdestiya Fransayê de û a B. di bin serdestiya Birytanya de û C. rewşêke wê ya navnetewî taybet hebe. Bend 1 ji peymanê: "Fransa û Brîtanya amade ne ji pênasîna û parastina dewleteke ´erebî serbixwe an hevbendiya dewleteke ´erebî di bin serokatiya serokekî ´ereb de, li herêma A.(navxweyî ya Sûriyê) û herêma B. (navxweyî ya Iraqê)yên ku di nexşeya pêvekê de hatine diyarkirin. Di herêma A. De ji mafê Fransa ye- û di herêma B. de ji mafê Brîtanya ye ku ew pêşdetir bin di proje û qerzan de." Li gor vê peymanê dewletên Sûrîye û Iraqê hatin avakirin

17 Di belgeyên Xoybûnê de ev yek eşkere xuya dibe

18 Di daxwaznameya sala 1932ê ya ku ji desthilatdariya fransî re hati bû şandin, ji hêla gelek kesayetiyên herêma Cezîrê, misilman û file, hatibû imze kirin, tê de avakirina dewletek kurdî li Cezîrê, mîna dewleta elewiyan û dewleta durziyan hatibû xwestin. Biner: Kurdische Studien, No. 1, Berliner Gesellschaft zur Förderung der Kurdologie

19 Di vê salê de yekemîn inqilaba leşkerî di Sûriyê de çêbû û bû seretaya gelek inqilabên din

20 Seretaya makzagona Sûriyê ya 1950yê

21 Benda 1ê ya makzagona Sûriyê ya 1950yê

22 Pêşgotin û bendên makzagona 1973ê û nemaze benda 8an a ku dibêje: Partiya Baas a Ereb a Sosyalist serwera dewlet û komelgehê ye

23 Benda 150ê ji makzagonê: "Pêşgotina vê makzagonê beşek jê ye, jê nayê parçekirin."

24 Yekîtî, azadî û sosyalîzm: Slogan û armancên partiya El-Ba’as ya ku ji 1963ê li Sûriyê serdest e. Mebest ji yekitiyê Yekitiya neteweyê ereb di bin sîwana dewletek yekgirtî de ye

25 Tevgera Efserên Azad, bi serokatiya Mihemmed Necîb û Cemal Ebdil-Nassir

26 Di sala 1974ê de zeviyên destliser, di pêkanîna projeya kembera erebî de, li ser ereban hatin belav kirin

27 Bi dehan biryarname û zagonên li dijî hebûna kurdan wek netewe, salane, derdikevin; çi bi çandê û zimanê kurdî ve û çi bi tengkirina derfetên jiyanê li pêş kurdan ve û çî bi qedexirina çalakiyên kurdan ve girêdayî bin

28 Nivîskarê pirtûkê Mihemmed Teleb Hilal e, Hîlal di salên 1955-1956ê efserê ewlehiyê bû, paşê bû parêzgerê parêzgeha Hisiça (El-Hesekeh) dû re bû wezîr û rawêjerê serokê komarê. Di pirtûka xwe de bi awayekî nijadperest li ser qirkirina kurdan li Sûriyê pêşniyaran dide. Planên ku wek pêsniyar di pirtûkê de hatine bihtirê wan hatine li hemberî kurdan hatine bikaranîn

29 Mihemed Mela Ahmed, Dîroka Partî li Sûriyê, Qunaxa Yekê 1957-1965, çapa 2., Evra Verlag, R. 46-47

30 Di programên her du partiyên ku di sala 1965ê de piştî parçebûnê hatin damezirandin û dû re di programên hemû partiyên din de slogana "azadkirin û biyekkirina Kurdistanê" nema hate dîtin

31 Mihemed Mela Ahmed, Dîroka Partî li Sûriyê, Qunaxa Yekê 1957-1965, çapa 2.,Evra Verlag. R. 47

## JEOPOLITIK

# Bi awirê hevalbendên wê, dîplomasîya amerîkî

PHILIP GOLUB

*Wikileaks* bi taybetî jî ji dawîya sala bihurî û vir ve neçar dike, dîplomasiya amerîkî li tevahîya cîhanê dibe mijara guftûgoyeke hûr û kûr. Lê belê ew pir bi serûber xuya nake. Berevajîyê *Pentagon Papers [Belgeyên Pentagonê]*, ku ji alîyê *New York Times* û *Washington Postê* ve di destpêka salên 1970yê de weşandina wan a qismî bûbû wesîle ku bîrbirina kûr a desttêwerdana li Viyetnamê were ronî kirin, ev telegrafên vêşartî yên Wezareta Karên Derve yên Dewletên Yekbûyî, ku ji alîyê çend rojnameyan ve hatin belav kirin, cih didin pir kêm hêmanên ku karibin ronahîyê bidin ser hin hêlên venedîtî an jî neravekirî yên siyasetên derve ya dîroka nêz a Dewletên Yekbûyî û hê kêmtir cih didin hêmanên ku karibin analîza giştî ya li ser mijarê biguherînin. Bispor bi van belgeyan wê ji tiştên ku jixwe ji mêj ve zanibûn, piştrast bibin; hin kesên din li gor rewşê, wê ji portreyên rêveberên ku bi giştî bi awayekî pir ne şîrîn ji aliyê dîplomatên amerîkî ve hatine ravekirin û danasîn, kêfxweş bibin an jî hêrs bibin. Bi tevahî, sentez li gel vê yekê jî ne dûrî elaqeyê ne, lewre ew hem karaktera cîhanî ya dîplomasîya *Komara emperyal a amerîkî (1)* hem jî vîzyona ku bingeha wê pêk tîne, binxêz dike.

*American Negotiating Behavior [Liv û Tevgera Muzakereyên Amerîkî](2)*, berhema kolektîf a tê de dîplomatên biyanî, liv û tevgera muzakerevanên amerîkî analîz dikin, ji bo têgihîştina siyaseta Waşingtonê ya li cîhanê, hêjayî xwendinê ye.

Di vê projeyê de, nêrîneke neguhêrbar berbelav dibe: herçendî, bi awirê giştî, hevalbendên amerîkî *"profesyonelên pir baş"* bin jî, ji qewlê Yurî Nazarkîn ê rûs, Dewletên Yekbûyî *"heqîqeta makyavelî"* û *"erêkirina lîderîya* [xwe] *ya sincî"* tev li hev dikin. Wekî din, helwesta wan a *" xwelirasergir"* û *"serdestîhez"* xwe dertîne pêş û di çavên hevalbendên wan ên nêz de jî wisa xuya dikin.

Bi vî awayî, li gor profesor Watanabe Koji, Japonya di tevahîya pêvajoya salên 1970 û 1980yê de ketiye bin zexta dayîna *"rêzek tawîzan (bazirganî) ku çend heban jê tesîrên kambax û demdirêj li ser aborîya japonî kiriye"*. Herwiha gava ku di 1991ê de *"bi carekê"* jê hat xwestin ku ji bo operasyona *Firtoneya Çolê* (di 1991ê de li dijî Iraqê pêk dihat) ku Tokyoyê tê de cih jî negirtibû *"9 milyar dolaran bi awayekî pêşîn"* bide, bi *"serpêhatîyên bi êş"* re rû bi rû ma. Watanabe dibêje, bi giştî muzakereyên duber ên çend deh salên dawî bûne *"ezmûnên tahl"*: *"DYA qet paxafê bi pîvanên piralî nake, weke hêza super ya yekane pir bi quretî tevdigere"*. Di vê mijarê de çavdêrî û nirxandinên hevalbendên DYAyê yên weke Sîngapûr an jî Zelandaya Nû jî pir dişibin yên japonan.

Nebûna dengeya hêzan wê *"cudahîyên silmeyî û bergehî"* –ev vegotin ji alîyê dîplomatekî tirk ve hatibû bikaranîn– yên di navbera Dewletên Yekbûyî û dewletên din de rave bikirana. Ev hevnegirîya dengeya hêzan çendî mezin be, awayê liv û tevgera amerîkî jî ewçend dibe zextkar û ji rêbaza îknakirinê dûr dikeve. Veguherîna liv û tevgera Waşîngtonê li hemberî Hindistanê ji dema serxwebûna vî welatî û vir ve, tespîta li jor piştrast dike: Nefsbiçûkî û dûrnebînîya çandî û siyasî û heta carna dijminatîyê jî di dema şerê sar de, şûna xwe dane dîplomasîyeke ku xwe dispêre venasîna pozîsyona xuyayî ya Delhîya Nû, li cîhanê.

Li alîyekî ev lêkolîn bi kêrî têgihîştina meylên bingehîn were jî, *America Since 1945 [Amerîka ji 1945ê ve]* (3) berevajîya wê lêkolînê zêde alîgira nûbûnê xuya nake. Ev berhema ji alîyê du kesan ve nivîsandî, hewl dide dîroka çandî û siyasî di nav hev û din de pêşkêş bike, lê belê di beşa wê ya der barê têkilîyên navneteweyî de dadikeve asta pêşkêşîyeke bûyerî ya dûrî mijara bingehîn. Ezmûna serûbinbûnên civakî û çandî yên li Amerîkayê ji 1945ê ve û ya cihêrengîya pêlên ronakbîrî û hunerî pir balkêştir xuya dike. Lê belê bi gelemperî, ev berhem pir hindik ronahîyê dide ser enteraksîyona navbera dînamîkên civakî û çandî yên hundirîn û siyaseta derve, ku tevî vê yekê meseleyeke pir girîng û têra xwe venedîtî ye.

1 Cf Power, Profit and Prestige: A History of American Imperial Expansion, Pluto Press, London, 2010, 256 pages, 22,29 euros

2 Richard A. Salomon & Nigel Quinney, American Negotiating Behavior United States Institute of Peace, Washington, 2010, 357 rûpel, 22,50 dollars

3 Paul Levine & Harry Papasotiriou, America Since 1945 : The American Moment, Palgrave MacMillan, Basingstoke (Hampshire), çapa duyem 2011 (ya yekem 2005) 320 rûpel, 18,99 lîra

Wergera ji fransî: Baran Nebar



FEWZÎ BÎLGE: **Kurahîya şîn**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, bi spatûla û firçe, 60 x 50 cm

# Gava rejîmên ereban dihejin (Dewama rûpela 1.)

û nimûneyî xebatên xwe nîşan dan. Destûra hebûna rêxistinên sîvîl ên civakî ku ji dewlet û hikûmetê serbixwe ne, nehate dayîn. Rejîmên girtî yên zordar ku tevahîya civakê bi riya dezgehên qerase yên nixamtî û sazîyên polîsan dixin bin kontrola xwe bi pêş ketin, mûxalefet hatin tepisandin. Ev rejîmên ku di nava hevsengîya şerê sar de dirûv û teşe girtin, piştî salên 90ê jî sîstemên xwe yên heyî berdewam kirin.

Tevî ku di warê neteweperestîya ereban de bi hev re di nav berebezîyê de ne jî; rejîmên heyî, di warê pêkanînê de dîsa bûn xwedîyên polîtîkayên ekonomîk û civakî yên mîna hev. Feraseteke "sekularîzm"a ku dîn di bin kontrola dewletê de ye, hate hebandin. Olîgarşîya leşkerî ku desthilatdarîya dewletê xistiye bin destê xwe, ne tenê di warê siyasî de, di warê ekonomîk de jî bû hêzeke aborî ya xwedî îmtiyazên mezin . Ji sektora bankeyan bigire heta sanayiyê, kontrola gelek sektorên girîng li şirketên artêş, general, siyasetmedarên payebilind an jî li kesên ku nêzîkî wan in hatin spartin. Hewldanên modelên populîst ên pêşketinê, li van welatên ku ji monarşîyên nîvgirava ereban û kendavê cudatir in û ne xwedîyên dahata petrolê ne jî, bi ser neket. Kêşeyên siyasî û civakî yên ku bi têra xwe ji çareserîyê dûr in, bi taybetî jî kêşeyên kar û perwerdehîyê yên nifûsa ciwan ya ku hejmara wê pir bi lez bilind dibe, giha asta teqîneke civakî. Ji ber vê yekê, beşeke girîng ji xwepêşanderên ku li Tûnis, Misir û Cezayîrê derketin kûçe û kolanan, mirovên ciwan yên bêhêvî û ji pêşerojê xwe biendîşe bûn.

### Hêz û lawazîya muxalefetê

Pêlên dawîyê yên protestoyên li welatên Bakurê Afrîkayê û ereban, par li Cezyirê bi xwepêşandanên li dijî bihabûn û bêkarîyê dest pê kirin. Di nav salê de çend caran, di nav bêhêvîtî û bêçaretîyê de, çalakîyên xweşewitandinê pêk hatin. Çalakîyeke bi vî awayî ya xweşewitandinê, ku di meha sermawezê de li Tûnisê pêk hat, paşê bû sembola protestoyên her ku çû zêde bûn. Di çalakîyên protestoyê de yên li Cezayîr, Tûnis û Misirê pêk hatin, ji bilî tevgerên muxalefeta heyî ya klasîk, mirovên ciwan ên bêkar, bêmal û ji pêşeroja xwe biendîşe, di sefên pêş de cih girtin. Wisa bû ku xwepêşandan veguheziyan tevgera daxwazên perwerdehî, kar, xanî, edaleta civakî û dawîlêanîna gendelîyan û serhildaneke li dijî desthilatdarîyên heyî.

Rejîmên ereban di destpêkê de xwest ku çalakîyên protestoyê yên ku di maweyeke kurt de li seranserê herêmê belav bûn, bi rêbazên polîsîye û bi hêza artêşê rawestînin. Tevî mirina bi dehan kesan û girtinan, têkneçûna xwepêşandanan, lê bi ser de jî bi belavbûna wan, xwestin ku bi çend sozên siyasî û civakî yên mîna guherînên di hikûmetê de, vekişandina zeman, hinek vebûnên demokratîk, heya soz û bextên berendamnebûna di hilbijartinên bê de, protestoyan aşt bikin.

Li Tûnisê Bin Ali, tevî ku parlamento fesih kir û biryara hilbijartinê da, eşkere kir ku ew ê jinûve nebe berendam û soz da ku reformên siyasî û aborî jî bike, nekarî li ser desthilatdarîyê bimîne. Li Misirê Husnu Mubarek, tevî ku hikûmet guhert, soz da ku ew ê careke din nebe berendam, sozên vebûnên siyasî û ekonomîk dan, nekarî protestoyan bide sekinandin. Li Urdunê, li Sûriyeyê, li Yemenê û li Cezayîrê jî, rêveberîyên li ser kar bi sozên wiha hewl dan hêrsa gel aşt bikin. Çalakîyên li dijî rejîmên heyî, her çiqas di demeke kurt de gur û geş bûbin û gihabin hêzeke wisa ku li gelek deveran rejîman bihejînin jî, nebûna sazûmaneke muxalefetê ya xurt û kamil, xala herî lawaz a vê tevgerê ye. Bi rastî jî, gava em bala xwe didine piranîya welatên ereban ên li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn, tê dîtin ku di nav civakê de hêza herî xurt –hê jî- artêş e. Di nav muxalefetê de jî, bi tenê tevgerên îslamî xwedî hinek hêza organîze ne. Rastîyek jî ew e ku nifûsa ciwan a li van welatan, di salên dawîyê de gelek pir bûye û li derveyî rêxistinên klasîk ên muxalefetê, ketine nav pêvajoyeke polîtîzebûnê. Di tevgerên civakî yên dawî de, ev girseyên ciwanan ku derbarê pêşerojê de di nav endîşe û bêhêvîtîyeke mezin de ne, roleke girîng lîstine. Tevî ku serhildana girseyên ciwanan, rejîmên heyî yên riziyayî dihejîne jî, alternatîfbûna ji bo desthilatdarîyê, îhtîmala ku di rejîmên herêmê de guherînên berbiçav bike û veguherîneke demokratîk pêk bîne, vê gavê gelek qels û lawaz xuya dike. Nexasim li Tûnisê ligel ku Bin Ali rûxiya, beşdariya muxalefetê bo rêveberiyê pêk nehat. Berevajî vê yekê, kadroyên bingehîn ên rejîma kevin, di bin kontrola artêşê de li ser karên xwe man. Artêşê, bi fedakirina Bin Aliyê ku di çavê gel de bi têra xwe dejenere bûyî, berdewamîya îmtîyazên xwe yên siyasî û aborî û hêza xwe ya desthilatê parast.

Tevî vê yekê jî, di serî de Misirê, li hinek welatên ereban ên li herêmê, tevgereke muxalefetê ya bi navê Birayên Misilman heye ku qedîm e û nîspeten rêxistîtir e. Her çiqas li Misirê, çalakîyên protestoyê di destpêkê de, bêyî vê tevgerê geş bûbe jî, paşê Birayên Misilman di nav çalakîyan de bûn xwedî roleke berbiçav. Lê belê li Misirê jî, hêz û kapasîteya muxalefetê, tevî ku rejîma heyî hejand, eşkere ye ku vê gavê wê nikaribe rejîmê ji kokê ve biguherîne. Îşaretên ku tên, didin çespandin ku her wekî li Tûnisê qewimî, li Misirê jî artêş wê ji bo ku rewşê bi xisara herî kêm derbas bike, Mubarek feda bike, lê wê dezgeha desthilatdariyê û rejîma heyî bi hinek guhertinan, demeke din berdewam bike.

### Reaksîyonên Ewropa, DYA û Tirkiyeyê

Rejîmên ereb ên li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn, heta niha jî hêla dewletên Ewropayê û DYAyê ve bi piranî hatin piştgirî kirin. Bi taybetî rejîmên ereban ên li Misir, Tûnis, Cezayîr, Urdun û Yemenê, bi DYA û welatên Ewropayê re di nav têkilîyên tifaqeke nêz de bûn, alîkarîyên mezin ên aborî û leşkerî wergirtin, piştgirîya siyasî bi dest xistin. Dewletên rojavayî, dizanibûn ku ew bi tenê bi rejîmên weha dikarin rê li ber tevgerên îslamî û komûnîst bigirin, yên ku rojekê dişên ji wan re bibin xeter. Lewre jî polîtîkayeke reel dan ber xwe ku li gor vê polîtîkayê, ev rejîmên otorîter, di serî de jî bo têkilîyên bi Îsraîlê re û parastina kanala Suweyşê, ji bo îstîkrar û ewlekarîya herêmê pêwîst in, hetta zerûrî ne. (3) Di vê çarçoveyê de, wan li hember polîtîkayên antî-demokratîk û çewsîner dengê xwe dernexist. Ne tenê muxalefeta îslamî, wan tevgerên muxalefeta demokratîk jî wekî faktorên bêîstîkrarîyê dîtin. Ji ber polîtîkayên xwe yên ku berevajîya nirxên ku propogandaya wê dikin jî, di nav beşên muxalefeta demokratîk ên li herêmê de bawerîya ku bi wan dihat, bi awayekî mezin winda kirin.

Pêşketinên dawî yên li herêmê, welatên YEyê ku bi rejîmên heyî re, di nav têkilîyên tifaqên nêz de ne û DYAyê bêhazirî zeft kirin. Piştî reaksîyonên bi îhtiyat û bi endîşe yên di rojên destpêkê de, yekem car rêveberîya DYAyê, heye ku ji bo prestîja xwe ya ku li herêmê baş winda kiriye, ji nûve bi dest bixe, sînyalên wisa da ku ew ê ji polîtîkayeke ji yên berê cihê, bide ber xwe. Behsa mafê tayînkirina çarenûsê jî kir û ji hikûmetan xwest ku ew li gor daxwazên gel reformên xurt bikin. Herwiha ji wan xwest ku ew gavên berbiçav biavêjin da ku muxalefet tevlî nav pêvajoya siyasî bibe. Herçî dewletên YEyê ne, ku ditengijin di navxwe de polîtîkayeke hevbeş saz bikin, bi daxuyanîyên dudil û nezelal xwestin rewşa heyî îdare bikin.


Herwiha çi ji bo DYAya ku bi dengekî bilind veguherîn xwest, çi jî ji bo dewletên YEyê ku hîna jî dudil in, hê jî endîşeya herî mezin ew e ka piştî hilweşîn yan lawazbûna rejîmên heyî, wê valahîya desthilatê çawa bê dagirtin. (4) Eşkere ye ku li welatên di bin rejîmên çewsîner de ne, ji bilî tevgerên îslamî, hêzeke demokratîk a muxalefetê organîze nebûye û bi pêş neketiye. Lewre jî, pêkhatina valahîyeke desthilatê, her wekî di mînaka Îrana 1979ê de xuya dibe, dagirtina vê valahîyê ji hêla tevgerên îslamî yên ku bi gotinên dijberî rojava xurt bûn, wekî xetereke muhtemel tê dîtin. Li ser rewşeke wiha, îhtîmaleke xurt e ku DYA –û muhtemelen dewletên YEyê-bêyî ku hêza siyasî ya artêşê bişkênin, modeleke derbasbûna bi kontrol ya ku tevgerên îslamî bikişîne nav sîstemê, tercîh bikin.

Helwêsta hikûmeta tirk ya ku ji dûrî ve berê xwe da pêşketina li Tûnisê, lê li Misirê, wekî ku piştevanîya protestogeran kir, bi têra xwe balkêş bû. Dîsa di vê serdemê de, ji hêla hinek derdoran ve, fikir hatin eşkere kirin ku Tirkiye dikare ji bo herêmê bibe mînakeke model a sereke. (5) Di rastîya xwe de, Tirkiye ji bo gelek rejîmên heyî yên ereban, di warê pozîsyon û îmtiyazên artêşê, sazûmana otokratîk a dewletê, feraseta ku dîn xistiye bin kontrola xwe û taybetmendîyên bi vî rengî, jixwe ji demên berê ve bûye mînakeke model a sereke. Dikare bê gotin ku bi tenê dewleta tirk, gava bi saya serê bandora dînamîkên navxweyî û derve, di nav pêvajoyê de, di warê siyasî, civakî û aborî de hinek guhertinan pêk tîne, li welatên ereb ev pêvajo girantir dimeşe. Tevî vê yekê, dibe ku mirov bifikire; di sîstemeke ku partîyeke mîna AKPê li ser kar e ku xwedîyavegotinên îslamî ye û di nav sîstemê de ye, bisînorkirina heyînên zêde ên artêşê, alozîyên navxweyî yên li van welatan kêm bike û xizmeteke baştir ji bo îstîkrarê bike.

Lê helwêsta Tirkiyeyê ya ji bo Misirê, ne tenê ji bo daxwaza mînakeke model a sereke ye li herêmê, di rastîya xwe de arezûya vedizîna rola Misirê ya li Rojhilata Navîn û têkilîyên navneteweyî, di nav dinyaya ereban de jî, vehewandina hesabên Tirkiyeyê ya zêdekirina bandora vî welatî bixwe ye. Tevî vê yekê, dewleta tirk ku di serî de meseleya Kurdistanê, hê jî şarezayîya çareserîya kêşeyên xwe yên girîng nîşan nedaye, têkilîyên wê yên bi Îsraîlê vekişandî ne, hilgirtina barekî wisa ya li herêmê û qada navneteweyî, wekî îhtîmaleke qels xuya dike.

### Îraq û Başûrê Kurdistanê

Heta rûxandina rejîma Saddam ya ku di sala 2003yêde pêk hat, li Îraqê bi awayekî giştî, rêveberîyeke otokratîk û çewsîner ên mîna li dewletên ereban ên li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn hikmê xwe ajot. Bi mudaxeleya DYA û hevkarên wan ên leşkerî, piştî rûxandina rejîmê, gelek partîyên siyasî û tevger ku heta wê gavê qedexe, çalak bûn. Ji jor ber bi jêr ve jî be, sîstemeke parlamenterî ya ku xwe dispêre hilbijartinên azad, nûnertîyeke berfirehtir, pirpartîtî û federal pêk hat. Di warê azadîya fikir û çapemenîyê de pêngavên girîng hatin avêtin. Gelek rojname, TV, kovar û kitêbên xwedî fikrên cuda ne hatin weşandin. Wesayeta artêşê şkest, aktorên nû yên siyasî derketin pêş. Lê belê dîsa jî, ewlehîya giştî û îstîkrara siyasî bi awayekî tekûz nehatiye saz kirin.



FEWZÎ BILGE: **Tofan**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 70 x 55 cm

Gava bi vî çavî li meseleyê tê nihêrtin, sîstema ku piştî Saddam hatiye ava kirin, bi sazîbûna federal a di Qanûna Bingehîn de, bi mafên xwe yên bingehîn, bi azadîyên xwe yên fikrî û olî, bi parvekirina desthilatdarîyê, bi belavbûna xwe ya di nav hêlên berfireh û bi gelek hêlên xwe ve, li gor rejîmên ereb ên li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn ku bi têra xwe riziyane, mirov dikare gelek pêşketî bihesibîne. Ligel vê yekê, gava der barê van welatan de, model têne nîqaş kirin, ne ku mînaka Îraqa Federal, lê destnîşankirina mînaka Tirkiyeya wesayetkar û navendîparêz, balkêş e. Di vir de, wisa xuya ye ku ji daxwazên gel ên ji bo demokrasî û azadîyê zêdetir, endîşeya îstîkrar û ewlekarîya herêmê, ya ku tê payîn ku bi tenê dikare bi riya dewletên xurt û navendî pêk bê, hê jî diyardeyeke bingehîn e. Li hêla din, çalakîyên li welatên ereban, tevî ku li hêlên ereb ên Îraqê tu bandor nekir, bi darê zorê be jî, ketina rojeva Herêma Kurdistanê, bi têra xwe wêneyekî balkêş li ber çavê me raxist. Tevgera Goran, di belavoka xwe ya balkêş ku di dawîya rêbendanê (çileyê), ji hêlekê ve li Kurdistanê, bi taybetî xwest ku girêdanên rasterast ên di navbera artêş û hêzên parastinê bêne qût kirin û dawî li gendelîyan were, li hêla din daxwazên wisa kirin ku bo nimûne, parlamento were fesih kirin, hilbijartinên pêşwext bêne kirin, ji dêvla hikûmeta heyî jî, hikûmeteke teknokratan were ava kirin. (6) Di belavokê de, ligel ku ji partîyên din daxwaza piştgirîyê hate kirin jî, partîyên ku bi awayekî hevpar, belavokeke dijber weşand, daxwazên tevgera Goranê di cih de nedîtin û bi awayekî ku li dijî demokrasîyê ye bi nav kirin. (7)

Li herêma Kurdistanê ku ji sala 1992yê ve di pratîkê de hinek azadî hatine bi dest xistin, piştî 2003yê jî statuyeke federal hatiye qezenc kirin, ligel tevahîya endîşeyên ewlekariyê, atmosfereke ku nîspeten lîberaltir e pêk hat. Ji alîyekî ve, saxlemkirina statuya herêma Kurdistanê, misogerkirina wê; li hêla din derbarê xurtkirina di warê maf û azadîyan de, her çiqas gavên berbiçav hatibin avêtin jî, hê jî li Başûrê Kurdistanê kêşeyên sazîbûnê yên cidî hene. Bi taybetî hê jî di navbera dewlet-partîbûnê de veqetandinek pêk nehatiye, sîstemeke ku ji bêdaletî û gendelîyan re vekirî ye hebûna xwe berdewam dike. Helbet divê rayedarên siyasî, li dijî van kêşeyan, ji niha ve tevdîrên xwe bistînin. Lê wekî her dewleta ku nû tê ava kirin, avahîya dewletê ya li Başûrê Kurdistanê jî, ji bo ku li ser lingên xwe bisekine, hewcedara demê ye û divê bê zanîn ew ê tevî van kêşeyan mezin bibe. Meseleya bingehîn ew e ku gava pêşeroja Kurdistanê tê saz kirin, heta ji dest bê divê modelên ku destûra gel wergirtiye, bêne tercih kirin. Bi vî awayî wê gel demokratîkbûn û meşrûiyeta rêveberên xwe bipîve.

Wekî encam, eşkere û berbiçav e ku wê tevgerên girseyî yên li dijî rejîmên ereban ên li Bakurê Afrîkayê û Rojhilata Navîn pêk hatin, şopên kûr bihêle. Heye ku li herêmê, ji bo maweyekî kurt heyameke kaosê, bêîstîqrarîyê û nezelalbûnê ku ji ber lêgerîna mîzaniyê derdikevin, peyda bibin. Êdî qutîka pandorayê nîv vebûye û ev tevger di esasê xwe de xwedî potansîyeleke weha ne ku karibin di heyama navîn û dirêj de li herêmê guhertinên bingehîn pêk bînin. Hêzên ku di vê pêvajoyê de baştir organîze dibin û yên ku dikarin bandorê li girseyên mezintir bikin, wê hêla veguherînê jî diyar bikin.

1 Mid-East: Will there be a domino effect?, http://www.bbc.co.uk/news/world-africa-12204971

2 The Arab world's 1989 revolution?, El-Cezire, http://english.aljazeera.net focus/2011/02/20112116542718692 4.html

3 Das Ende der westlichen Glaubwürdigkeit, Jakob Augstein, Spiegel Online, 3.2.2011

4 After Egypt, West rethinks its Arab realpolitik, Reuters, 6.2.2011

5 Can the Arab revolt learn from Turkish model?, Reuters, 2.2.2011

6 Tevgera Goran hikumeta Herêmê vexwend îstîfayê, ANF, 30.1.2011

7 Ragihana Dawî ya Kombûna Serokê Herêma Kurdistanê ya di Bareya Daxuyanîya Bizava Gorran de, Peyamner, 30.1.2011

Wergera ji tirkî: Salihê Kevirbirî

www.arsivakurd.org

# Jinên başûrî û vejîna femînîzmê

CAMILLE SARRET *

Vegera ser dîroka femînîzmê mora xwe li sala 2010ê da, lewra li Fransayê çilsalîya Mouvement de Libération des Femmes (MLF) *[Tevgera Azadîya Jinan]* bû. Lê belê girîng e ku ev berçavî têkoşîn û tevkarîya jinên başûrî ya di nûkirina femînîzmê de nede jibîrkirin. Gelek caran destnîşankirina qurbanîyan gelek hêsan e, lê belê ew hergav li dijî pergala heyî û li dijî hindek gerdîşên ku dibine sedemê derhatina neheqî û neyeksanîyan di halê serhildanê de bûne.

Gelo tê zanîn ku Ruwanda li sertanserê dinyayê tenya dewlet e ku di parlementoya wê de jin piranî ne? Ji hilbijartinên giştî yên 2008ê û vir ve, jin % 56,3ê parlementeran pêk tînin: rekorek ku dewletên skandînavî yên serkêşên wekhevîya cinsî li Ewrûpayê jî lê bihesidin. Halbukî jinên ruwandayî heta sala serxwebûna dewleta xwe, anku sala 1961ê, mafê dengdanê nebû. Sala 1965ê, yekemîn jina hilbijartî ket parlementoyê, lê belê heta salên 1990ê, jin di meydana siyasetê de ne xwedanên huzûreke berbiçav bûn. Rûdawa ku nîzama heyî serûbin kir, di sala 1994ê de jenosîda tutsîyan bû. Immaculée Ingabire, koordînatora Hevpeymanîya Neteweyî li dijî tundûtîjîya li jinê dîyar dike ku *"di demekê de ku piranîya mêran miribûn an jî ne di halê hereketkirinê de bûn, jinan berpirsyarî girt ser milên xwe û nîşan da ku dikarin karîger bin. Herçend bi awayekî berfireh tûşî zulm û tecawizê bûbin jî, dîsa her jinên Ruwandayê bûn ku welat ji şêlûbêlê derxistin. Vê yekê pergala kevin û edetî şikand."*

Bi dirêjîya heyama piştî jenosîdê, jin malxwêyîya nêzîkî sêkîyê [ji sêyan yek] malbatan dikin, di karên wek avahîsazî û tehmîrkerîyê de dixebitin ku berê bi tenê mêran dikir û bi hejmarên mezin dibine endamên partîyên sîyasî. Di darîştina destûra 2001ê de beşdarîyê dikin û dikarin sîstemeke kotayê tê de bi cih bikin ku %30yê postên di hemû organ û qedemeyên biryargirtinê de bo jinan, bêne terxankirin û herweha mafê pişkdarîya ji mîratê jî bi dest xistin. Herweha pêdagirî kirin ku wezareta cins û rewşa jinê bê damezrandin, û karîn lijneyên neteweyî yên jinan bi kar bixin ku ev lijne ji bo temsîla jinê di hemû qedemeyên desthilatê de numûne ne (ji taxê bigire heta digihe asta herî bilind a dewletê). Li hukûmetê, wezaretên endustrîyê, karûbarên derekî û wezareta enerjîyê hatine spartin bo wezîrên jin.

Lê belê, hê jî gelek kêmasî li meydanê mane. Li gor raporeke wezaretê, di rêveberîya merkezî de, *"%74ê sekreterên giştî yên wezaretan mêr in, herweha %81ê midûran û %67ê profesyonelan. Jin bi taybetî di postên asîstanî û sekreterîyê de zêde ne."* Dîsa di sektora taybet de, *"jin hê jî bêhtir di karên muweqet û kêmmeaş ên sektora xeyrîresmî de piranî ne [...]. Jin bi tenê xwedîyên %18ê şirketên meydana resmî ne".* Heçî warê curm û tundûtîjîyê ye, tablo her tarîtir e: Xatûn Ingabire dibêje ku *"vîneke sîyasî ya qewî heye, lê belê divê têgihiştina xelkî hê zêdetir bê guhartin û bê nîşandan ku çand ne tiştekî wisa ye ku qet nayê guhartin, ku hemû civak xwedanên wê şîyanê ne ku irf û edetên xwe ber bi şêwazên baştir ve biguherin. Îro, çavê min li neslên nû ye."*

Rewşa li Efxanistanê bi temamî cuda ye. Li welatê di bin serokatîya Hemîd Karzaî de, tundûtîjîya navmalê, kuştin, tecawiz, êrîşên bi asîd her ku diçe zêdetir dibin. Tevî her tiştî, jin xwe di nav dîwarên bêdengîyê de kerr nakin. Berdevkeke wan heye, bi navê Malalaî Joya, ku sala 2005ê di 27 salîya xwe de hate hilbijartin bo parlementoyê hate hilbijartin -bi vî rengî bû ciwantirîn hilbijartîya Meclisê.

Xatûn Joyayê pareke zarokatîya xwe û heyameke ciwanîya xwe li Pakistanê di kampeke mihaciran de derbas kir, paşê îmkana xwendin û fêrbûna îngilîzîyê bi dest xist. Piştî ku vegerîya gundê xwe yê eslî li Farahê, di dema hukmê Talîbanê de, Joyayê berê xwe da binkeyeke tenduristîyê û bi nihênî ji bo jinan dersên fêrkirina xwendewarîyê bi rêk xistin. Lê belê, wekî ku Carol Mann dîyar dike, "ji cerga ku wê pêngava xwe avête meydana sîyasetê, xezeba wan hevpîşeyên wê yên parlementer kêşaye ser xwe ku bi her helkeftekê rexneyan li wan digire û tîne bîra wan ku berê pêşengên şerî bûn, qaçaxçîtîya tiryakê dikirin û bê şert û qeyd mîlîtanên îslamgerîya tundrew bûn. Her zêdetir pêdagirîyê dike û sîyaseta dewletê şermezar û mehkûm dike ku rêzê li mafên mirovan, bi taybetî yên jinan nagire."

Xatûn Joya çend caran ji kuştinê filitî. Dijminên wê yên serekî partîyên dijber û îslamîyên tundrew bûn. Li Kabûlê parlementeran êrîşî wê kir. Sala 2007ê got ku "Ew dikarin min bikujin, lê belê ew nikarin dengê jina efxanî bikujin. Ez ne bi tenê me". Li Farahê, li Celalabadê û li Kabûlê jinên bi çarşefan dapoşayî, bi pankartên xwe hatin û bo piştgirîya wê meşîyan. Hingê, piştî ku wê di gotûbêjeke televîzyonî de meclisa Efxanistanê şibande baxçê heywanan, ew ji parlementoyê hate derxistin.

Şukrîya Hayde ya seroka Negarê, ku yek ji girîngtirîn komeleyên jinan e li welatî, şikê lê dibe ku talîban vegerine ser desthilatê piştî ku serok Karzaî, çileya 2010ê, di çarçoveya Konferansa Londrayê de, sîyaseta xwe ya meslehetê ji hêz û desthilatdarên rojavayî re aşkera kir. Meha hezîranê, Karzaî hezar û şeş sed nûnerên eşîran di Loya Jirga de ("meclisa mezin") berhev kirin. Fikara wê ew bû ku şertê wekhevîya jin û mêran, ku ew piştî ketina Talîbanê ji bo wî şertî du salan ketibû nav hewl û têkoşînê, bê hilweşandin û ji destûrê bê derxistin. Dawîyê, deqên esasî wek xwe man, lê belê, her weku Human Rights Watch'ê jî destnîşan kir, "hukûmeta efxanî û alîgirên wê yên navneteweyî, pêwîstîya parastina jinan di bernameyên vegerandina şervanên yaxî de li ber çavan negirt û herweha ser guhê xwe re avêtin ku parastina mafên jinan di guftûgoyên muhtemel ên digel talîbanan teqez bikin. "

Hal û haletekî din: Hindistan. Dewletê qaîdeya wekhevîya di navbera cinsan de pejirand û têgeha cinsîyeta civakî di qanûnê de jî bi cih kir. Urvaşî Butalia, ya ku ev bîst sal in li New Delhîyê rêveberîya weşanxaneyeke femînîst dike, dîyar dike ku "Îro jinên Hindistanê îstifadeyê ji nimetên sazkarîyên sîyasî yên pir pêşketî dikin. Di planên pêncsalî de, cihekî wan ê taybet û dîyarkirî heye. Heyamên dawî, dewleta Hindistanê, bi merema alîkarîya xelkê bêderfet, bi taybetî jinan, ji bo karûbarên berjewendîya giştî, wek serûberkirina cadeyan û paqijkirina kolanan, me´aşekî rojane yê esxerî durist kir" Herweha, qanûnek li dijî tundûtîjîya li jinê, ku bi ya Xatûn Butalîya, "yek ji baştirînên li dinyayê" ye, di sala 2005'an de hate pesendkirin.

Ev qanûn jinan ne tenê beramber tundûtîjîya mêr û/yan jî kurên wan diparêze, belkî di heman demê de tedbîran digire daku malbata xwezûr û xwesûyên wan jî nikaribin neheqîyê li wan bikin. Digel vê jî, dîyardeya dilsoj a *dowery deaths* ("kuştinên li ser nextê ku jin dide mala mêrê xwe") hê jî nehatîye binbirkirin. Bi pey texmînên xeyrî-resmî, her sal qederê bîst û pênc hezar jin têne kuştin ji ber ku malbabên wan nekarîbûne dawxazên bê dawî yên malbatên xwezûran bi cih bînin. Herçend ji sala 1961ê ve hatibe qedexekirin jî, edeta nextstandinê ber bi dawîya salên 1980'ê ve bi berbelavî dîsa hate meydana civakî. Lêkolîner Max-Jean Zins dîyar dike ku "îro, ji kîjan çîna civakî an kastê dibin bila bibin, herkes nextî distîne: Parlementer, karsaz, rojnameger… Salên 1970'ê, next wek edetekî xerab dihate qebûlkirin, lê belê, dû re bû nîşaneya dewlemendî û hêzê. Li ba xelkê ji çîn û statûyên nizim, nextstandin rêya herî kurtebir e ji bo bidestxistina îmkana mezaxtinê, ku mezaxtin îro di navenda sîstema aborî û civakî ya Hindistana modern de ye. Jina hindî bûye tişteyek ji bo bidestxistina tişteyên din. Ji her tiştî zêdetir ev dîyardeya next û encamên wê ne ku jinê dixe rewşeke hesas."

Herweha, li Hindistanê kêmasîya nêzîkî 40 milyon jinan heye. Ev hejmara jinan nisbet bi mêran kêm heta dereceyeke bilind vedigere ser dîyardeya berbelav a fetûskujîyê (jinavbirina fetûsa zaroka mezintir ji dumehî di malzarokê de ku bi ekografîyê cinsê wan tê destnîşankirin), lê herweha, ji ber xemsarîya beramber zarokên keç e ku li Hindistanê keç bi qasî birayên xwe elaqe û îmkanan peyda nakin. Zins destnîşan dike ku "bi tenê ji 34 salî pê de rêjeyên jîyana jinan digihin yên mêran".

Tevî vê jî li meydana sîyasî jinên hindî bi hêz in. Mezintirîn demokrasîya cihanê di sala 1992yê de kotaya jinê danî di hilbijartinên mehelî de. Xatûn Butalia diçespîne ku "ev yek di asta herêmî de bû sebeb û bingehê guhartinên mezin. Herweha piştî vê serkeftinê, sîyasetvanên mêr li dijî danîna sîstemeke wisa ji bo hilbijartinên giştî derketin".

Li welatên başûr ku piranîya wan kolonî an jî manda bûn, pêşengên femînîzma modern her wekî li Ewropayê ji derdorên marksîst derketine. Lê belê, wan bi dijatîya kolonyalîzmê, bi rêya têkoşînên bo serxwebûnê mîlîtanîya xwe piştrast kir. Martine van Woerkens balê dikêşe ser şervanên hindî û dîyar dike: "Wan derbarê neteweya dahatûyê de, têgihiştineke berfireh û berketî hebû, lewre ji bo wan azadîya sîyasî rêya azadîya jinê jî bû. "Li Misirê, ji salên 1920ê ve Huda Şarawî Yekîtîya Femînîst a misirî dadimezirîne û beşdarî têkoşîna millî dibe. Sala 1929ê, li gara Qahireyê bê destmal ji trênê dadikeve û dibe sebebê qewimîna skandalekê; ev hereketa wê bû nimûne û çend mehan paşê jî hejmareke mezin a jinên misirî di xwepêşandaneke li dijî mandaya Brîtanyayê de bê destmal meşîyan.

Li Împeratorîya Hindistana Brîtanî, kesa ku ev endîşe û çalakvanîya dulayenî ya femînîst û nasyonalîst temsîl dikir, Kamaladevi Chattopadhay bû. Van Woerkens di derbareyê wê de dibêje ku "Kamaladevi endama esîlzadeyên brahman bû, dewlemend û xwenda bû û di nav refên têkoşîna millî û reformîst de cih digirt, herweha di têkoşînên berî û piştî serxwebûnê de digel Gandhi û Nehru bûye. Jixwe wê Ghandi qanih kir ku bihêle jin jî digel mêran biçine Bazara xwê, û Bazara xwê li sertaserê welatî li dijî desthilata Brîtanyayê çalakvanîya aştîyane bû.

Li Asyayê, li Mexrebê û li welatên din ên Afrîqayê, ev yekemîn tevgerên femînîst ji têkoşînên neteweparêz derhatine û taybetmendîya wan a serekî ew e ku xwedanên nirxên laîk û gerdûnî ne. Jin têne handan da ku di karûbarên zanko, şirket, sazî û rêkxirawên sîyasî de cih bigrin. Lê belê, meydanek heye ku hê jî nehatîye safîkirin: malbat. Bi ya Margot Badranê, lêkolînera li Navenda ji bo têkgihiştina misilman û mesihîyan ya mîrê Suûdîyê El Welîd bîn Talal, li zankoya amerîkayî ya Georgetownê, li welatên misilman, "yên ku dawîya sedsala 20êev wezîfe girtine ser xwe, femînîstên îslamî bûn".

Ev şêwaza femînîzma dîndar, ku salên 1980yê xuya bû û bi tecrûbeya Îranê şiklê xwe girt, îro hê jî di qonaxeke munaqeşebar de ye. Alîgirên herî hişk ên laîkîyê ji vê tevger û têgihiştinê nerazî ne; lewre ku bi ya wan, di têkoşîna jinan de destkarîyeke neyînî ye, ku xizmetê li menfa´etên îslama sîyasî ya tundrew dike. Digel vê jî, Badran pê de diçe *"femînîzma îslamî di navenda wê veguherînê de ye ku hewl dide di nava îslamê de xwe biçespîne û hebûna xwe derxe mexderê. Ev hewl û çalakvanîya doza veguherînê dike, ne doza reformeke berfireh, lewre ku mayê xwe di fikir û edetên babsalar ên di nav îslamîyetê de bicihbûyî nake, lê bêhtir dixwaze dakeve nav kûratîyên Quranê, daku peyama wê ya wekhevîya cinsan û edaleta civakî peyda bike […], û bi werçerxaneke binyadî, îslama ku me heta niha nas dikir, digel van peyaman sazgar û hevaheng bike."* Ev tevgera ku gelek kelk ji destkeftên têkoşînên femînîst ên berî xwe wergirt, nîvê salên 1980yê derhat û gava ku jinên ji navîn îmkana xwendina bilind bi dest xist û ji bo karkirinê ji malê derketin, xwe bi rêk xist. Bo cara ewil hingî endîşe û fikir li dora rola malxwêtîya malê berhev bûn û têgeh bi xwe kete jêr pirsîyaran. Di heman demê de, têgeha cinsê civakî, ku li DYA yê hatibû darîştin, di nav destên teologên misilman de ji bo pêdaçûnên li ser deqên pîroz bû amrazek.

Li dorûbera sala 2005ê, "mîlîtanên xwenda", wekî Badran nav lê dike, bi rengekî ku serxwebûna tefekura xwe hê jî zêdetir biçespînin, ketine nav hewldana cudakirina pirêze û huqûqa musulmanan a li ser nirxên pîroz, û nîşan dan ku ev pîrozî avakirin û berhemeke mirovî ye û rewa ye destkarî û guhartin tê de bêne kirin. Bi rêya pêkanîna torên navneteweyî, hêz û çalakvanîya xwe dane ser tetbîqkirina van fikiran. Badran balê dikêşe ser di nav kultûra îslamî de levqelibîna femînîzma laîk û îslamî ku *"berî her tiştî ji ber armancên hevpar pêk tê, anku armancên wek paqijkirina îslamê ji serdestîya mêrî û bi taybetî di nava malbatê de pêşxistina hedefa îslama yeksanîparêz".*

Li Fasê reforma qanûna di derbareyê malbatê de –Mudawana-, ku 2004ê hate pesendkirin, bêyî hevpeymanîyeke wisa dê nehataya qebûlkirin: *"Ev reform vedigere gengeşe û guftûgoyên bîst salan yên di navbera hêza sîyasî, femînîstên lîberal û femînîstên îslamî de, ku Mohammedê VI di sala 2003yê de hakemek tayîn kir daku daxwaz û dawakarîyên hemû terefan bigire û bi vî rengî dawî li munaqeşeyan anî".* Ev pêşxistina mafên jinan di qada malbatî de bi xêra hejmareke hokaran hate bidestxistin. Ji wan, levqelibîn û yekdengîya çalakvanîya femînîst a dûvdirêj, ku rêkxirawên laîk dabûn dest pê kirin; destkeft û lêzêdekirinên rewşenbîrî yên femînîstên îslamî; û dawîyê, vîn û boçûna qralê ciwan ku ev pirs ji xwe re bi kar anî daku pê civaka fasî modernîze bike û bi taybetî piştî êrîşên gulana 2003yê li Casablancayê, rêyê li ber tundrewbûna îslamê bigire.

Îhtîmal heye ku eynî pêdaçûn û pêvajo di meseleya kûrtajê de jî biqewime. Lêkolîner Souad Eddouada dîyar dike, *"êdî ev mesele jî bi awayekî aşkera tê munaqeşekirin. Bi navê şeref û heysîyeta jinê, ku îslam girîngîyeke mezin didîyê, di hindek rewşan de dibe ku kûrtaj tenya çareserî be, lewma dibe ku ev yek jî bibe bingeha rewa ya qanûnîkirina wê".* Li nîvcezîreya erebî jî, hevkarîya laîk û dîndaran bû sebeb ku jin di sala 2002yê de li Behreynê û di 2005ê de li Kuweytê mafê dengdanê bi dest bixin.

* Rojnameger

1 "Genre et marché de l'emploi", raport ku wezareta memûrîyet û kar a Ruwandayê di sala 2008an de belav kir

2 Carol Mann, "Malalai Joya et le courage de la vérité", Sisyphe.org, 18 çirîya paşîn 2007

3 "Afghanistan approves amnesty for warlords", Guardian Unlimited, 1 reşem 2007

4 Human Rights Watch, "The Ten-Dollar Talib and Women's right", 13 hezîran 2010

5 Stéphanie Tawa Lama-Rewal, "Les femmes en Inde", Rayonnement du CNRS, n° 47, adar 2008

6 Martine van Woerkens, Nous ne sommes pas des fleurs. Deux siècles de combats féministes en Inde, Albin Michel, Paris, 2010, r. 95

7 hb [heman berhem], r. 95

8 Margot Badran, "Où en est le féminisme islamique?", "Le féminisme islamique aujourd'hui", Critique internationale, Les Presses de Sciences Po, n° 46, çile-adar 2010, r. 29

9 hb, r. 25

10 hb, r. 43

11 Souad Eddouada et Renata Pepicelli, "Maroc, vers un islamisme d'Etat", "Le féminisme islamique aujourd'hui", Critique internationale, Les Presses de Sciences Po, n° 46, çile-adar 2010, r. 87

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

### Meksîko, di girtîgeha jinan a Santa Martha Acatitlayê de

# Girtîbûna rizgarker

Cathy Fourez *

Di girtîgeha jinan a Santa Martha Acatitlayê, 1 900 girtî bi şiddeta dîsîplînî ya zindanan re rûbirû dimînin. Lê belê atolyeyeke nivîsandinê, ku di tîrmeha 2009ê de hat avakirin, dîyar dike ku tunebûna mêran li vê derdorê, weha dike ku hin girtî nasnameya xwe baştir nas bikin, dîroka xwe bêhtir fêm bikin û hindik jî be, piçekî azad bibin.

Navenda veguncîna civakî ya jinan a li Santa Martha Acatitlayê, ku di 29ê adara 2004ê de hat îlan kirin, dikeve taxa bi heman navî, nêzî Delegacion de Iztapalapa, taxa herî xizan û aloz ya paytexta Meksîkayê, Meksîko. Sazî hem weke navenda binçavkirinê, hem jî weke zindana ewlehîya bilind li kar e; binesazîya wê jî 1 600 şûnan dihewîne. Anuha, 1 900 jinên girtî tê de hene.

Dirûvê heştgoşeyî ya kozên wê, îlhama xwe ji projeya panoptîk a feylesofê sûdperestîyê Jeremy Bentham ya sala 1791ê de sazbûyî digire. Wî xwest dahatê zêde bike û mesrefan kêm bike û lewre jî mîmarîyeke weha pêşnîyaz kiribû ku ji birceke navendî, çavdêrîya daîmî ya avahîyên ronahîgir lê di wan re alîyê din dîyar nîne, mumkin be. Bi vî rengî, çembera Santa Martha Acatitlayê ji derbasgehên helezon yên ji dîwarên ronîkirî pêk tê: girtî hertim di bin çavan de ne. Ew nizanin ka kes li wan dinihêre yan na, lê ew misoger in ku çavê kesekî li wan e. Ev "pergala-sîxûrane" jî weha dike ku girtî li hev û dû binihêrin, bêyî ku çavdêr were dîtin. Weha zemîneke dîsîplîner belav dibe, ku Michel Foucault wê weke *"noqteya bicihanîna cezayî"* (1) bi nav dike.

Mirov ji ku û bi ku de here, hemû rê wekhev in. Qulên dirêjkî yên li dîwarên beton yên salonan hatine kolan hesteke xapînok a firehîyê didin. Ji van qulan hucre, meydanên piçûk ên basketbolê û hewşên gulover tên dîtin. Ev tengesalon yek li pey yekê, guloverkî û zîkzakî dirêj dibin; meşa yekî ji hêz dixin, yekî gêj dikin û weke narkotîkê tesîrê li ser her tevgera yekî dikin. Mekanîzmayeke ortopedîk a hişk, tevgera girtîyan bi rêk û pêk dike û li pêş kesayetîyên xwîngerm û aloz dibe asteng.

Dengên girtîyan di van rehan re, tên bihîstin. Di zindanê de, divê tona dengî bilind be da ku deng dirûvekî xurt bigrin; lewra ku tenêtî ya li vî warî serdest e jî, di bêdengîyeke sohbetan de, aloz û nearam pêk tê. Dengekî neahengdar û parçekirî li her derî belav dibe û di xelekên avahîyê re tê û diçe: ev mûzîk e, ya ku ji her du hewşên hundir belav dibe û rîtma komên "amazonan", ku *cumbia* an *hîp-hopê* direqisin, lê dixe; ev heyhê û ken in, protestoyên ku di maça basketbolê de bilind dibin; ev qîrîn in, ku di nêzîkatîya ne bi dil de difetisin û bê bersiv dimînin, gazincên van kesên ku êdî tenê dikarin biqîrin, bi hêvîya ku dengê wan bê bihîstin; ev qerebalixa leyistikên zarokan e (2); ev dengê pêpikên kursîyan e, ku di odeyên atolyeyan de li erdê dixin; ev xirecira mezin a dengên girtîyên ku di zaboqên pêpelokên ber bi zindana mêran de, xeberên malbatê, gotinên evînê, dijûn, şor û sohbetên şehwetî, peymanên karên qaçax ên her şêwazî bi derveyeke din a bi xwe jî girtî, bi nêrîtîyeke dûr re, ku bedenên wan bêrîya wê dikin, pev diguherînin. Qerebalixa daîmî ya girseyê, tiştê ku miştên li hev xistî, lihevkirina dengên şad û gazincker, bê navber di zemîna girtî de diseyirin û olan didin; bi vî rengî jî, guhdarîyeke bê dawî vedibe û nayê zeft kirin.

Belavbûna bêhnên cihêreng li vê xirecira daîmî zêde dibe. Tevî ku di zindana Santa Marthayê de, hilmeke bê mîqrobîyê ya ji henaseyên ava klorê barkirî belav dibe jî, digel bêhneke madenî û ji pîsatîya avdestxaneyên asêkirî û pêlên xwêdanê yên di derbasokan de pêk hatî, yanî tevahîyeke sergêjker a ku dilê mirov dixelîne û kincên mirov qirêj dike, hewayekî tevlihev û bi tahma xwarinên cihêreng ku bi xêra pereyê li zindanê bidestxistî yan jî pereyê xizman hatîn çêkirin, digihîje kepûyê mirovî. Di vê henaseya jîyanên zindankirî de, hilmên *tortillayên* biraştî, şorbeyên tûj, birinc, parçeyên goştê soskirî û bi îsotan, atmosfera malên gelî tînin bîra mirov, her weha bêhna xwarinan zêde tê ku li bazarên kolanên labîrentî yên navenda dîrokî ya Meksîkoyê, ji hêla ticarên seyyar ve tên firotin. Zindîtîyeke bêhnî ku tamsarîya xwarinên girtîgehê - ji ber nebûna pere û demê - dide jî bîr kirin.

Hesteke din li maneya xwe digere: destdan. Dema ku qet dest bi endamên bedenê nekeve, ev hebûna fîzîkî û exlaqî ya pir, girtîyan bi kûrahî diguherîne. Ew dixwazin destdanê ji nû ve hîs bikin nemaze destdana cinsî. Hin awir, ji nihêrînê bêhtir dest didin, diferikînin, dipelînin û vedişelînin; çav bi qasî livên tilîyekê tên û diçin û li ser bejna mêrên ku di nava hefteyê de têne girtîgehê, li şehwetê digerin. Hin jinên ku zewaca wan têk çûye, tercîha têkilîyeke lezbîyen dikin, ku di destpêkê de demî ye û hêdî hêdî xurt dibe; an jî pêwendîyeke weha ku, bi qestî an neqestî, dihat înkar kirin, û li "derveyî dîwarên" civaka asayîbûyî ya heteroseksuel, di nav dîwarên yekzayend de azad dibe.

Piranîya van jinan ji paytext û *estado ya Meksîkoyê* (eyaleta Meksîkoyê) tên. Nîvê wan bi tenê dibistana seretayî qedandîye; %20 ji xwendin û nivîsandinê bêpar in; hejmareke pir hindik *prepa* (lîse) qedandîye û xwedan dîplomayeke zanîngehê ne (3). Piranîya wan di bin sînorê xizanîyê de dijîn. Her çîrokeke jîyanê yekane ye, lê belê yên feqîran dişibin hev; helbet bîyografîyên zindana Santa Martha Acatitlayê heman zor û zehmetî derbas nekirin, lê belê di vegotinên wan de, mîrateke hevpar a xiraker xuya dibe. Berî girtina xwe, piranîya wan karê malê dikir; hinên din jî, di kargehekê de dixebitîn; hejmareke mezin ji wan bi fihûşê debara xwe dikir. Li gor anketa li ser hêmanên krîmînojen ya ku parêzêr Jose Luis Castro Gonzalez ê berpirsê atolyeya darteraşîyê ya girtîgehê meşand, %86ê girtîyan di zarokatîya xwe de rastî êrîşa fizîkî hatine. Ji van %86 yan jî, %55 dê û bav an jî endamekî/e malbata wan dest dirêjî li wan kirîye yan jî dest avêtîye wan; %54ê wan ji mala dê û bavê xwe revîyane an jî jê hatine derxistin; û %70yê wan jî hevserên wan li wan xistîye.

Îselaya 20 salî, porxelek, bi gep û kulêmekên qelewik, bi kubarî dimeşe û bi şîrînahî tê atolyeya nivîsandinê. Dema ku ew ket hepsê, laşê wê komeke hêstîyan bû, ji ber tiryak, alkol û fihûşê xira bûbû. Îsela li kolanê ji dayik bûye, mezin bûye û hatîye girtin. Lê ev kolan ne kolaneke asayî bû: kolaneke erjeng û bêhêvî bû, ku weke întîhareke gav bi gav tê, kolaneke weha bû ku mirov, her ku diçe, tê de rezîltir dibe û timî neçar dimîne. Hatina dunyayê ya Îsabelayê, bixwe înfaz bû; hebûna wê, jîyaneke bêwar; stargeha wê, xirecireke valahî û şaşîtîyan bû. Li derve, wê jîyana xwe di binê kuneke nesaxî û rezaletên dawî li wan nayê de derbas kir. Di rûniştineke li ser nivîsandina rojnivîsan de, ew hinekî behsa laşê xwe yê xirabe dike û dibêje: *"Ne ez tundrew bûm, jîyanê weha li min dikir."* (4)

Dengê Îselayê, ku bi bişirîneke germ diaxive, trawmayên cidî dide xuya kirin; ew di xirakirinê de çêbû û wê bi êrişên berdewam kesayetîya xwe ava kir. Di cezayê binpêkirinê de, Îsela hewl dide ku birînên laşê xwe yê di sazkirinê de fam bike û hel bike; di zindanê de, yanî di girtina warî de, ew ji kavilên bedena xwe, madeya ji nû ve sazkirina xwe derdixîne. Îsela ji tunebûna azadîyê û ji tecrîdê êşê dikişîne, lê wê malbata xwe ya pêşî di girtîbûna xwe de dît. Di atolyeyekê de, ew behsa hucreya xwe dike û dibêje: *"Berê, dilê min mala min a bi tenê bû; îro, hê jî weha ye û ez dilê xwe bi we re par ve dikim. Lê îro, mala min a rastîn jî heye. Ez dixwazim mala xwe şanî we bikim!"* Îro, ew dest bi avakirina "mala" xwe ya nû dike, bedena xwe mîna stargehekê û hawirdora girtîgehê weke piştgirîyekê saz dike.

Ethelê fanêleyekî şîn bi awayê "lawikan" li pişta xwe girêdaye û berçavkên camên zelûl bi porê wê yê kin û kurîşk ve şidandî ne. Ew weha dibêje: *"Sê zarokên min hene û ez ji wan pir hez dikim; lê belê, li vir, di vê hepskirinê de, ku herroj min ji jîyana xwe ya dayikane bêpar dihêle, ya ku xweserîya lebatên min ji dest min girt, min, karî di jîyana xwe de cara yakem, ez tercîha xwe ya cinsî ya rastîn îfade bikim. Lezbîyenîya min a înkarkirî li cem me, di nav jinan de, ji nihêrînên li kolanan û kes û karan rizgar bû."* Yeka din dibêje: *"Ez ne lezbîyen im, lê dema ku hevgirtîyeke min dest dide min, bi min mijûl dibe, min maçî dike, min hemêz dike û şorên evînê ji min re dibêje, kêfa min jê re tê."*

Li qata zemînê, aşxaneyek heye ku komeke dayikan tê de xwarinê difiroşin, hema xureka (arê garisî û fasûlîyên barbûnye) ku bi destê xwe çêkirine. Ev xwarinên hanê jî, tên reqabeta *comida de rancho* (5) dikin. Zarokên li girtîgehê ji dayikbûyî li dora wan civîyane, dayik jî hewayê *tiangui*yan ji nû ve çêdikin; ev peyva bi zimanê nahuatl, tê maneya bazarên mezin û rengareng ên ku li taxên herî jar yên Meksîkoyê û li deverên din ên welêt peyda dibin. Li Santa Martha Acatitlayê, zarok pîroz in; dayik jî pîroz in, digel ku hin ji wan di şûn û warên ji bo karê malê veqetandî de bimînin -di hin zemînên girtîgehê de, girtîyên cuda hene, yên ku xwe li lîstik û qerebalixa zarokan nagirin û dayikan napejirînin-. Lê herçîya dijûn ji jineke ducanî re gotibin, ji bedena dayikane re rêz negirtibe, an jî li zarokên piçûk xistibe, nahlet lê be! Ev dayik, ji bo girtîyan weke mînak in, jinên hepsî di karên malê yên van jinan de, li heyînîya malbata xwe û nexasim zarokên xwe yên ku ew nikarin wan bibînin, digerin. Carinan, dayik, keç, nevî, jinbira di nav girtîyan de cih digrin, wan jî girêdanên xwe yên kesûkarîyê û adetên xwe yên malbatî ji nû ve ava kirine. Li nav vê dostanîyê, di derbasokan de rûyên madûmiroz, qûlkirî, tirsonek, ji rîtma bêaheng a gerên xwe re hiştî, dimeşin, tijî tiryak û êşên bêderman, ew gotinên qutkirî îfade dikin; ev amajeyên sîyayî mijdarîyeke peyvan derdibirin. Êdî kes li wan naaliqe û awirên "zindîyan" bi wan nakevin. Bi demê re, di vî warî de ku herkesê timî rastî kesên din tê, hebûna wan li ber çavên xelkê winda dibe; li girtîgehê, pir kes jî di kevîna tenêtîyê de bi bin dikevin.

Margarîta pîreke aram e. Lê ihtîmal e ku ew ê di girtîgehê de pîr bibe; ew ji mêrkujîya bi qestî mehkûm bûye. Gunehê Margaritayê çi bû? Ew di demeke şaş de li cihekî şaş bû. Her roja xwedê, wê di kolaneke qerebalix de mutbexa xwe ya seyyar bi cih dikir; li cem bîdonên avê û sîtilên tijî penîrê *Oaxaca*, dolmeyên *huitlacoches* û *chiles jalapeños*, li ser menqela xwe, *comal*ê *quesadillas* dibiraştin (6) û ev heta dawîya ber êvarkî difirotin. Tax fêrî hebûna vê jinê bûbû, jina ku weha bi awayekî bêihtîşam, wêrek û bi şeref debara xwe dikir. Li ser kevîya rê ku Margarîtayê tê de *nixtamal* (7) tevlihev dikir, pevçûnek derket, qerebalix çêbû û derba kêrê li mêrekî ket û mir, ew jî bê guman qurbanê arîşeyeke navbera keleşên dijberî hev bû. Dema ku polês hat cihê bûyerê, Margarîta hê jî li cihê xwe disekinî. Di serî de, ew weke şahida sereke birin qereqolê, paşê bû gumanbara tawanê û, di dawîyê de, ji mêrkujîyê mehkûm bû. Detayên vê lêpirsîna ku bi lez û bez hat meşandin, nayên zanîn. Xwendin û nivîsandina Margarîtayê tune ye, û wê jî, bi pêbawerîya koran, hemû belge îmze kirin.

Em dizanin ku, ji ber kêmasîyên perwerdeyê û mûçeyên pir nizm, polîsê meksîkî di destê endustrîya tawanê de ye û di dunyayê de yek ji polîsên herî bertîlxur e jî. Margarîta bi makîneya polîs û ya dadgerîyê re rûbirû maye, makîneya ku, ne ji bo wê, lê li dijî wê dixebite. Tahlîya berdaneke dualî pê re heye: edaletê dev ji xelkî berda û "civaka sîvîl" jî dev ji edaletê berda, yanî şahidên bûyerê (ji ber tirs, tirsonekî an nepeywendîdarîyê) negotin ka wan çi dît û çi nedît. Margarîta, ji bo ji nû ve mehkemekirinê, di nav hewldanan de ye. Lê, heta niha daxwazên wê hatine redkirin.

Duşemê 20ê tîrmeha 2009ê, di atolyeya darteraşîyê de, haleyeke zirêçî derdikeve holê û hatina baranê nîşan dide. Li ser dezgehên bi sîtilên boyaxê li ser hev kirî, parçeyên lambrîyê, frîz, kaxizên dîwêr ên hatine bikaranîn, kornîşên derizî, hevîrê modelçêkerîyê, bişkok û destikên mobîlyayan, firçe, konserveyên zingargirtî yên weke qutîka pênûsan hene; jin li wir çarçove, albûm, portmanto, binkê sînîyan çêdikin, ku wê bi pey re ji alîyê girtîyan ve bên kirrîn, an jî di hin dikanên herêmê de bên firotin. Di hatina şevê ya bi bêhnên çirîşa darî de, li nav firçeyên kurîşkî yên resimê û kaxizên qutbûyî, solên ji rengê axê yên *La Reina del Pacifico* (Şahbanûya Pasîfîkê) diçirisin. Sandra Avila Beltran, ku li Sinaloayê ji dayik bûye û pir dewlemend e jî, ji hêla hukumetê ve bi serkêşîya qaçaxkarîya tiryakê li Meksîkayê hat mehkûmkirin û, ji îlona 2007ê û vir ve, li girtîgehê ye. Pantorekî qehweyî yê tewandî û korsajeke rengê kremayê çirûskî lê ne ku digel neynûkên wê yên qusandî û porê wê yê reş î bi şiklê lozanjê, diguncin. Bi mîlyonan dolarên wê hebûn, markayên meydana Vendomeyê lê bûn, ji nêzîk an jî dûr ve, wê serkêşên bihêztirîn kartelên welêt nas dikirin, lê, anuha, ew digel xebatkarê atolyeyê li ser pîvanên neynikekê şor dike. Di rabirdûyê de, ewqas hezkirîyên wê hebûn, anuha, ew bi tenê ye û di vê neynikê de, li wêneyê xwe yê berê digere.

Ji bo piranîya van jinan, fikira "cihekî din", berî her tiştî têkoşîna li dijî jibîrkirinê ye. Dema ku neynik û dîtina mirov, digel dîwarên bi rengê mezarî tên, ji ber qîrînên depresyonê, pevçûnên hevgirtîyan û kwîtandina emrên "serikên piçûk", mirov nikare di nav wan de razê, dûrbûna ji dunyayê asayî ye. Zehmet e ku mirov ber bi derveyî ve here, bi wateya van çîtan bawer bike, dema ku ew ji bo bêhtirî 20 salên hepsê mehkûm bû, dema ku temenê mirov bi qasî cezayê bê ye û malbat û hevalan jî ew bi temamî ji "dîwar kir" û ji bîr kir. Jixwe, hejmareke mezin a girtîyan xwe dispêre ol û dînê, an jî bawerîya Încîlparêz, Mormon, Şahidên Yahweyê, hildigrin, ku ew jî, berevajî bernameyên çandî, bi rehetî xwe digihînin zindanê.

Ji ber heyînîya taybet a her girtîyekê, her yek li gor pîvan û nirxên cida û dijberî hev, jîyana girtîgehê derbas dikin, ku ev nirx jî, bi rabirdûû siberoja wan a li derve ve girêdayî ye. Ji bo hin jinan, piştî dawîya cezayî, azadî mîna karê wezîfedarên goristanan e: ew bi tenê ne, bê alîkarî û ji malbatê derêxistî, di nav bêîstîqrarîya kolanê û bêkarîyê de dimînin. Li derve, bi pey koçeke ferzkirî ya çend salan, heta dehsalan re jî, ew carina rastî "zemîneke din" tên ku ji bo wan nenas e û ew jî ji bo wê nenas in, an jî tenê bi statûya xwe ya ´eybê tê de naskirî ne: ya kevnegirtîyan. Carcaran, ew li girtîgehê vedigerin. Ji 42 jinên ciwan ên ku di kanûna 2008ê de hatibûn berdan, 18 di dawîya çileyê 2009ê de vegerîyabûn.

* Profesora zanîngeha Lille 3

1 Michel Foucault, *Surveiller et punir [Çavdêrî û ceza]*, Gallimard, Parîs, 1975

2 Hin jin li girtîgehê dizên û zarokên wan dikarin heta temanê 5 sal û 11 mehan li cem wan bimînin

3 Li gor anketeke ku ji hêla Jose Luis Castro Gonzalez ve hatîye kirin û Luis Manuel Serrano Diazî, mamosteyê pêzeliqandinê yê *Centro Femenil de Readaptación Social Santa Martha Acatitla*, di dema du hevdîtinên tebaxa 2009ê de li Meksîkoyê, pêşkêşî me kir

4 Îfadeyên girtîyan ku li vir cih digirin, ji rûniştinên atolyeya nivîsandinê ya tîrmeha 2009ê ya li *Reclusorio Femenil de Santa Martha Acatitlay*ê hatin girtin

5 Girtî, weha xwarinên girtîgehê bi nav dikin

6 Ev xurek, bi rêzê weha ne: kumikeke reş û boz a xwarbar, ku li ser garisî mezin dibe, îsotên meksîkî, tavika adetî ji bo biraştina *tortillayan* û boreka garîsî ya bi penîrî dagirtî

7 Hevîrê garisan

Wergera ji fransî: Simko Destan

ÇÎN

# Jinbûn li Çînê…

LAURENT BALLOUHEY

Li Çînê, lîberaliya aborî ya van sê dehsalên dawîn bi xwe re lîberalîzasyoneke civakî jî anî. Şexs, mêr û jin, êdî karîbûn piçek xwe ji wê kontrola giran a dewlet û saziyên mîrî rizgar bikirana ku heta wê demê li ser jiyana wan a taybet zal bû. Lê belê, di heman demê de, pêvajoyek bi rê ve diçe ku tê de vegera bo urf û adetan û vejîna wan pirêzeyên rabirdûyê diyar in ku li jêr rejîma Mao Zedong de hatibûne lawazkirin : wekî neyeksaniya navbera cinsan di perwerde û qada kar û kasibiyê de, laşfiroşiya jinan, cudakariya beramber keçikên temenpiçûk (tenduristî, mafê xwendina li dibistanê, hwd.) Isabelle Attane (1), di vê bareyê de dibêje ku *"di gellek waran de statuya jinê bi paş ve ket, û mecbûr man ku careke din bi derdoreke mêrane re li hev bikin, ya ku wan di rewşeke hessas û tirsnak de digire".*

Çîniyeke ciwan ne xwedanê heman nirxî ye bi çîniyekî ciwan re, lawik xwediyê awantajên zêdetir in û bêguman bergehê tercîh û hilbijartinan ji wan re gellekî firehtir e. Di encama van pêşhukmiyan de, ku, çendan di nav xelkê bajarî de ber bi nemanê ve biguherin jî, li herêmên gundewar baw û belave ne, rêjeya zarokên ji cinsê jinane ku di temenekî piçûk de dimirin, ji rêjeya zarokên ji cinsê mêrane gellekî bilindtir e. Bi rêya hilbijartineke dayik û bavan a berî zayînê, ku bi saya ekografiyê çêdibe û qedexe ye, lê belê ji ber gendeliya hindek doktoran rê û dirbên wê peyda dibin, salane qederê 500 000 keç bi vî rengî ji holê têne rakirin.

Berevajî tekamûla demografîk a li deverên din ên dunyayê, ev çil sal in di civaka çînî de rêjeya hevwelatiyên mêr bi rengekî zelal zêdetir dibe: sala 2005'an, berambetî her 122 mêran 100 jin hebûn li Çînê. Heman meyl û taybetî li welatên Asyayê yên wekî Hindistan, Pakistan, Bangladeş, Endonezya û Taywanê jî zal e. Heta wê dereceyê ku zanyar ketine fikara wê ihtimalê ku ev pêvajo – ku pirr rohn û aşkere ye li Çîn û Hindistanê, du welatên herî qerebalix ên cîhanê– di dahatûyeke wêdetir de hevsengiyên civakî û demografîk ên cîhanê xerab bike.

Li aliyê din, Leslie Chang (2) a rojnamegera amerîkî û bi regez çînî, kevne nûçegîhana *Wall Street Journal*'ê li Pekînê, bo maweyê sê salan da pey du keçên bi navên Min û Chun Ming, ku ji gundê xwe derketibûn da ku biçin li Dongguanê bixebitin, ku Dongguan bajarekî pirr mezin ê kar û kargehan e li deltaya rûbarê Mirwariyan (Zhu Jiang), di navbera Canton û Hong Kongê de. Nivîskar me diavêje nav rastiya jiyana rojane ya van jinên karker ku, mîna gelek jinên gundî yên çînî, ber û bextê xwe dane bajaran da ku li gundên xwe bêkar û emel nemînin, ku ji xwe li pirraniya wan gundan mêrên di temenê karkirinê de nemane û bi tenê kal û pîr û zarok lê ne.

Ev belgenameya ku di heman demê de weke roportaj û rojnivîskeke taybet e, wan pêwendiyên dostane û hevgirtinê aşkere dike ku di wê seqaya endustriyel a sar de bere bere reng û dirûv digirin. Chang, şertên req û sext ên jiyan û xebata li van "bajar-kargeh"ên hûtane teswîr dike û ezmûna van karkeran bi hostahî û bi req û rûtî vesaz dike: rojên ku ji bo mehê çend yuanan (anku pîçek kêmtir ji 11 euroyan) mirovî şeqî û şerpeze dikin, tenêtî, bêhêvîtî. Lê belê, digel zehmetiyan, ev jin di cîhana bajarî de asoyên nû keşf dikin û xwe digihînine ezmûnên wisa ku jiyana li gundan dê nekiraya nisîbê wan. Ev "koçberên navxweyî", ku têhn û arezûyeke tîr a azadiyê wan dehf dide, dawiyê deftera çarenivîsa xwe bi dest dixin. Ev lêkolîna girîng herweha me têdigihîne ku jinên çînî hêj milên xwe nedane ber "nîvê esmanî", weke ku slogana maoîst dixwast, lê belê qet nebe bi awayekî dilêrane nîvê erdê zer temsîl dikin.

1 Isabelle Attané, *En espérant un fils… La masculinisation de la population chinoise*, (bi hêviya kurekî… nêrkirina civaka çînî), Weşana l'Institut national d'études démographiques, Paris, 2010, 225 rûpel, 25 euro

2 Leslie Chang, *La Fabrique des femmes Du village à l'usine: deux jeunes chinoises racontent*, (Febrîqeya jinan, ji gundan heta febrîqeyê), wergera ji îngilîzî (amerîkayî) Florence La Bruyère, Belfond, Paris, 2010, 460 rûpel, 22 euro

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn
Redaksîyon: Îbrahîm Seydo Aydogan



FEWZÎ BILGE: **Ar û dar**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, bi spatûla, 50 x 40 cm

SEDEMÊN NASKIRINEKE DÎPLOMATÎK

# Amerîkaya Latînî xwe vedixwîne Rojhilata Navîn

MAURICE LEMOINE *

Kanûna 2010'ê Brezîl, Arjantîn, Bolîvya, Guyana û paşê Ekwatorê dewleta Filistînê "di nav sînorên 1967'ê de" nas kirin – bi vî rengî li welatên weke Kosta Rîka, Kuba, Nîkaragua û Venezuelayê yên ku ji destpêka îlankirinê ango sala 1988ên ve ew nas kirine, zêde bûn. Gelo ev nîşaneke nû ya azadbûna herêmekê ye ku Îsraêl lê pirî caran pêkhatina siyaseta amerîkî diyar dike?

*Bi riya vê nameyê, Brezîlya dewleta filistînî, di nava sînorên wê yên 1967ê de vedinase."*: Peyama ku Luiz Inácio Lula da Silva, di 3ê kanûna pêşî ya 2010ê de ji serokê Desthilata Filistînî Mehmûd Abbas re şandiye, bi wan gotinan dest pê dike. Herçendî têra xwe balkêş be jî ev name, peyama tê de, li ser mijarê, ne ya pêşî ye. Gava, bi xwespartina biryara nivîskî ya hejmar 181 ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY; mijdar 1974) Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) di mijdara 1988ê de afirandina vê hebûnê îlan kir, ew yekser li Amerîkaya Latîn ji aliyê Kuba, Venezuela, Nîkaragua û Kosta Rîka ve hat venasîn. Lê belê ji wir û vir ve jî tu gav nehatin avêtin.

Divê li benda 2009ê bihata rawestan – li vir kurtebirîyek mijara gotinê ye– ji bo ku Rojhilata Navîn li herêmê bi ser xwe ve bihata û careke din xwe nîşan bida. 6ê kanûna paşî, serokê venezulî Hugo Chávez ji ber operasyona "Zirinca tîrkirî" ya li Xezayê Îsraîl bi *"pêkanîna lîstikeke plankirî ya terora dewletê li dijî gelê filistînî"* sûcbar dike û têkilîyên xwe yên dîplomatîk yên bi Tel Avîvê re qut dike. Hema di pey re Bolîvya heman tiştî dike û Evo Morales bi dengekî bilind gilî û gazincan ji "Konseya ne-ewlekariyê" ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî dike. Venezuela jî piştî çend mehên din di nîşanê de danûstandinên xwe yên bi Filistînê re dertîne asta sefîran.

Li Karakasê û Pazê, eynî weke li Havana an jî Managuayê, tu kes siyaseta kevneşop a Tel Avîvê ku temamkera tekûz a Mam Sam e gava ku evê dawî dixwaze xwe "bê alî" bide xuya kirin, ji bîr nake. Wekî din… Gava, di 1977ê de, serokê amerîkî Jimmy Carter, ji ber binpêkirinên mezin ên mafên mirovan, firotina çekan ji bo Guatemalayê radiwestîne, ji wir û şûn ve Îsraîl çekan difiroşe heman welatî. Di pêvajoya serhildana sandînîstan de (1979), biçekûrextkirina hêza parastina neteweyî ya Nîkaraguayê heta du hefteyan beriya reva dîktatorê Anastasio Somoza jî wê bê navber bidome. Sûbayê xanenişîn yê Tsahalê û bazirgan Yair Klein yê ku li Kolombîyayê di 1988ê de hêzên "narkoparamîlîter" saz kiribûn û perwerde dikirin, berî çendekê eşkere kir ku kar û barên qaçax ên wî hingê dimeşandin *"ji aliyê hukûmetên îsraîlî û kolombî ve dihatin erê kirin û ecibandin"*. (1)

Li vî welatê dawî yê qirkirinan û gorên komî, Wezîrê Parastinê Juan Manuel (niha serokdewlet e), di 2008ê de bi van gotinan li xwe mikur hat ku dewleta wî bi Îsraîlê re ketibûye nav hevkarîyekê: *"Li dijî terorîzmê berî her tiştî bi "saloxdarîyê" têkoşîn tê kirin û di vî warî de Îsraîl jî dikare destek û alîkarîyeke mezin bide me." (2)* Girêdayî *sazûmanîya* eskerî ya Tel Avîvê, şirketa "ewlekarîyê" ya taybet CST Global –yên din jî hene– peymanên bi mîlyonan li gel hukûmetên kolombî, perûyî û hondurasî pêk anîn û niha hêzên wan ên zextkar perwerde dikin. (3) Bi kurtî, di navbera hêzên pêşverû yên parzemînê û dewleta bi navê "ibrî" de lihevnekirineke dijwar heye.

Tevî vê yekê jî li hêleke din a ku ji kanûna paşî ya sala dawî ve bûyer bi lez û bez xwe didin xuya kirin, nexasim piştî ku Arjantîn, Bolîvya, Ekwator, Şîlî û Guyanayê (seroka niha ya Yekîtîya Dewletên başûr-amerîkî [Unasur]) xwe da pey Brazîlyayê. Uruguay û Paraguay didin zanîn ku ew ê jî di 2011ê de bidin ser heman şopê. Perû ku di navbera 13 û 16ê sibatê de wê Lûtkeya Amerîkaya başûr - Welatên ereb (ASPA) pêşwazî bike, li ser mijarê dixebite.

Hemû ne bi heman lezê dimeşin; Brazîlya, Quîto, La Paz û Buenos Aires bi zimanekî rasterast û zelal sînorên berî Şerê Şeş Rojan (1967) di meriyetê de bûn –Şerîa Rojava, Xeza, Qudusa rojhilat–, Şîlî ya serokê kevneperest Sebastián Piñera bixwe, xwe ji bikaranîna vê vegotina zelal a têkildarî şermezarkirina dagirkerîyê beralî dike. Lê belê dîsa jî, wêdetirî vê ferqa ku ne ji rêzê ye, komek hêman dikarin ronahîyê bidin ser lihevnêzîkbûna dewletên ku kêm an jî zêde bi helwêstên xwe yên pêşverû tên nas kirin, û hukûmetên bêhtir nêzî Washingtonê tên nirxandin.

Bi xwestina kursîyekî endametîyê di nav Desteya Ewlekariyê ya RNYê de, Brazîlya rola hêza xwe ya ku xwe nîşan dide, teyîd dike û bersiveke ji dûdilîyê xalîkirî dişîne ji bo Dewletên Yekbûyî yên ku hewldana wê ya par a bi hevkarîya Tirkiyeyê ya navbeynkarîya di krîza li gel Îranê de bi biçûkbînî pêşwazî kiribû. Weke wî, welatên herêmê yên din jî xwedî palpiştên zexm in, ji bo îşareteke dostanîyê ji welatên erebî û yên Rojhilata Navîn re bişînin: ew, ji Lûtkeya pêşî ya ASPAyê ya 2005ê û vir ve, bi riya bazirganîyê, himbêza xwe ji vê beşa cîhanê re vedikin. Serbixwe ji xeta xwe ya hevalbendîya Waşhingtonê, Şîlî ya Piñera xuya ye ku herweha hesabê civata xwe ya filistînî ku bi qasî çar sed hezar kes in, dike -bi hejmara xwe ev filistînî civata herî mezin a li derveyî welêt in. (4) Wekî din, heta welatekî weke Perû rastgir jî, pir zehmet e ku karibe xwe dûrî liv û tevgera herêmî ya entegrasyonê bigire.

Weke ku pêwist e, li hemberî vê venasîna ku xwe ferz dike, her kesek rola xwe bi cih tîne. Berdevkê Meclîsa Nûneran ya amerîkî ev rewş weke "dij-hilberîner" bi nav kir. Li aliyê Îsraîlê, ji van "manevrayên nû" yên filistînîyan gilî û gazin tên kirin. Tam di heman demê de, Wezîra Karên Derve ya kolombî Maria Angel Holguin (bê henek) weha got: *"Gava bi Îsraîlê re aştî pêk were, em ê Filistînê binasin"*. (5)

Li gel vê yekê jî, ev manevrayên dawî tên wateya nîşanên girîng ên serxwebûna nû ya Amerîkaya Latînî û nerazîbûna li hemberî xetimîna muzakereyên rasterast ku DYA jî bi xemsarîya xwe ya li Rojhilata Nêz destekê dide vê xetimînê.

* Rojnamevan, nivîskarê pirtûka Pênc Kubayî li Miamiyê, Don Quichotte, Parîs, 2010.

1 Adriaan Alsema, "Israeli mercenary threatens to blow whistle on Colombian officials (Eskerên bi pereyan ên îsraîlê gefan dixwin ku giliyê sûbayên kolombiyayî bikin)", Colombia Reports, Medellín, 21'ê çiriya paşî ya 2010'ê

2 BBC Mundo, 5'ê tîrmeha 2008'ê

3 Li Hondurasê, serkêşên darbeya eskerî ya hezîrana 2009'ê alavên teknolojîk ên îsraîlî ya herî pêşketî bi kar anîn da ku berxwedana partîzanên serokdewlet Manuel Zelaya bişkînin

4 Wekî din li van welatan hemûyan civakeke sûrî-libnanî heye ku xwediyê statuyeke girîng a siyasî û aborî ne

5 El Tiempo, Bogotá, 1'ê çileyê 2011'ê

Wergera ji fransî: Baran Nebar



FEWZÎ BILGE: **Wejîn**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 70 x 60 cm

www.arsivakurdi.org

SÛDAN

# Li Başûrê Sûdanê kronîka serxwebûnekê

Marc Lavergne *

Serhildana Başûrê Sûdanê, berî danezana serxwebûna welêt a 1ê çileya 1956ê, tîrmeha 1955ê dest pê kir. Tabûra ku garnîzona bajarê Toritê stend, li ber sûbayên xwe rabû. Vê yekê bi vî rengî reda başûrê ku şênîyên wê anîmîst û xirîstîyan in, jî derbirî, lewma wan dît ku kilîtên welêt ketin destê elîteke bakurparêz a ku hevgira dagîrkeran bû û dixwest nasnameyeke bi tenê ereb û misilman li ser tevahîya Sûdanê ferz bike.

Şerî bi navê tevgera Anyanya ("jehra mêr") dest pê kir û heta bi sala 1972ê dewam kir. Di çarçoveya şerê sar û şerê di navbera welatên ereb û Îsraîlê de Dêr, Etyopyaya Negus (meliktîyê) û Tel Avîvê destek dida vê tevgerê. Serxwebûnxwazîya başûr weke îfadeya xetê qelşa di navbera Rojhilat û Rojava, cîhana ereb û Afrîkaya reş, Xirîstîyanî û Îslamê de hat dîtin. Xirîstîyanên hê nû di encama xebatên mîsyonên katolîk û protestan ên li deverê ji sedsala 20ê bi cih bûyî de qulipî, bi zorê %20ê serjimara başûr pêk dianîn û li beramberî vê piranîya serjimara herêmê ji bawermendên dînên ji rê û resmê pêk tê û hindikahîyeke misilman (nêzî % 5ê tevahîya serjimarê) heye. Vê dubendîya dawî, tevî vê rastîyê jî xwe îfade dikir. Li gor partîzanên wê yên li derve, serxwebûna Başûrê Sûdanê diviyabû yan bike ku pêşketina Îslamê li Afrîkaya reş were asteng kirin, yan jî bibe sedem ku cîhana ereb û nexasim Misira nasirî ya ku pişta bêalîbûnê û berxwedana filistînî digirt, berepaş biçe. Ew herweha ji Afrîka û ji kolonîyên Brîtanyayê yên li rojhilatê Afrîkayê, dûrgirtina Yekîtîya Sovyetan weke navgînekê dihat dîtin. Ev kolonîyên behsa wan hat kirin, di destpêka salên 1960î de serbixwe bûn.

Lê belê, di rastîyê de, armancên tevgera Anyanya – newekhev û birêvebirîyeke wê ya siyasî ya xurt nîne – yekdeng nebûn. Başûrê Sûdanê erdekî fireh ê 650 000 km2 ye û ji gelek herêman pêk tê û bi peywendîyên xwe yên bi du qutbên cazîbeyê ango bakurê Sûdanê û Rojhilatê Afrîkayê re ji hev cihê dibin.

### Rêlibergirtina erebkirinê

Ya darîçav ev e:

- "Başûrê Başûr" ango Ekwatorîya ya ku seranserê sînorê ji Komara Navenda Afrîkayê (KNA) heta bi Etyopyayê dirêj dibe. Li vê herêma daristanên tropîkal yan jî deştên têr dar, bi piranî komên piçûk ên cotkaran dijîn. Li vê herêmê gelên serjimara wan pir ên mîna Zandêyan (nêzî 2 milyon mirovan) jî hene ku li ser xetê di navbera KNA û Komara Demokratîk a Kongoyê (KDK, berê Zaîre bû) de li her du alîyan in. Mirov dikare koçerên sewalan xwedî dikin yên ku li deverên herî hişk û zuwa yên mîna Toposa ya li rojhilat diçin û tên jî li wan zêde bike. Dora vê herêmê nexasim beşa wê ya navendî, ji alîyê dagirkerî ve gelekî hatibû girtin: hebûna mîsyoneran, li wir perwerde û peywendîyên bi kolonîyên brîtanî yên Kenya û Ûgandayê re hêsan dikir. Kadroyên tevgera Anyanya jî ji vê elîta ku encama kolonîzekirinê ye, peyda bûn. Vê tevgerê ewqasî berê xwe dabû rojhilatê Afrîkayê ku siyaseta brîtanî ya "closed districts" (wilayetên girtî) tevahîya danûstandin û çûnûhatina di navbera bakur û başûr de heta sala 1947ê qedexe kir. Londonê dixwest, ji alîyê bazirgan û waizên ji bakur tên ve, erebkirin û misilmankirina başûr asteng bike;

- Li bakurtir, herêmên Nîla Jor û Bahr el-Xezal hene, her du herêmên li dora deşta kûr a çiravî ya Nîla Jor ji alîyê Nîla Spî û çem û rûbarên wê ve têne avdan. Ji destpêka sedsala 19ê ve têkilîya wan bi Xartûmê re heye.Xartûm bixwe sala 1824ê li cihê ku çemên Nîla Şîn û Nîla Spî digihin hev hat damezirandin. Fatihên misirî di çêm re ji bendên gîyayên diherikin ango suddan derbas bûn, sala 1840ê gihîştin Gondokoroyê û ev herêm li bazirganîyê vekir ku ev bazirganî jî bi tîcaretxaneyên osmanî û ewropî zindî dibûn. Li rojava, di deştên Bahr el-Xezalê de, heta bi salên 1870yê nêçîra koleyan a ji bo bazarên Misirê û Stenbolê gihîşte asta xwe ya herî jor. Li dora paytextê herêmî Wauyê û navendên din ê bajarî yên çêdibûn, xelkekî soryaz ê ji kole, koleyên azadkirî û eskerên dînê îslamê û zimanê erebî ya cihoka xwe di nav wan de çêkirî, bi pêş diket. Ev cîhana nû her çû bêhtir di nav qada aborî, çandî ya bakurê Sûdanê de bi cih bû. Paşê, sala 1960ê ji navbera brîtanî avakirina riyeke hesinî ya ji Wauyê heta bi Xartûmê, vê girêdana bi navikê ve zexmtir dike.

### Hêvîya di çarçoveya dewleteke yekpare de, mafê wekhevîya tevahîya sûdanîyan, mir?

Bi giştî, başûr di warê dîrokî û aborî de bi peywendîyên xwe yên bi bakur re –ji nêzîkbûna çandî bêhtir ji ber sedemên cografîk– ne wekhev xuya dikir. Ev yek bê guman rave dike ka ji bo çi peymana aştîyê ya li Addîs Abedayê sala 1972ê hatî mohrkirin, bi xweserîyeke fireh a desthilatdarîyê yên navendî di destê bakur de diman.

Vê tecrûbeya xweserîyê ya bi parlemanek û birêvebirîyeke li Jubayê bicihbûyî, bi kelecanê dest pê kir, lê belê wê di demeke kurt de ji ber daxwaza Xartûmê ya "parçe bike û bi rê ve bibe" vemirî. Ji sala 1977ê û pê ve li dijî tawîzên dayî başûrîyan, gelek tedbîr hatin girtin: dabeşkirina başûr li ser sê herêman (Ekwatorîya, Bahr el-Xezal û Nîla Jor), îndekskirina "dinkakratîyê" (1) ya dît ku ji herêmên karmendên bi eslê xwe dînka, bêparhiştina başûr ji kar û hatina ji petrolê û hwd.

Dema ku gulana 1983yê albay John Garang –kevnepartîzanê Anyanyayê yê di artêşa nîzamî de bicihbûyî– pêşengîya serhildaneke nû kir, manîfestoya damezirîner a Tevgera ji bo Azadîya Gelên Sûdanê (SPLM, li gorî tîpên destpêkê yên navê bi Ingilîzî) slogana cihêbûnê bi kar neanî. Daxwaza xwe dispart di çarçoveya dewleteke yekpare de, mafê wekhevîya tevahîya sûdanîyan, bêyî ku di navbera dîn û nijadên wan de cihêkarî were kirin. Vê jinûvedamezirandina Sûdanê li ser hîmên nû ku navê "New Soudan" (Sûdana Nû) wê lê bihata kirin, çi li bakur û çi li başûr, bang li tevahîya gelên marjînalkirî yê welêt dikir û wê herweha bang li tevahîya ferdên li ber yekdestdarîya eşîrên erebbûyî û misilmanbûyî yên gelîyê Nîlê ya li ser desthilatdarîya siyasî, aborî û civakî-çandî ya Sûdanê radibin jî, dikir. Li başûr, wê para bêhtir nûnerîya pozîsyona gelên mezin ên nîlî yên Nîla Jor û Bahr el-Xezalê ango Dînka, Nuer û Şilûkan dikir û ne ya gelên piçûk ên Ekwatorîyayê ku şerê pêşî yê azadîyê dabûn dest pê kirin.

Gelo, tebaxa 2005ê di qezayeke helîkopterê de bi mirina Grang re peyama Sûdana Nû jî vemirî? Bawerîya wê ya bi yekparebûna Sûdanê ku îro li başûr qet behsa wê nayê kirin, li herêmên marjînalkirî yên li bakur û li navendên bajarî ango cihê di bin bandora şer û dewlemendîya petrolê de tevlihevbûn bi lez e, hêvîyeke mezin jî bi mirovan re çêkiribû.

Sê herêmên xwedî statuyeke taybet, deverên derbasbûnê yên di navbera bakur û başûr de jî ji wan xalan in ku di siberojê de mumkin e bibin sedema pirsgirêkan: Nîla Şîn, wîlayeta Abyey û çîyayên Nûbayê. Xelkê van deveran tevlihev e, û tevî berdêlên gelekî giran jî SPLMê ji nîvê salên 1980yê ve xwe li ser komên xwecihî yên li van deveran kiribû. Cihêbûna başûr a misoger e, bi rengekî dijwar pirsa paşeroja van gelên li bakur derdixe pêş.


* Birêvebirê Lêkolînan li Navenda Lêkolîna Zanistî ya Neteweyî (CNRS) û li Navenda Lêkolîn û Belgekirinên Aborî, Hiqûqî û Civakî (CEDEJ), Qahîre/Xartûm.

Jêrenota wergêr: Ev peyvek e ku ji Dînka (navê etnîsîteyekê) û kratiyê (desthilatdarî) hatiye çêkirin û balê dikşîne ser desthilatdarîya Dînkayan. John Garang pişta vê dînkakratiyê digirt.

1 Di bin kontrola Misirê de ji 1821'ê heta bi 1885'ê, di bin birêveberiya lîderekî dînî Muhemed ibn Ebdellah ê jêre Mehdî tê gotin, Sûdanê serxwebûna xwe bi dest xist. Sala 1898'ê ji nû ve hat dagirkirin û kete bin nîrê desthilatdariya hevpar a ingilîz û misirî. Armanca Misirê ew bû Sûdanê bi tevahî li erdên xwe zêde bike û desthilatdariya reel bi xwe di destê Brîtanyayê de bû

2 Bixwîne Alain Gérard, "Faux-fuyants au Soudan (Leylan û serabên li Sûdanê)", Le Monde diplomatique, tîrmeha 1984'ê

Wergera ji fransî: Lokman Guldivê



Fewzî Bilge: **Montaj V**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 30 x 30 cm

## SÛDAN

# Başûrê Sûdanê – dema damezirandina dewletekê hatiye

ANNE-FELICITAS GÖRTZ *

Piştî jimartina dengên referanduma 9ê çileya 2011ê ya di bin çavdêrîya Neteweyên Yekgirtî (NY) de pêk hat, dê Başûrê Sûdanê ku bi piranî xiristîyan e, fermî serbixwe be. Di rastîyê de ji derveyî daxwaza cudaxwaziyê ya Bakûrê Misilman hîç tiştekî din tune ku şekil dide dewleta dahatû ya ji 5 milyonan. Khartoum di encama referandûmê de herî kêm sedî 60 beşdarîya hilbijartinan û sedî 51 deng ji bo cudaxwaziyê daxwaz dike da ku Sûdana Başûr mîna dewleteke serbixwe nas bike û pê re li ser bikaranîna kanîyên xwe yên petrolê bazarê bike.

Li paytexta Sûdana Başûr Cûba piştî şer, qaîdeya aborî ya neqanûnî (qanûna rojavayê dirinde) hikumferma ye: Mîna heywanên hesinî piştî felaketa agirekî mezin ji her quncikê ve învestor û dewlemendên şer herikîn, hatin. Ew li pişt kepenkên giran rûdinên, pere diguherin, yan jî malên erzan ji Çînê tînin û difiroşin, di demeke nêzîk de dibin xwediyên daîreyên luks. Avakirina tiştekî civakî wan elaqedar nake. Bajarê ku li ser taxên hejar û avahîyên qilopilo par ve bûye li ser rêya transportê ji aliyê başûr, ji ser dewletên hawirdor Uganda, Kenya û Komara Demokratîk Kongo ve, tê xwedî kirin. Kamyon ji bo qezenca xwe bikin, rojane malên zarûrî tînin bajêr.

Gava mirov li ser vê rêyê ji bajarê Cûba derdikeve, welat rûyekî gelek cuda nîşan dide. Avakirina rêyan û guhertina pirên ku ji aliyê şer ve hatine xirab kirin, ji aliyê dezgehên alîkar yên DYA ve tên çêkirin, lê ev yek wiha ye, mîna ku heroroj ji nû ve ava bikin. Giyayên dirinde xwe berdidin heta ser rê, xweza bi xetên şewatê û birînên şer ve vegirtî ye; dîmen hîn demeke dirêj xwe ji birînê xilas nake. Makîneya mayinger dikeve nav kursê, li ser zeviyên ku bi saetan tên dorpêçkirin, mayinger dixebitin, jin û mêr bi çizme, rûyên wan bi kumên qeynaxê veşartî, bi gavên gelek hêdî li ser zemînê dimeşin. Erdê santîm bi santîm dikolin û ji mayinên gilover û ji têlên hesin yên dipekin (Drahtmienen) ku li her derê belav bûne, mayinên pepûle yên ku gava zarok bi kêf wan kişf dikin, diteqin û wan difirînin hewayê. Karkerek di rojekê de dikare neh mêtrekare çêbike.

Eastern Equatoria (Ekvatora Rojhilat), yek ji neh herêman e û digihîje sînorê Ugandayê. Herêma Magwi Country li vê derê ye. Navenda wê taxa Magwi bi tirimbêlê çar saet ji Cûbayê dûr e. Hema bêje niştecîyên wê derê tu caran neçûne bajêr. Li dibistana navîn ya ku berî sê salan bi pereyên alîkarên biyanî ji nû ve hatiye ava kirin, ji pêncsedan zêdetir şagird hene. Şanzdeh mamoste di destên wan de şiv lêpirsîna dersan dikin. Ji rewşa şagirdên di nav heman unîformayên dibistanê yên kesk de ku ew tenê wek unîforma dixuyên, mirov ferq dike ku ew di bin zextê de ne. Keç li ser rê, li pêş tirimbêlên ku derbas dibin, radiwestin û mîna şagirdên wezîfedar ên dema berê, heta erdê xwe ditewînin. Xanîyên wan kulubeyên kerpîç yên gilover li çep û rastên rê ne, ew danê dereng yê rojê bi sivnikan dimalin û bi tenekeyên zer li ser serên xwe avê ji bîrê tînin. Li Magwîyê ne borîyên avê ne jî ceryan hene.

Di avahîyeke yekodeyî de zatê komîs(yon)er rûdinê ku ew li her herêma îdarî, ji aliyê polîtîk kesê herî girîng e. Kî bê vê derê divê li benda wî bimîne. Zatê alî bixwe bejindirêj e, unîformaya ûtîkirî lê ye û ev yek nîşaneya endametîya wî ye ku ew têkoşerê Artêşa Rizgarîya Gelê Sûdanê ye (Sudanese People's Liberation Army-SPLA). Pêwîstîya wî di derenceya yekemîn de bi pereyan heye, ji ber vê yekê, ji şirketên peredar yên biyanî gelek hez dike ku hejmarek zêde ji wan li herêmê hene û sedema vê yekê hêsan tê fam kirin: Ew wan wek hedefa hêrîşê dibîne û hewl dide, bi çi taktîkan feyde ji wan werbigire. Buroya wî ya tarî bi maseyeke giran hema bêje tijî bûye. Li dawîyê podyûmeke, ew cîyê ku pal daye rûniştiye, yekmaseyî û kursiyeke xebatê heye. Plansazî ne karê wî ye, ji bo vê yekê bang li karmendê xwe yê birêveber dike. Ew tê û li tenişta wî di navbera kursiyan de cî digire – ne qiral, ne şirîk – û hewl dide ku pêşniyaza komîs(yon)er li gundekî li ser çîyayên berz fînansekirina cîyê firoşgeh yan jî dibistanekê ku destûra komîs(yon)er gerek e, bi awayê dîplomatîk bi sînor bike. Hewldaneke wêrek, ji ber ku derûnîya komîs(yon) er guhêrbar e, dikare ji burokratekî henûn, xwe gelek zû vebiguherîne ser şervanîya xwe.

Karmendê ku endezyarekî bi dîploma ye, gava li ber derî be, ramana xwe serbest dibêje. Pirs ew e ku mirov bigihîje xelkê, bigihîje her kesekî/ê; divê mirov dijminan li hev bîne, ferasetê peyda bike, welew ku avasazîyên dewletê hîn ne di wê rewşê de bin jî. Li ser hezkirina mirovan dipeyive ku ev jî bo her modela dewletê bingeheke misoger e. Ew xiristîyan e û gava bi kesekî/ê re tenê dipeyive, îma dike ku ew ê zêde li ser karmendîya xwe ya li gund nemîne. Pêwîstî bi wî ji bo qedemeyên bilindtir heye, ji ber ku ji bo dewleta dahatû kêm kesên perwerdebûyî hene.

Aktorên wek wî divê berîya referandûmê fikir bidin niştecîyan ka dengên wan ji bo serxwebûnê çiqas girîng e. Tevlihevîya komên gel yên li navçeya Magwi ku ji eşîrên Acholi û Madi pêk tên, bi ser de hindikahîyên Lulobo, Latuka û Bor-Dinka, rewşê zor dike. Bi ser de jî penaberên bi paş ve vedigerin, dibînin ku parçeyekî zeviyê wan ê hebû jî, ji aliyê kesên din ve hatiye dagîr kirin, ev yek narehetîyê peyda dike. Çi van mirovan hemûyan bi hev re girê bide, pêwîstî bi ronîkirina wan li ser wate û armanca dewletê heye. Lavakirinên hestiyar yên serokê Sûdana Başûr Salva Kiir wek vîzyonên diwarojê kêm alîkar in: "Şehîdên me bê sebeb neketine. Temamkirina afirendêrîya wan a mezin li ser me ye! Hinek behsa cudabûnê dikin, hinekên din dibêjin veqetîn. Ji bo min şansek e ku mirov bi dengê xwe dawî li kolonîzasyonê bîne!" Gava li bazara Magwi xelk di radyoyê de guh dide vê peyamê, hinek şaşmayî dixuye.

Daxwaza serxwebûna polîtîk xurt e, lê nedîtbar e; gava mirov tên ba hev, ev yek ji bo wan gelek zelal dibe, – bi alîkariya Xwedê û hejmareke şirketên peredar – pirs ewlekarîya xurek û kêmtirîn mûçe ye. Li vê derê, di nav rêncberên piçûk de pirsgirêka tayînker ev e: Ji bo ez jiyana xwe bidomînim, çi yê min heye? Li vir û li wîr rêzexebat û semîner li ser pêşveçûna werze (zîreat), tenduristî, komelgehî tên çêkirin. Pêşveçûn gotinek e ku hêvîyê dide, lê piştî salan ku alîkarîya xurekê bê pere hatibû belavkirin, êdî plankirin pêwîst e.

Belkî ev yek bi zîhniyeta standinê ve girêdayî, bûye bingeh ku bi temamî bê vîzyonên îdolojîk derbas dibin. Tiştê polîtîk bi yê îdolojîk re bi temamî helîyaye, her yek ji bo mafê xwe yê şexsî têdikoşe. Mîna ku şerê navxweyî yê bêdawî modela dewletê vemirandîye, parametroya "pêşveçûn" bi yên dinyaya global hema wek hev in: tunebûna şer û mezinbûna aborî, qewîkirina komelgehî wek bingeha civakê girîng nayê dîtin. Ew ji ber şer bû, dibêjin Xebatkarên Pêşvebirina Civakê (Community Development Workers) yên ku bi salan e di xebata alîkarîya acîl de cî digirin: Evê yekê herkes fêr kir ku karibe bi tena serê xwe bijî. Civaka berê ku di nav têkilîyên eşîretî de girtî mabû, êdî nameşe. Berê xebatên bi hev re ku ji alîyê serek ve organîze dibûn, karê çandinî yan çareserîya ji holêrakirina zirarên xwezayê, êdî tenê bi pereyan çêdibin. Kî îroj serek be, ev tenê rutbeyekî şeklî ye, nîşana pîrbûnê ye. Ew êdî nikare ji mêrên ciwan yên wek şervan derketine pêş, yan ji sirgunê bi paş ve vegerîyane, tiştekî bibêje. Zêdetir du ji sêyan niştecî di bin 25 salî de ne. Mirov nizane, di sîstema desthilatdar de jihevketin û hevalbendîyên nû xetere ye yan bi awayekî tên maneya paqijî û îstîqrarê.

Ji bo civîna agahdarîya li ser kredîyên piçûk ya li herêma ser sînorê Nimule, çar serek jî hatibûn. Bedenên wan ên ji tesîra birçîtî û alkolê qelsketî eşkere dibû; gava radibûn piya, tenê di xwerastkirina herî dawî de parîkek helwêsta mezinahîya wan dixuya. Tenê yek ji wan karibû binivîsîne, lewra bi vê armancê her car berçavka xwe ya çarçovezêr dida ber çavên xwe. Zû diwestiyan û nikaribûn bala xwe bidana civînê. Gava ji wan tiştek dihat pirsîn, bê hemdê xwe hildipekiyan û gava yekî nêrîna xwe rast dikir, nêrîna wî li cîyekî aliqî nedima; ne li ser civînê, ne li ser panoya nivîsê. Gelo ew di buroya gund de ji bo mohrkirina belgenameyan pere bigirin welew ku divê bê pere be jî? Belê, ma divê niha çi bibêjin? Kûr û dûr fikirîna wan dibe sedema pîqepîqên bê rûmet. Wiha rûniştine, mîna zarokên berê, ji demeke kevnare derbasbûyî – ma ew ne çavê wan e, ew nêrîna bê can ku mirov naxwaze pê re rûbirû bimîne. Bê îrade pirsa, ew di dema şer de (li alîyê) kê bûne, xwe derdixe pêş. Çi kirine, çi jiyane ku nêrîneke bi vî awayî li paş dihêlin? Ev derûnîya nexuya ye ku piştî xirabîyên xofane, kuştî û kujer par ve dikin.


Ji peymana aştîyê bi şûn ve pênc sal kurtedemek e ku di vê demê de careke din mirov biceribîne di jiyanekê de cî bigire ku ev beramberî 22 salên jiyaneke bê zemînê mirovahîyê ye. Şansê dahatûyê ev e: Jibîrkirina şer. Li gor pêşniyazên navnetewî ji bo çareserîya pirsgirêkê û ewlekarîya aştîyê helwêsta mirovan êdî teqez e: li ser tiştên derbasbûyî fikirîn bes e, berepêşnêrîn û avakirin gerek in. Berî hertiştî li cem kesên ji 40 salî mezintir ji çavan nareve ku tiştê hişk niqutiye nav serpêhatîyên derûnî û bedenî. Bi tenê ji bo ciwanan pergela dîrokê ber bi alîyê din ve vegeriyaye. Lê ew jî li hember pirsên bingehîn in: Berê me bi kuderê ve ye? Çiqas dem ji me re pêwîst e ji bo vê yekê? Em ê çawa karibin bizanin ku em li ser rêya rast in?

Şofêrê ciwan yê pîkapa me di zaroktiya xwe de ji baregeha leşkerî ya Artêşa Berxwedanê ya Lordan (Lord´s Resistance Army-LRA) ya ku li ser sînorê Ugandayê operasyon kiriye, revîyaye û piştî du mehan gihîştiye kampa penaberan. Ew serborên xwe yên xirab bi peyvên hêrs vedigêre."Hunê bibînin", dibêje û giş giranîya bedenê xwe dide ser vê mizgînîyê "piştî referandûmê dê hemû bên û alîkarîyê bikin." Tiştên pêwendîya wan bi elaqedarîya polîtîk û aborî ya navnetewî hene, bi beşa peyva xwe ya yekem heqê wî heye. Ji bo beşa duyem pêşbînî tuneye.

* Rojnamevan û nivîskar

Teksta arşîvê ji 14.01.2011,
Le Monde diplomatique (almanî)

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal



FEWZÎ BILGE: **Montaj II**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 30 x 30 cm



Hezîran 1979

# Bêîstîqrarkirina dewletan û jihevveqetandina gelan li cem bîrên petrolê

AHMAD FAROUGHY

**Li Îranê, desthilata îslamî li hemberî meylên xweserîyê**

Weke li Afxanîstan û Pakîstanê, meylên xweserîyê li Îranê jî xurt in. Lê belê, ew di dîrokê re li dijî îradeya navendîbûnê ya desthilata împaratorî bi bin ketin. Komara îslamî ya îmamê Xomeynî li hemberî daxwazên nijadên ne faris xwedana boçûneke bi heman rengî ye. Jixwe, pirsa pêşî ev e ka, ji bo têkbirina hêzên santrîfuj yên ku bi hin kesan, dij-şoreşî ne û wan piştgirên biyan jî hene, serokê şoreşa îslamî wê mecbûr bibe ji makîneya leşkerî alîkarîyê bixwaze an na.

Îran ji etnîsîteyên cur bi cur pêk tê. Li rojava pênc milyon kurd hene; li bakurê-rojava, li bakurê-rojhilat û li başûrê-rojava çardeh milyon tirk; li rojhilat û başûrê-rohilat milyonek belûc; li başûrê-rojava bêhtir ji milyonekê ereb û li nav welêt jî, nêzî panzdeh milyonan faris bi cih dibin. Ji ber vê yekê, komên ku xwedêgiravî "mînorîte" ne, bi rastî piranîya nifûsa îranî pêk tînin: li hemberî panzdeh milyon faris bîst û yek milyon nefaris hene (1).

Her etnîsîteyek bi zimanekî -an zaravayekî- xweser jî diaxive. Soranî û kurmancî li cem kurdan; oxuzî, qaşqarî li ba tirkan; vandîdatî û peştû li nik belûcan; erebî li rex ereban; farsî li cem bextiyarîyan, loran, hwd. (2)

Ji bilî zimanên wan, ev etnîsîte jî xwedanên çandên taybet in, ku li gor birêxistina siyasî û civakî ya komên -an jî komikên- ku heyîna wan pêk tînin, diguherin. Li cem kurdan, tirkan, belûcan, ereban û farisan jî, eşîretên koçer, şênîyên xwecihî û malbatên ticarî û bajarî yên kevin jî hene.

Wekî din, ev etnîsîte misilman in, lê belê hemû ne şîî ne. Piranîya kurdên Îranê û tevahîya tirkmen, belûc û ereban sunî ne.

Encama vê rewşê jî ev e ku desthilata siyasî ya îranî, daîmî bi têkilîyên navbera van etnîsîteyên cihê ve girêdayî bû. Çawanîya van têkilîyan bixwe, tevna dewleta îranî saz dike; yekîtîya federal an jî desthilata navendî? Di vî warî de -weke di gelek warên din de jî- tevna Komara Xomeynî jî ya împaratorîya Pehlewîyan pir ne cuda ye.

Di 1925ê de dema ku, bi hevkarîya brîtanîyan, Reza Pehlewî binemala xwe ava dike, ew jî wî teşwîq dikin ku hemû îqtîdara xwe di makîneyeke dewletê ya xwedan hemû quwetan de kom bike, ku ew ê jixwe di bin fermandarîya bilind a hêzên çekdar de be (3). Makîneya hikûmeta împaratorîya pehlewî ji wê demê ve bûye weke beşeke îdarî ya artêşa împaratorî, zêdeyîyeke sîvîl a desthilata leşkerî.

Encama leşkerkirina dewletê ya Reza Pehlewî, navendîbûneke siyasî ya zalimane bû. Etnîsîteyên cihê yên deverên gundî û eşîretî jî, ku heta tacîdarkirina Pehlewîyê yekem xwedan piçek xweserîyeke ji textê desthilatdarîyê bûn, di warê leşkerî, îdarî û çandî de hatin perçiqandin.

...

**Leşkerparêzî û zalimî**

Sala 1925ê, piştî perçiqandina serîhildana kurdên Tirkîyeyê, bi dehan hezar kurd tên li Îranê pênaber dibin. Lê belê, kurdên Tirkîyeyê li herêma çiyayê Agirîyê -ku cîrana Ermenîstana Sovyet û Îranê ye- ji nû ve serî hildidin. Bi hincêta "lawazkirina Tirkîyeya kemalîst", Reza Pehlewî alikarîyê dide serîhildêran, lê ev bi rastî rê dide wî ku têkeve nava wan û serîhildana kurdan a li Îranê, di bin serokatîya Îsmaîl Axa de - ku bi navê Simko navdar e- pûç bike.

Lê belê, li bihara 1930ê, piştî ku serîhildana kurdan li Îranê jî ji hev belav bû, Reza Pehlewî alîkarîya xwe ji ser kurdên Tirkîyeyê qut dike û destûra têketina erdê îranî dide hêzên Mistefa Kemal, da ku ew dorê li serhildêran bigrin (4). Li destpêka havînê, Simko di dema muzakereyên digel leşkerên îranî de bi awayekî bêbextane tê kuştin û payîzê jî, serîhildana kurd li her du alîyên sînorî tê perçiqandin. Ji bilî rabûneke kurt a li 1931ê, Kurdistana Îranê heta ketina Reza Pehlewî, di bin nîrê desthilata navendî de ma.

Li vê zalimîya leşkerî, zordarîyeke îdarî û çandî jî zêde dibe, ku encamên wê heta roja îro jî pir giran in.

...

**Du komarên zû hilweşiyayî**

Li îlona 1941ê, hêzên îngilîzî û sovyetî Îran dagîr kir da ku dawîyê li zêdebûna elmanparêzîya Reza Pehlewî bînin, ew daxistin û li ser pêşniyaza Brîtanya Mezin, kurê wî Mihemed Reza li ser textê desthilatê rûnişt.Tevî lawazîya leşkerî ya desthilata navendî, artêşên hevkar li hember meylên xweseriyê radiwestin û yekîtiya erdî diparêzin.

Lê belê, piştî dawîya şerî, YKSS peymanên Yaltayê bin pê dike û devera ku leşkerên wê dagîr dikin -Kurdistan û Azerbaycan jî di nav de- ji bloka rojavayî qut dike. Ji bo vê yekê, Moskova bi dizî dikeve nav tevgerên xweserîparêz ên van herêman da ku ji meylên wan ên xweserîyê sûdê wergire.

...

Di tebaxa 1945ê de, Partîya Demokrat a Kurdistanê (PDK) tê damezrandin û Komala, partîya netewparêz a kurd, ku du salan beriya wê ava bûbû. Qazî Mihemed -qazîyê Mehabadê- serokê PDKê ye û Moskova jî piştgirîyeke bê şert û merc didiyê.

Di nav heşt noqteyên programa PDKê de, daxwazên weke xweserîya ji bo gelê kurd li nav sînorên Îranê, naskirina zimanê kurdî weke zimanê fermî yê vî erdî û hilbijartina desteyên qezayan ji bo birêvebirina kar û barên civakî û îdarî yên Kurdistanê, hene.

Di îlona 1945ê de, li Azerbaycana tirk, Partîya Demokrat a Azerbaycanê (PDA) jî ava dibe û li vê eyaletê cihê partîya Tûdeh (komunîst û pro-sovyetî) digire. Cafar Pîşevarî, yek ji damezirênerên partîya komunîst a îranî, sala 1919ê, dibe serokê PDAyê. Programa wî bi heman rengê programa PDKê ye. Ew di çarçoveya Îranê de xweserîya azerbaycanîyan, fermîkirina zimanê tirkî li Azerbaycanê û birêvebirina kar û barên civakî û îdarî ji hêla gelê herêmê ve dixwaze.

Di îlona 1945ê de, di bin parastina hêzên sovyetî de, Kurdistan û Azerbaycan xwe weke komarên demokratîk û serbixwe îlan dikin, ku paytextên wan Mehabad û Tebrîz in û serokkomarên wan jî Qazî Mihemed û Cafar Pîşevarî ne. Lê belê, bi pey muzakereyên dûr û dirêj digel hikûmeta Tehranê- bi piştgirîya xurt a Waşington û Londonê jî-, Artêşa Sor, gulana 1946ê ji bakurê-rojavayê Îranê vedikişe û kurd û azerbaycanîyan bi tenê dihêle. Di kanûna heman salê de, artêşa şahî bêyî şerê mezin dikeve Mehabad û Tabrîzê. Qazî Mihemed û wekîlên wî tên bi dar de kirin û Cafar Pîşevarî digel alîgirên xwe direve YKSSê. Her du komar jî, tam salekê li ser piyan man.

Weha xuya dibe ku sedemên bingehîn ên hilweşîna wan, tunebûna piştgiriyeke rasteqîn a Yekîtîya Sovyetan bû, ku damezrandina van komaran teşwîq kir, ew bi kar anîn û paşê dev ji wan berda; her weke neyekbûna kurdan jî -ew ji hikûmetê bêhtir sondxwarên serokeşîr û serokên dînî bûn- û nerazîbûna gelê ticarên bazarê û xwedanên erdî ya li hemberî Pîşevarî (5).

Ji dema dîsa bidestxistina herêmên cudaxwaz ve, desthilata navendî zordarîyeke leşkerî, îdarî û çandî li wan kir, ku vê yekê heta hilweşîna xanedanîya pehlewîyan dewam kir.

Piranîya çalakvanên PDKê tên kuştin an girtin. Kurdistan bi ser çar eyaletan dabeş dibe: herêma bakurê-rojhilat bi Azerbaycana rojavayî ve tê girêdan, ya başûr bi eyaletên Kirmanşan û Îlamê ve û bi tenê herêma naverast a Senendecê (Sine) bi navê resmî yê Kurdistanê tê nasîn. Wekî din, li tevahîya herêmê hêzên artêşa împaratorî zêde dibin û çûn û hatinên gelî jî di bin çavdêrîya rayedarên leşkerî de ne. Careke din, farisî weke zimanê fermî yê tenê li ser gelê herêmê tê ferz kirin. Heman siyaset li Azerbaycanê tê meşandin: herêm li çar eyaletan dabeş dibe: rojava û rojhilat, beşeke herêmê jî bi eyaleta Zanjanê û yeke din bi ya Gîlanê ve tên girêdan. Liv û tevgerên xelkî tenê bi destûra hêzên ewlekarîyê çêdibin û zimanê tirkî tê qedexe kirin.

Wekî din, polîsê siyasî û hêzên polîs, her weke beşeke mezin a îdareya Azerbaycana rojavayî, ji kurdan re tê veqetandin û ya Kurdistanê ji tirkan re. Bi vî awayî, desthilat dixwaze miletan parçe bike û pevçûnên etnîk gur bike. Ev siyaset jixwe li tevahîya welêt tê bi cih kirin, ku li bîst û sê eyalet, sed û şêst û yek qeza û çar sed û şest û pênc komunan jî bi leva bû; her yek ji wan di bin çavdêrîya leşkeran û zordarîya desthilata navendî ya împaratoriya pehlewî de. Ev dabeşbûna îdarî ya Îranê îro hîn didome.

**Xirecira etnîsîteyên ne faris**

...

Di adara 1979ê de, Partîya Demokrat a Kurdistanê ji sî û sê salên çalakîyên îllegal, di bin serokatîya Ebdurehman Qasimlo de -zanistekî ku di dema sirgûnê de, li zanîngeha Pragê mamoste bû- derdikeve. Programa PDKê her ya damezirandinê ya 1945ê ye. Daxwazên wê ji hikûmeta îmamî bi vî rengî ne: dîsa yekkirina gelê kurd ê Îranê -bi wateya dawîlêanîna parçebûna Kurdistanê li ser çar eyaletan-, xweserîya îdarî û civakî li nav sînorên Îranê û naskirina zimanê kurdî weke zimanê fermî. Rêxistinên çepa tundrew ên kurd jî, nemaze Komala (maoîst) û gerîlayên Fedayîyên Xelk (marksîst-lenînîst) û di bin serokatîya Şêx Ezedîn Huseynî de serokê dînî û sunî yên herî bi bandor li Kurdistana Iranê, piştgirîyê didin van daxwazan.

Herçî li Azerbaycanê, hevsengîya hêzên siyasî ku piştî hilweşîna şahî li 1979ê di nava muxalefetê de heyî, ne heman hevsengîyê ye ku di dema teslîmbûna artêşa împaratorî ya li hemberî hêzên hevkar ya 1941ê de hebû. Wê demê, tevgera dijberîya azerbaycanî li hember dîktatorîya Pehlewî pir çepgir bû; lê niha, tevgerên îslamî û liberal, di bin serokatîya ayetullah Şerîat Madarî de -serokê dînî yê Tirkên şîî- piranî ne.

...

Di heman demê de erebên sunî yên Xuzistanê (eyaleta petrolî ya başûr-rojava) bi dengê berdevkê xwe, Şêx Xaganî, daxwazên xwe ji îqtîdara îslamî ya Tehranê re pêşkêş dikin. Ev erebên ku bi piranî ne xwenda ne, xebatkarên ne bispor ên pîşesazîya nefta Îranê ne. Tevî ku karkerên faris xwedanên meaş û feydeyên civakî yên pir mezin in, xebatkarên ereb bi tenê ji bo îşên sivik tên xebitandin. Ew ji hikûmeta navendî dawîlêanîna cihêkarîya li ser bazara xebatê, feydeyiya mafên siyasî bi qasî yên farisan, mafê hilbijartina walîyên wan û fermîkirina zimanê erebî dixwazin. Bi gotineke din, rêxistinên siyasî yên li dor Şêx Xaganî kombûyî ji îmam dixwazin ku ew statuyeke xweserîyê bide Xuzistanê, ku % 60ê nifûsa wê ereb e.

**Alîkarîya artêşê yan yekîtîyeke federal?**

Îmam jî van meylên xweserîyê yên li çar hêlên Îranê red dike. Ev ji ber îdeolojîya wî ya siyasî ye, ku têgiha neteweyê înkar dike û têgiha ummayê (civata bawermendan) ya bê sînor li şûna wê datîne. Bi tenê "gelê misilman", blokeke yekreng a di bin qanûnên îslamê de, tê hesibandin. Lewre jî, armanca îmam ev e ku bigihîje *"yekîtiya welatê îslamî ku emperyalîzm û suîkastên hikumdar û siyasetmedarên desthilatxwaz ew şikand û li ser neteweyên cuda dabeş kir"*. (6) Ji ber ku ew di vê civatê de hebûna neteweyan red dike, îmam nikare xweserîya siyasî, daxwaza etnîsîteyên ne faris, qebûl bike. Xwestekên wan weke "dij-îslamî" û parçeyek ji *"suîkasta emperyalist a ji bo dabeşkirina civata bawermendan"* tên dîtin.

Ji ber vê yekê, îmam ji daxwazên xweserîyê ditirse: ma gelo komarên kurd û azerbaycanî yên 1946ê ne karê Sovyetan bû? Di nav xwe de jî alîgirên îmam hin hêzên biyanî ên bi elemanên "dij-şoreşê" ve girêdayî bi daxwazên lawazkirina Komara Îslamî û "balkanîzekirina" Îranê gunehbar dikin. Şikê jê dikin ku Iraq pere û çekan dide xweserîparêzên ereb, YKSS jî li Kurdistan û Belûcistanê û DYA li Azerbaycanê karên ne diyar dikin.

Wekî din, felsefeya siyasî ya îmam jî ev e ku divê hikûmeta civata îslamî pir navendî be û îqtîdara bicihanînê li navendeke tenê ya biryardayînê bê bi cih kirin. (7) Ji bo îmam, wezîfeya hikûmetê "pêkanîna fermanên Xwedê, yên ku divê li ser hemûyan û li ser dewleta îslamî jî ferz bibin" e. Di warê siyasî de, ev tê wateya dewleteke navendger û "dijmina hemû dabeşbûnan".

Îmam bi tenê dibêje ku ew ê, ji bo herêmên kenarên Îranê, hin gavên "xwebirêvebirina" îdarî biavêje li ser tiştên weke hilbijartinên muxtarî û kantonî ji bo destnîşankirina desteyên herêmî yên berpirsên plankirinê û aborîya gundî, birêvebirina budceyê, tenduristîyê û çêkirina riyan. Hemû tiştên din -bacên dîrek û îndîrek, fînans, siyaseta derve, bazirganîya derve, parastina neteweyî, radyo-televîzyon, ragihandin, transport, plankirina endustrîyel û polîsê herêmî- dikeve ser milê hikûmeta navendî. Destûr ji bo fêrkirina zimanên herêmî hat dayîn, lê divê ders bi zimanê farisî, zimanê fermî yê tenê li Komarê, bên dayîn.

Li dijî xweserîparêzên ku xwestekên îqtîdara nû red dikin, îmam Xumeynî weke şahên pehlewî tev digere, ku wî bixwe bê navber kiryarên wan ên zalimane rexne kirin: ew leşkeran dişîne da ku pişta serîhildêran bişkînin. Lê belê, vê carê artêş tuneye û ew xwe dispêre pasdaran, yanî

www.arsivakurd.org



Tîrmeh 1979

mîlîsên xumeynîparêz, da ku cihê hikumdarîya desthilata navendî ji nû ve xweş bikin.

Şerekî îlannekirî, digel seferên leşkerî, serîhildan û grevan, herêmên kenarên Îranê dihejîne, mîlîs û xweserîparêzên kurd, tirk, tirkmen, belûc û ereb jî di pevçûnên aloz de şerê hev dikin.

Encama vî şerî hê jî diyar nîne, lê em dikarin nîşan bidin ku, li vê sedsalê, meylên xweserîyê yên etnîsîteyên îranî bi tenê di dema lawazbûna makîneya leşkerî ya hikûmeta navendî de bûn rastî: di bin keyatîya Qacarê dawî de, piştî têkçûna artêşa împaratorîyê di 1941ê de û di hilweşîna wê ya 1979ê de. Berevajî wê, artêşa îranî her demî bi seferên li dijî hêzên hundir xurt bû û wê hikumdarîya Tehranê li ser wan ferz dikir. Em weha dibînin ku li Îranê, xweserîya herêmî û bêleşkerkirina îqtîdara navendî bi hev re tên; Hêza mutleq a îqtîdarê encama wê ye ku siyaseta hikûmetê serdestiya eskerîyê/makîneya leşkerî qebûl dike. Wisa jî, tevna împaratorîya pehlewîyan ji ber navendîbûneke zêde -encama mîlîtarîzekirina dewletê- taybet bû; îro jî, dibe ku welat bi diyardeyeke berevajî bigihîje heman encamê. Lewre ku ji bo ferzkirina têgiha xwe ya dewleteke navendîparêz, îmam mecbûr e ku hêzê bi kar bîne û rola makîneya leşkerî di nav desthilatê de zêde bike. Eger Komara Îslamî daxwazên xweserîparêzan red dike û naxwaze di şerî de têk biçe jî, ew hewceyî artêşa xwe ye, ya ku ji bo bicihkirina hikumdarîya wê ya li ser tevahîya neteweyê, îmkana dawî ye.

Yekîtîya federal, yan jî bi leşkeran re parvekirina desthilatê?

1 Ji bilî etnîsîteyên misilman, divê hebûna du sed hezar ermenî û heştê hezar cihû jî bê diyar kirin, lê ew ne xwedî erdeke xwecihî ne û piranîya wan li paytêxt dijîn

2 Têbinîya wergêr: Bextiyarî jixwe beşeke Loran in. Berevajî gotina nivîskarê gotarê, Lor bi farisî naaxivin lê zimanekî wan heye, ku navê wî jî lorî ye. Ev ziman di malbata zimanên îranî yên bakur-rojavayî de (wek kurdî, belûcî, hwd.) cih digire

3 Divê bê bi bîr xistin ku jixwe, Reza Pehlewî efserê pîşeyî bû û ew berî ku li ser textê desthilatê rûne, makîneya leşkerî xist bin destê xwe; ew li pey hev bûbû fermandarê lîwaya kazakên faris û wezîrê şerî yê Siltanê Ahmed Şah, şahê dawî yê binemala Qacaran

4 Ev rewş dê piştre bi qanûnê jî bê peyitandin; sala 1932yê, Tehran û Enqere peymaneke sînorî îmze dikin; Îran parçeyekî ji erdê Îranê ya li dora çiyayê Agirîyê ji Tirkiyeyê re dihêle û deverên din ên herêma Wanê jî jê distîne. Mebesta tikû tenê ya vê peymanê ew e ku kontrola leşkerî ya tirkî-îranî li ser Kurdistanê bi pêş keve

5 Li ser Komara Mehabadê, berhemek bi tenê weşîya: Eagleton, Jr. William, *The Kurdish Republic of 1946 [Komara Kurd a 1946ê]*, Oxford University Press, 1963. Bi qasî ku em dizanin, tu berhem li ser Komara Demokratîk a Azerbaycanê çap nebûne

6 Binihêrin: Hukumatê-Eslamî [Hikûmeta îslamî], r. 41. Ev berhem bi farisî ye û transkrîpsiyona dersên ÎmamXomeynî yên dema nefîya wî ya li Iraqê ye. Ew li Necefa Iraqê, di sala 1971ê de weşiya

7 Ayetullahê Şerîat Madarî, li ser têketina dîrekt a îslamê bo nav siyasetê û têwerdana makîneya dînî di birêvebirina kar û barên dewletê de jî, li hemberî îmam derdikeve. Nakokîyên dema niha li ser vê esasê jî peyda dibin

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Arşîva bîra Kurdan

Du nivîsên hêja: yek ji alîyê Xanima Ana-Helena Krulich-Ghassemlou ku xanima Birêz Evdilrehman Qasimloyê nemir, Serokê PDK-Îranê ye, hatiye nivîsandin. Nivîsa din jî ji aliyê Ahmad Faroughy ku nivîskarekî Îranî ye hatiye nivîsandin. Nivîsa Krulich-Ghassemlou li ser têkoşîna kurdên Îranê ye: Partiya Demokrata Kurdistan-Îran hewl dide ku pirsa kurd di çarçoveya sîstemeke federal ya demokrtîk de bê çareser kirin. Îran li dijî federalîzmê ye û peyva "demokratîk" li gor Îranê rast nabîne, daxwazên aliyê kurd red, hêzên kurd jî bi cudaxwaziyê tewanbar dike, welew ku PDK daxwaza cudaxwaziyê nake û dixwaze artêş jî bi hikumeta navendî re girêdayî bimîne. Îran ne tenê guh nade daxwaza kurdan herweha tirkên şîî jî li dijî têkoşîna wan bi kar tîne, bi vê yekê ve gelek komkujî pêk tên.
Piştî têkçûna Şah jî hewldana PDK ew bû ku yekîtiya hêzên demokratîk pêk bîne lê ji ber nebûna hêz û tecrubeyên demokratîk li Îranê ev yek pêk nehat, kurd dîsa jî ketin ber şer û qirkirineke dûredirêj ku di encamê de zêde komkujî çêbûn. Xomeynî xwe mîna dîndar ne siyasetmedar diyar dikir lê dîsa jî li hember etnîsîteyên li Îranê, bi taybetî li dijî hêzên kurd û gelê kurd siyaseteke kujeriyê dimeşand û siyaseteke tundrevî bi kar dianî.

Nivîsa Ahmad Faroughy li ser pirsgirêkên etnîkî yên Îranê ye. Faroughy, meseleyê ji destpêka sedsala 21ê ve digire dest û li ser hin beşên bingehîn kûr dibe: Her etnîsîte li Îranê xwediyê çand, zarav û ziman e, lê ev yek ji aliyê siyaseta dewletê ve tu caran bi awayekî bingehîn nehatiye pejirandin. Herçend hejmara Farisan ji yên din ne zêdetir be jî, hikumdarî hertim di destê wan de bûye û hewl dane pirsgirêkên gelên din bi darê zorê çareser bikin.
Ji destpêka hatina Şah Riza Pehlewî a ser hikum û vir ve bersiva têkoşîn û daxwazên etnîsîteyên din hertim perçiqandin û tunekirin bûye. Şahê Îranê bi dek û dolaban gelên li Îranê berdide ser hev û nîfaq ji nav kurd, azerî, belûc, faris kêm nake daku ew xurt û bi hev re nebin. Bi ser de jî siyaseta cîhanê tiliya xwe ji nav Îranê kêm nekiriye û carna alîkarî daye hin hêzan li dijî yên din, lê di dawî de weke li Mehabad û Tebrîzê alîkariyên xwe qut kirine û bûne sedema rûxandina Komara Mehabad ya Kurdistan û Komara Demokratîk ya Azarbaycanê. Hêzên Yekîtiya Sovyet dibin sedema têkçûna van her du komaran.
Faroughy, dûredirêj vê rewşa lîstîkane û bêbextane ya siyaseta Îranê bi çavkaniyan radixîne ber çavan.

LMd kurdî

### Têkoşîna Kurdên Îranê

# PDKÎ çareserîyeke federal dixwaze

Ana-Helena Krulich-Ghassemlou

Di belgeyeke Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê de, ku di 28ê adara 1979ê de ji îmam Xumeynî re hatibû pêşkêş kirin, weha hatîye gotin: *"Gelê me ji bo du armancên sereke şer kir: têkbirina dîktatorîyê û bicihkirina rejîmeke mirovane, ya ku seranserê Îranê ji mafên azadîyên siyasî û herweha yên civakî re rêz digire û di çarçoveya sînorên Îraneke azad de ji bo hemû gelan, bi dirûvê xweserîyê an jî federasyonê, bidestxistina mafên neteweyî. (...) Çawa ku li Îranê pir gelên bindest hene, pergaleke federal dikare weke formula herî baş were qebûlkirin."*

Li kêleka etnîsîteyên din (azerî, ereb, belûcî, turkmen û hwd.), li Îranê nêzîkî şeş mîlyon kurd hene. Salekê piştî damezrandina PDKÎ, di sala 1945ê de, bûyerek qewimî. Komara kurd ya Mahabadê hate damezrandin û ev yek bi alîkarîya hêzên Sovyetê, yên ku Îranê dagîr kiribûn, pêk hat. Heman komar ji alîyê Îranê ve, bi alîkarîya îngilîzan, hate pelçiqandin. Di sala 1967ê de serîhildaneke dorfireh hat dest pê kirin û 18 mehan domand. Hêzên gerîla ji alîyê hêzên leşkerî ên Îranê û herweha ji alîyê hêzên kurdên barzanî ve hatin dorpêç kirin. Pir mîlitanên PDKÎ ji alîyê hêzên barzanî ve hatin girtin û ji polîsê îranê re hatin pêşkeş kirin. Herweha, mînak, Suleyman Muînî, yek ji endamên komîteya navendî ya PDKÎ bû, bi fermana Barzanî hate kuştin û di sala 1968ê de, laşê wî ji Îranê re hat pêşkêş kirin. Laşê wî ji alîyê Îranê ve da ku çavên gel bitirsînin û ew dev ji serîhildanên li dijî rejîma Şah berdin, hate teqandin.

Ji ber sedemê serîhildanê, Kurdistana Îranê ji hemû parçeyên din zêdetir zordarîyê dibîne, zordarîya rejîma monarşîk. Îran welatekî paşvemayî ye, lê belê herêmên Kurdistanê, di nav hemû herêmên din yên Îranê de, zêdetir xizan mane. Mînak, di sala 1975ê de, hatinîya giştî ya Îranê, ji bo kesekê, 1340 dolar bû, lê ev rêje li Kurdistanê tenê 150 dolar bû. PDKÎ dixwaze mafê hemû etnîsîteyan, di nav sînorên welat de, bi riya rêxistinên demokratîk were bi dest xistin. Bi riya wê belgeya ku ji îmam Xumeynî re hatibû pêşnîyar kirin, gelê kurd dixwaze otorîteyekê bi dest bixe, bi riya wê, di nav sînorên welat de, jîyana xwe tenzîm bike. Kurdistana xweser, hemû bajarên ku kurd lê dijîn, digire nav xwe. Lê belê, ji ber ku ev were bi cih kirin, divê hemû şertên dîrokî, cografî û aborî, herweha daxwaza gel, li ber çavan werin girtin.

Ew hîn îsrar dike: "Xweserî û pergaleke federal li dijî yekîtî û tevahîya sînorên Îranê nîne".

PDKÎ pêşniyar dike ku, artêş di bin emrê hikûmeta navendî de bimîne, lê belê divê otorîteya herêmên xweser li ser hêzên polîs û cendermeyan hebe. Herweha, pêwîst e xebatên bi karê derve ve girêdayî, parastina welêt, bankaya navendî û projeyên demdirêj jî di bin kontrola hikûmeta navendî de bin. Îmam Xumeynî carekê jî bersiv neda van daxwazên PDKÎ, lê belê, kurd her tim bi cudaxwazîyê hatin tawanbar kirin. Daxwazên kurdan weke xalên maksîmalîst hatin pejirandin û li dijî wan hatin bi kar anîn.

Tansîyon pir bilind e, şerê ku di meha nîsana bihurî de li Nexedeyê qewimî jî heman rastîyê xuya dike. Di nav du mehan de, Ayetullah Hassanî, yê li Nexedeyê çek li tirkên şiî belav kiribûn da ku ew li dijî kurdên sûnnî şer bikin. Her ku diçe, zordarîya li dijî kurdan, bi taybetî li dijî endamên PDKÎ zêde dibe. Ayetullah Hassanî ji hikûmetê daxwaz kirîye ku ew artêşê bişîne herêmê da ku dawî li komkujîyan bê anîn. Dema ku artêş çû herêmê, wê dest bi alîkarîya tirkan kir. Wê demê kurd neçar man ku bi çekên xwe, xwe biparêzin. Heman şer di bajarên din de jî qewimî. Ji reftara li hember kurdan, baş xuya bû ku fanatîzma olî nikare ji wan re bibe hacet ku ew rola xwe ya esasî bileyîzin. Ji alîyê din, piştî têkçûna Şah, PDKÎ xemgînîya xwe diyar kiribû ku ew ê nikaribin, di çarçoveya komarê de ji pirsgirêkan re çareserîyê bibînin. PDKÎ hewl dabû ku ew xetekê di navbera neteweparêzîya kurd û şovenîzma pers de bikişîne, wê daxwaz dikir ku, di navbera hêzên pêşverû de yekîtîyek çêbibe. Ev karekî zehmet bû, ji ber ku ji bilî dema [Dr. Muhemed] Mûsediq, li vî welatî tu tecrubeyeke demokratîk çênebûye.


Dema ku kurd daxwaza "komareke demokratîk ji bo Îranê, otonomî ji bo Kurdistanê" tînin ziman, lîderên olî vê yekê qebûl nakin û dibêjin ku gotina "demokratîk" li gor civaka Îranê nîne. Der barê xweserîya di çarçoveya pergaleke federal de jî, ew zêde bi dil nînin.

Herweha, di nav şeş mehên bihurî de, Ayetullah Muntezarî soz dabû ku wê etnîsîte "bibin xwedîyên heman mafan, da ku qedera xwe ya hevbeş diyar bikin". Ayetullah Taleqanî jî, ji bo kurdan mafê "diyarkirina paşeroja xwe" nas kiribû û der barê "naskirina xweserîyeke dorfireh ji bo etnîsîteyan" de bi erênî axivîbû. Vî kesî, bi alîkarîya hevalbendên xwe, der barê karê laîk û yên dewletê de, bi awayekî tund rexne li Ayetullah Xumeynî girtibûn. Dê were zanîn ku, berî vegera xwe, Ayetullah Xumeynî xuya kiribû ku ew kesekî olî ye, siyasetmedar nîne. Lê belê, serokwezîr Bazargan, piştî îqnakirina heyeta kurdan, anî ziman ku wê daxwazên heman delegasyonê "werin pejirandin". Lê belê, daxuyanîyên wî tenê di nav sînorên gelperest de man. Ji alîyê din, birêz Sencabî kurd ji xwe re kirin çekek da ku li dijî "gefên ku ji bo yekîtîya neteweyî xeter in" bi kar bîne.

Di alîyê din de, îmam Xumeynî bang li alîgirên xwe kir ku ew derdorên li dijî şoreşê "bipelçiqînin". Herweha, wî girseyên gel kirin wek dîwarê parastina şoreşê û ferman da, ku ew hemû hêzên dijber bipelçiqînin. Xumeynî hemû derdorên dijber weke hêzên biyanî tawanbar kir û bala girseyan kişand ser wan. Piştî ku wî *"siyasetmedar, rojnamevan, nivîskar û yên din weke derdorên dijî Xwedê"* da nasîn, dest pê kir girseyên gel bi ser wan de bibe û wan bide pelçiqandin. Ev gefa wî ya li dijî hemû derdorên ku daxwaza komareke demokratîk dikin, hat pejirandin. Li gor Ayetullah Saldarî, "Komara Îslamî hewl dide ku dîwarê herî mezin li dijî piranîya sunîyên Kurdistanê ava bike".

PDKÎ dizane ku, eger ew daxwaza yekîtîya kurdên Iraqê, yên Sûrîyeyê û yên Tirkîyeyê bike, wê Rojhilatê Navîn bikeve nav rewşeke bêîstiqrar. Damezirandina Kurdistaneke serbixwe di Peymana Sewrê de hatibû pejirandin (1920), heman peyman ji alîyê Mustafa Kemal ve, bi riya Yewnanistanê hat pûç kirin. Peymana Lozanê (1923) qedera bîst mîlyon kurdan nedît û ew di nav çar welatan de parçe kir. Ne bi tenê kurd daxwaza rêzgirtina mafên xwe ên neteweyî dikin. Lewra, li gor PDKÎ çareserîya pirsgirêka kurdên Îranê û herweha yên din, di nav sînorên federasyona komarên xweser de bi cih tê.

Wergera ji fransî: Ahmet Dere



Fewzî Bîlge: **Şer**, Boyaxa rûnî li ser muqawa, bi spatûla, 40 x 60 cm

TÛNIS

# Çirûska pêşî: Mihemed Bouazîzî


OLIVIER PIOT *

Herçende ew bû çirûska pêşî jî, jesta dilsoj a Mohamed Bouazîzî yê bîst û şeş salî, ku 17ê meha bihurî li bajaroka herêma navîn a Tûnisê, Sîsî Bouzîdê xwe şewitand, ne çalakîya pêşî ya xweşewitandinê ye. Di 2010ê de, du ciwanên din jî heman tişt kir: roja 3ê adarê, li perava bajarê Monastirê û roja 20ê mijdarê li bajarê başûr-rojavayê Metlaouiyê. Bi taybetî, lêkolîneke li ser şewatên mezin ên li nexweşxaneyeke Tûnisê, ku ji alîyê malpereke Înternetê (1) ve di dawîya kanûna 2010ê de hat belav kirin, dide zanîn ku rêjeya kesên *"bi agir întixar kirine % 15,1ê nexweşan"* bûye. Kesên ku vê pratîkê weke *"şideteke awarte"* dinirxînin, herweha dibêjin *"ev li dijî şidetê, bi taybetî jî li bajarê Tûnisa Mezin û li dorbajarên xizan (bajarên weke Ettadhamen û Ibn Khaldoun) û herêma bakur-rojava (derdorên gundewar) dibe awayekî bersiva ciwanan "*. Lêkolîn heta sala 1998ê dide ber xwe.

Zordestî, seferberî, tepisandin: xelekeke klasîk e. Lê belê kîjan şert û mercên taybet kirin ku xelkê Tûnisê bi ser keve?

Ev tê vê wateyê ku rewşa Bouazîzî ji nav rêzeke çalakîyên kesên bêhêvî bi tenê yek e. Lê belê bûyera wî wê weke ya herî girîng di hişan de bimîne. Mohamed Khemili yê şêst salî, perwerdekarê xanenişîn, endamê Efûya Navneteweyî û mîlîtanê dijberîya tûnisî dibêje, *"Ev ciwan ji eşîreke qedîm tê û eşîra wî li hêla başûr a herêmê ye. Navê wî ji gotina azîz a ku tê wateya* "serbilind" *zêde bûye."* Mîratgirê dîrokeke dirêj a Tûnisê, hê berî hebûna fransîyan li welêt (1881-1956), ev hêza eşîran tevneke xurt a têkilîyên civakî li gelek herêman dihûne. Vê tevna eşîrî giranîya xwe da ser bûyerên li Sidi Bouzid, Kasserine û Thalayê. Li herêmên kevneşopîya bazirganîyê lê xurt e, mesela li bakur (Bizerte) û Sahelê (Sfax û Sousse), navên malbatî û xwelihevgirtinên civakî vediguherin rolên sereke yên destbiratîyên pîşeyî. Khemili bi vê bûyera nimûne behsa adetên civakî dike: *"Mihemed, piştî ku ji alîyê wezîfedarekî şaredarîyê hat sîle kirin, ji ereboka xwe ya seyarfiroşîyê jî bû. Di çanda me de, nabe ku tiştekî wisa were qebûl kirin!"* Ango ev yek dibe sedemê şkestina rûmeta wî ciwanî û rabûna hêrsa girseyî. Ji 19ê kanûnê û vir ve pevçûnên rû didin berê ciwan û polîsan li Sîdî Bouzîdê didin hev, dû re li bajarên piçûk û derûdorê: Menzel, Bouzaienne, Meknassy, Regueb, Mazzouna, Jabbes… Ji hingê ve, bûyer xelek bi xelek dibin mîna zincîrekê. Pevçûn û xirecir, şideta polîs, desteserkirinên girseyî, xwepêşandanên ji bo destekdayînê, pevçûnên nû… Heta ku serok Zeynelabidîn Bin Elî pêwist dît ku bixwe di televizyonê de destwerdana rewşê bike. Axaftina wî ya yekemîn a di 28ê kanûnê de ji alîyê bi milyonan tûnisîyan ve hat dîtin, lê belê ji alîyê medyaya navneteweyî ve nehat dayîn –ji bilî kanala El Cezîre, ya ku ji 24ê kanûnê ve bûyeran kêlî bi kêlî dide.

Bi helwêsteke darbekarekî di nav cilûbergên rengtarî de: li ser kanala TV7, Bin Elî gilî û gazinan dike, hingê ji *"bikaranîna rewşên xweser"* û behsa *"sûdwergirîya siyasî"* dike, berî ku li ber serê Bouazîzî yê li nexweşxaneyê razandî wêneyên xwe bide kişandin. Ev wêneyên propagandayê wê piştî demeke kin li dijî amadekarê xwe veguherin ser yekemîn dîmenên serîhildanê. 4ê çileya 2011ê, Bouazîzî jiyana xwe ji dest dide. Ew 5ê mehê li Gannebourê, li gel beşdarîya şeş hezar xwepêşandêrên ji hêrsa çavên wan tarî bûbûn, tê bin ax kirin. Roja din, li Metlaouiyê, zilamekî din ê sî û yek salî xwe şewitand.



FEWZÎ BILGE: **Antî dîmen**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 50 cm

### Xeyalên ciwanan têk diçin

Metlaouî. Bajarekî madenê yê xwedî pêncî hezar şênîyî, ji ber jinûvesazkirina kanên mezin ên fosfata Gafsayê, ji ber rêjeya bilind ya betalîyê şerpeze bûye (% 40 şênîyên çalak, li gor beşa navxweyî ya sendîkaya yekane, Yekîtiya Giştî ya Kar a Tûnisîyan- UGTT): hejmara kedkarên vî warî di 25 salan de ji çaran sisê heliya û daket 5 hezar kesan (2). Ev wargeha birîndar ev panzdeh sal e, bi koçberîyeke qaçax a ber bi Îtalyayê berdêleke giran dide (3). Di heman pêvajoyê de, bajarên Kasserine û Thalayê jî dikelin. Hêrsa xwecihî şûna xwe da serîhildaneke civakî ya ku ji herêmên navîn ber bi herêmên rojava yên jibîrkirî û şerpezebûyî ve berbelav dibe. Li ser Înternetê "Şaşîya 404" a navdar a sansurê xwe nîşan dide. Desthilatdarî hê jî bawer dike ku ew ê di şerê ragihandinê de bi ser keve.

Li başûrê-rojavayê welêt, Tozeur, bajarê bi ger û geştê nav daye, hê jî li derveyî serîhildanê dimîne. Herçî kanalên televizyonê ne, France 24 da ser şopa El-Cezîreyê. Ji navenda xwe ya Parîsê, pêşkeşvana wê bi erebî *"çalakîyên şidetê"* şirove dike. Di restorantoka xwe de, Yûsifê çil salî, hemû bala xwe dide ser dîmenan. Dû re dibêje: *"Pirsgirêk betalîya ciwanên xwedî dîplomayan e. Ji du birayên min ên ciwan, yekî piştî bekaloryayê 3 sal beşa ragihandin, yê din jî piştî bekaloryayê 5 sal beşa kargerî xwendin. Yê pêşî li otêleke Sousseyê xizmetkar e, yê din jî li malê ye û tu tiştî nake. Ev rewş wisa zêde nadome!"*

Betalîya ciwanên xwedî dîploma. Ev dibe havêna teqîna pêşî ya piştî çirûska li Sîdî Bouzîdê. Helbet, Bouazîzî tenê mezûnekî bekaloryayê bû. Lê belê li welatekî ku hê jî rêjeya nexwendewarîyê li hin herêmên li raserî % 50 ye, lîse jî dibe tiştekî mezin. Ji destpêka salên 1990ê ve, dewletê ji bo standina vê dîplomayê ciwan teşwîq kirin ku dû re jî derbasî pêvajoya perwerdeyên din bibin: li gor Enstîtuya Neteweyî ya Tûnisî ya Statîstîkan (INTS), di 2010ê de ji sisêyan yekê ciwanên temenê wan di navbera 19-25 de xwendekarên zanîngehê bûn. Profesorê aborîyê li Zanîngeha Tûnisê û herweha nivîskarê berhemeke nû derketî (4), Mahmûd Bin Romdxan, mijarê weha rave dike: *"Me parzûnên neqandinê li dibistanên seretayî û lîseyê rakirin. Dû re wergirtina bakaloryayê hat hêsan kirin û rêjeya bidestxistina wê hilkişiya % 25ê"*. Encam: *"Di 2010ê de, her çendî nîvê xwendekaran hê jî negihîştine asta bakaloryayê, dîsa jî ji sedî heftê wan wê payeyê bi dest dixin"*, tevî ku ev rêje di salên 1980yê de tenê ji sedî 35 bû.

Bilindkirina asta civakî bi riya perwerdeyê, serkeftina bi xebatê û nirxê: vê nihêrîna bi pîrozîyê kiraskirî ya ku ji serdema desthilatdarîya serok Habîb Bourgîba (1956-1987) dest pê kir, artêşên ciwanên xwedî dîploma hilberandin. Bin Romdxan weha dewam dike: *"Di navbera 2008 û 2010ê de, bi qasî heftê û pênc hezar xwendekarên ji dibistanên bilind mezûnbûyî her sal tên ser bazara kar, tevî ku di salên 1980yê de hejmara wan tenê heşt hezar bû.* Herçende raporên fermî pir bi pesin jê behs dikin jî, vê pêdaketinê di eslê xwe de di nava demê de astengên li ber îstîhdamê tenê taloq kirine.

Di navbera salên 2000 û 2008ê de, aborîyê rêjeya mezinbûna salane di navbera 4 û 5ê de nîşan da. Tûrîzma ku ji sedî 8 hilberîna grûz-net a hundirîn (HGH) pêk tîne –ji sedî 10 çandinî, ji sedî 54 karûbarên xizmetê û ji sedî 35 pîşesazî–, wêneyekî halxweş ê welêt çêdike. Lê belê ev halxweşî gelek ne-wekhevîyan vedişêre. Li gor lêkolîneke berî demeke nêz (5), betalîya di nav kesên temenê wan di navbera 15-29 de, sala 2008ê digihîşt ji sedî 31,2yê û ya ciwanên xwedî dîploma jî nêzîkahî rêjeya ji sedî 22 dikir (rêjeya navînî ya neteweyî ji sedî 14 bû). Nêzî çarsêyê betalan (% 72) di bin temenê 30 salî re ne… Li gor hin bisporan, ji bo ku hemû xwendekarên ji dibistanên bilind mezûnbûyî bibûna xwedî kar, diviyabû aborî ji sedî 8 mezin bibûya.

Belgeyeke têra xwe nû ya UGTTê ya ji bo walîtîya Sîdî Bouzîdê terxankirî (6) dide zanîn ku rêjeya nexwendewarîyê li wir ji sedî 60 e, tevî ku rêjeya serkeftina di bakaloryayê de digihîje nêzî ji sedî 95ê. Delegeyê herêmî yê sendîkaya Tozeur, Mohamed Alî Ghandam vê rewşê weha şirove dike: *"Me bi hêvîya ciwan û dê û bavan re serê xwe êşand. Nifşên nû yên dîploma bidestxistî dilê xwe dibijînin tiştên wêdetirî bazirganîya piçûk û kar û barên çandinîyê. Lê belê xeyalên wan têk diçin."*

### Zordarîya hovane: Havêna şoreşê

Bajarên Thala, Sbeitla, Sidi Bouzid, Regueb, Douz û hetta Kairouan ên bi bêkarîyê (bê tezmînatê) û hêvîşikandina ew hingaftin, dibin beşdarên pêşî yên serîhildanê. Ji 17ê kanûnê û vir ve artêş cara pêşî di 7ê çileyê de kete bajarê Kasserînê. Li gor bîlançoyên fermî li welêt 14 kes mirin. Lê belê Federasyona Navneteweyî ya Mafên Mirovan behsa zêdetirî bîstan dike. Bi şahidî û wêneyên bi riya tevnên civakî belavkirî, şideta polîsan zêdetir xuya dibe. Li gor hin rîwayetan jî: "segvanên taybet", ku li banên avahîyên bilind tên bi cih kirin, bi alîkarîya rêberên eskerî yên xwedî dûrbîn, armancên xwe ji nav xwepêşandêrên ciwan dineqînin.

Ev zexta hovane havêna duyemîn a şoreşê ye. Li demeke ku tûnisî bi xêra qedera ku ji bo ciwanên serîhildayî yên taxên xizan terxankirî dibe xwedî hişmendî, şoreş di 7 û 8ê çileyê de diteqe. Ev yek benzînê berdide ser agirê kîna li dijî dezgeha polîsan (sed û pêncî hezar) ên bi dehan sal in bi qebatî, sextekarî û piçûkxistina gel nav û deng dane. Khemili vê yekê weha rave dike: *"Vê carê serîhildan dikeve nav seyreke siyasî. Êdî tevahîya Tûnisê wê di nêz de serî hilde."* Erê, lê bi kîjan pêşengan?

Helbet pêşî bi ciwanan, madem ku ji sedî 40ê nifûsa welêt di bin 25 salî re ye. Betalên xwedî dîploma, helbet, lê belê herweha hemû kesên ku nekarîn bigihîjin asta bakaloryayê –ji 4 milyon kesên di bin temenê 25 salî re, tenê pênc sed hezar jê xwendekar in. Van ciwanan, tenê Bin Elî û rejîma wî ya azadîkuj nas kirine. Hezkirên teknolojîyên ragihandinê -ji her sê

tûnisîyan herî hindik yek jê Înternetê bi kar tîne- û şiroveya mamosteyê felsefeyê li Sfaxê Tawfîk Thameur Driss li ser mijarê weha ye: *"Vî nifşî, bi riya Twitter, Facebook û blogan, qada xwe ya azadîyê û dijderketinê li ser Torê amade kiriye."*

Lê belê xwepêşandan herweha bi tevlîbûna kesên kamil, dê û bav û pîr û kalan û şerpezebûyîyên betaliyê û bi taybetî ji ber hêrsa bêparmayîna gelek salên xwe yên ku ji bo perwerdeyeke beredayî xerc kirine, her diçe mezintir dibin. Di qonaxa pêşî de şoreşa ku bi tevlîbûna beşên xizan ên civakê zindî bû, her diçe xwe digihîne beşên din ên civakê, bi taybetî jî beşên sinifên navîn ku aborîyê ji destpêka salên 1990ê ve tesîrê li wan jî kiriye: mamoste, parêzer, bazirganên piçûk, doktor… ev nerazîbûn li gel zemîna civakî, herweha li zemîna erdnîgarî jî berfireh dibe.

Tûnis, Sousse, Sfax, Gafsa, Gabes, Bizerte: bajarên herî mezin ên welêt jî zend û bendên xwe ba didin, bi taybetî bi greva giştî ya serkeftî ya li Staxê ya di 12ê çileyê de. Bûrjuwazîya lîberal, bazirgan û diravger jî li derve namînin. Ev çîna ku ji mêj ve hevkara rejîma Bourgîba, dû re jî qet nebe di salên pêşî de hevkara rejîma Bin Elî bû, gava ku ji alîyê tevnên mafyaya malbata Bin Elî û eşîra Trabelsî -paşnavê Leyla ya jina duyem a Bin Elî- ve bêbextî lê tê kirin, zêde hêrs dibe. Khemili vê rewşê jî bi van gotinan dest nîşan dike: *"8ê çileyê, desteyeke karsazên ji Soussê, bajarê bingehîn ê aqarê Bin Elî, ku berê jî yê Bourgîba bû, çû qesra serokatîyê ya Carthageyê ji bo ku desthilatê radestî wan bike".*

## Tevgera bê bergeha siyasî

Ridha Radaouî, parêzer û sekreterê giştî yê rêxistina Efûya Navneteweyî ya li Tûnisê, dibêje ku 10ê çileyê serê sibê *Bin Elî hê weke takekes nebûye armanc, lê belê tengezarî her zêde dibe. Daxwazên civakî û gelêrî pêşî ji alîyê parêzer û mamosteyan ve hat destek kirin, ji ber ku ev her du kategorîyên civakî ji alîyê rejîmê ve dihatin piçûk xistin û rasterast bi çetinahîyên civakî re rû bi rû bûn. Niha, gilî û gazîyên der bareya zordestîyê de her bilind dibin. Lê belê pirsek hê jî li holê ye, pirsa bergeha siyasî ya tevgerê? Vê gavê, tu bergeha wê tune".*

Baş e, kîjan pêşengên siyasî dikarin vê rewşê beralî bikin? Di dema axaftina xwe ya navdar a wergirtina desthilatê ya 7ê mijdara 1987ê de, Bin Elî yê ji alîyê bi milyonan tûnisiyan ve hat silav kirin, pesnê *"gihîştîbûna"* asta welêt a ji bo *"demokrasîyê"* dida û dianî ziman ku ev ast dike ku demokrasîyeke *"li ser pirpartîtî û pirdengîya rêxistinên girseyî" bê* ava kirin. Lê belê piştî "bihareke" ku çend mehan ajot, efendîyê nû jiyana civakî û siyasî bi temamî xitimand.

Bi sazbûna Kombûna Destûrî ya Demokratîk (RDC), mîratgira Partîya Destûra Nû ya ji alîyê Habib Bourgîba ve hatibû ava kirin (1934) û di 1964ê de bû Partîya Sosyalîst a Destûrî (PSD), Bin Elî kirasê pirpartîtîyê li siyaseta welêt kir -tûnisî ji vê yekê re dibêjin "dekor"- û bi pêkhatina partîyên bi navên "dijberîya legal" pêvajoyekê dest pê kir. Hin ji wan, ên weke Tevgera Demokratên Sosyalîst (MDS) an jî Tevgera Ettadjid ("Venûbûn"), li parlemanê xwedî kursî ne. Yên din, ên weke Partîya Demokratîk a Pêşverû (PDP), *"qirdikîya hilbijartinî"* boykot dikin.

## Sazîyên civakî, sendîka, xwendekar, esker, bêkar û hêrsa civakekê bi hev re

Li derûdora duyemîn jî hejmareke mezin a rêxistinên siyasî yên weke "dijberiya îlegal" tên bi nav kirin, xwe didin xuya kirin. *(Li rûpela XX. binihêrin)*. Sendîkavanî dikeve bin monopola UGTTê, tevgera xwendekarên zanîngehan a pir çalak a di salên 1970 û 80yê de li derdora Yekîtîya Giştî ya Xwendekarên Tûnisî (UGET) tên bi rêxistin, bi salan e di nava îlegalîteyê de *"xitimîne"*.

Pêşenga din a girîng a vê lîstika siyasî: civaka sîvîl û tevna wê ya nerazîbûnan (gelek radiyo, komên muzîkê û komeleyên cur bi cur) û weqfên parastina mafên mirovan. Hin ji wan xwe weke "nesiyasî" (Efûya Navneteweyî) îlan dikin, lê belê yên din bi destên kadroyên dijberî Bourgîba û Bin Elî, hatin afirandin. Bo nimûne Lîga Tûnisîyan a Mafên Mirovan (LTDH), a di 1976ê de avakirî û di heman demê de pêşenga lîgên mafên mirovan ên li Afrîkayê û tevahîya cîhana ereb e.

Derdora din jî Artêşa Neteweyî ye. Bi şertê ku hîç têkilî nav "kar û barên gelemperî" nebe, ev sazîya zêde nexuyayî ya ji sî hezar eskeran (bîst hezar jê di artêşa bejayî de ne) pêk tê, di 1956ê de ji alîyê Bourgîba ve hat ava kirin. Berevajîyê hêzên polîs ku hejmara wan di dema desthilatîya Bin Elî de zêdetirî sê qatan hat bilind kirin, ev hêza "komarî" bi başî di nav gel de deng daye. Qanûneke di 1957ê de derxistî, li eskeran qedexe dike ku bibin endamên komên siyasî û tu caran, di dema alozîyên mezin ên mohra xwe li dîroka welêt dane de, -tevgera xwendekarên zanîngehan (1972), serîhildanên ji bo nan (1984) an jî greva madenvanan (2008)- eskeran xwe têkilî bûyeran nekir. Vî wêneyê bêalîbûnê, dema ku serfermandarê giştî Reşîd Ammar, ji ber helwêsta xwe ya vekirî ya pêkneanîna fermana"gulereşandina ser gel" di 12ê çileyê de ji wezîfeya xwe hat dûrxistin, rengekî pîroz wergirt.

Gafsa, sibeya roja 10ê çileyê. Biryargeha herêmî ya UGTTê, bi qasî sî mîlîtan bi germî guftûgoyê dikin. Ji 6ê çileyê ve, ew hewl didin ji hêla xwe ve çalakîyeke piştgirîya tevgerê organîze bikin. Lê belê rêveberîya neteweyî ya sendîkayê ku li Gafsayê êdî ketiye bin destê Abassi Amara, sekreterê herêmî yê sendîkayê, ku bi gendelî û bîata xwe ya ji bo rejîma Bin Elî tê nas kirin, li ber xwe dide û li dijî çalakîyê derdikeve. Heman asteng li bajarên Sfax, Tozeur û Soussê jî xwe dide hîs kirin.

Di nav rojê de, Bin Elî axaftina xwe ya duyem kir û berê tîrên rexneyên giran da ser wan *"terorîstên"* ku hêrsa civakî li gor xwe beralî dikin. Lê belê tevger tûj û dijwartir bû. Serok soz dide ku heta 2012ê ew ê ji bo *"sê sed hezar kesan kar peyde bike"*. Li hemberî gotinên serok, Khemili hêrsa xwe weha derdibire: *"Ew ji 1990ê ve van sozên kar dide me! Nema kes jê bawer dike. Bi her halî, tevger êdî gihîştiye qonaxeke din".*

Ji ber tirsa nerazîbûna xwendekaran, Bin Elî ji bo sazîyên perwerdeyî yên welêt fermana betlaneyê dide. Çend saetan piştî biryarê, êdî UGTT jî xwe ranagire û li dij radibe: rêveberîya sendîkayê destûrê dide ku şaxên wê yên herêmî yên Sfax, Kairouan û Tozeurê dotira rojê û li tevahîya Tûnisê jî di 14ê mehê de greva giştî îlan bike. Kadroyekî Ettajdidê nerazîbûna xwe ya ji desthilatê bi van gotinan dide der: *"Ev bajarên serîhildêr wê bi her halî bi tena serê xwe biketana ser rê."* Heman êvarê, serîhildanên pêşî li wargehên bi nav û deng (Ettadhamen û Mnihla) ên paytext dest pê dikin.

## "Serbilindîyeke mezin a neteweyî"

Tîr êdî ji kevanê dertê. Li Sfaxê (şeş sed hezar şênî), bajarê qedîm ê bazirgan, lîman, dewlemend û halxweşan, ku bi giranî bûrjuwazîya diravger û gelek kesên ji çîna navîn lê dimînin, greva giştî bi ser dikeve. Li Soussê jî, ku ji bo tûrîzmê hatiye xemilandin, karmendên nexweşxaneya Farhat Hached meşeke mezin a nerazîbûnê organîze dikin. Dû re jî xebatkarên otêlan ku ji ber buhrana 2008-2009ê kar û statuyên wan ketine xetereyê, tevlî karmendên nexweşxaneyê dibin. Rojek berî xwepêşandanê, polîsan li welatîyan qedexe kiribû ku birîndaran bibin nexweşxaneyê.

Bin Eli hîs dike ku careke din berê bayî dizîvire. 13 çileyê, ew axaftina xwe ya sêyem dike. Ji nişka ve dibe mîna kesekî nefspiçûk, behsa *"azadiya çapemenîyê"* û *"mafê partîyên dijber"* dike, wezîrê karê hundir ji wezîfeyê digire û… sozê dide ku di hilbijartinên 2014ê de nebe namzet. Lê êdî pir dereng e, nerazîbûna siyasî veguherîye şoreşê. Sedemeke sêyemîn a ku serîhildan anî heta vê astê xwe dide der: kîna li dijî mafiyaya Trabelsî.

Xirabî û bêbextîyên ku vê eşîrê yên ku pêşî tenê ji alîyê ronakbîran û mîlîtanên siyasî ve hatin dîtin, hêdî hêdî di her malê de bûn sedemên bigewdebûna guftûgoyên li ser çavbirçîtîya şirketan di dema prîvatkirina (di navbera 1995 û 2005ê de) milkên rojnameyan û milkên din (qesrên bi heybet) de, bi kurtî îmtiyazên di warên otomobîl, supermarket, banka, şirketên balafiran, holdîngên ragihandinê de… Ev 15 sal in, kes û karên Xatûn Trabelsî dest danîne ser hemû warên girîng ên aborîya welêt.

Di 14ê çileyê de tiştê ku herî kêm dihat payîn qewimî: Bin Elî ji welêt reviya. Şoreşê serê dewletê jê kir. Rojên pêşî bi kaos û alozîyê bi dawî hatin. Rêxistinên siyasî yên ji bin cercereya sansûr û zordarîyê rizgarbûyî, bi carekê li ser dikê li hev kom bûn. Ev komên ku li dibistana binerdî ya qaçax bi gewde bûne û nihêrînên sekter û tûj mohra xwe li wan daye, ji bo lihevkirinê li hev kom dibin. Ji ber ku kolan bixwe nema dengê xwe dibire. Bo nimûne 18ê çileyê mîlîtanekî PDPê weha diqîre: *"Bi jêkirina şaxên darê, tu nikarî kokê darê jî biqelînî."*

Di vê rewşê de jî careke din gotinên Mohamed Khemili (7), yên hefteyek berê îfade kiribûn, tên bîra me: *"Heta niha, tu caran gelê tûnisî çarenûsa xwe nexistibû destê xwe. Ne di dema bindestîya xwe de (1881-1956), ne di pêvajoya bidestxistina serxwebûna xwe de (1956), ne jî dema ji text ketina Bourgîba (1987), ku ji alîyê generalê Bin Elî ve dihat bi rê ve birin. Eger, vê carê, tûnisî serkeftina daxistina Bin Elî bidomînin, ev ê bibe serbilindîyeke mezin a neteweyî. Wê tu kes jî nema karibe vê rûmeta vedîtî ji wan bistîne."*

* Rojnamevan

1 Lêkolîna yekîneya şewitîyên li servîsa cerahiya plastîk li nexweşxaneya Aîzîz Othmana ya li Tûnisê, 1998 www.tunivisions.net

2 Binihêrin: Karine Gantin û Omeyya Seddik, "Serîhildana "xelkên madenan" li Tûnisê", *Le Monde diplomatique*, tîrmeh 2008, û "Tûnis: darizîna neheq li Gafsayê", www.monde-diplomatique.fr, 12 çile 2009

3 Di nîsana 2009ê de, panzdeh tûnisîyên ji Metlaouiyê li peravên Lîbyayê jiyana xwe ji dest dan.

4 Mahmoud Ben Romdhane, *Tûnis: Dewlet, Aborî û Civak. Çavkanîyên siyasî, rewakirin û biserûberkirina civakî*, Publisud, Parîs, 2011

5 Lahcen Hacy, "Peydekirina karên beredayî li şûna bêkarîyeke hêja. Xetera Karên li Mexribê", *Deftera Carnegie*, Carnegie Middle East Center, Beyrouth, 15 mijdar 2010

6 "Geşedana Herêmî li Sîdî Bouzîdê: di navbera mîtolojî û heqîqetê de", rapora UGTTê (bi erebî), Tûnis, tebax 2010

7 Binihêrin: "Hefteya ku Bin Elî Hat Daxistin", li ser malpera *Le Monde diplomatique* – 19 çile 2011. Khemili bi bernavkê "Karim" jê tê behs kirin

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## Kronolojîya Kurtedîroka Tûnisê

- **1881**: Destpêka hîmayeya fransîyan.
- **1911-1921**: Rewşa awarte ji bo têkoşîna li dijî tevgera dijî-kolonyalîzmê.
- **3 hezîran 1921**: Sazkirina Partîya Lîberal û Destûrnameyî ya Tûnisî an jî Partîya Destûrê (ji "Destûra bingehîn").
- **2 adar 1934**: Habîb Bourgîba Neo-Destourê saz dike.
- **20 çile 1946**: Sazkirina Yekîtîya Gelemper yaTûnisî ya Kar (UGTT), a ku destekê dide Neo-Destourê.
- **31 tîrmeh 1954**: Nasîna otonomiya navxweyî ji alîyê Fransayê ve.
- **20 adar 1956**: Îlankirina serxwebûnê; 9ê nîsanê, pêkanîna hikûmeta Bourgîba, piştî hilbijartina Meclîsa Avakar; 13ê tebaxê, wergirtina koda statuya ferdî ya ku wekhevîya hiqûqî ya mêran û jinan biserûber dike.
- **27 tîrmeh 1957**: Jihevxistina qralîyetê û îlankirina Komara ku Bourgîba dibe serokê wê.
- **1961**: Pevçûnên dijwar li dijî artêşa fransî li derdora baregeha ku Parîsê li Bîzerteyê hiştibû. Ev baregeh wê di 15ê cotmeha 1963ê de were vala kirin.
- **1963**: Qedexekirina Partîya Komunîst.
- **18 adar 1975**: Piştî dengdana ji bo Destûrnameyê, Bourgîba bo hetahetayê dibe serok.
- **26 çile 1978**: "Pêncşema Reş". Greva mezin a giştî ya UGTTê li dijî lîberalîzasyona aborîyê. Nêzî 200 kes tên kuştin.
- **Kanûn 1983-çile 1984**: "Serîhildanên ji bo Nan", di encamê de zordarî zêde dibe û UGTT dikeve nav bêîstîqrarîyê. Desteserkirina birêveberê wê Habîb Aşour. General Zeynelabidîn Bin Ali dibe wezîrê ewlekarîyê.
- **1987**: Di tebaxê de, êrişên îslamîyan li Monastirê. 7ê mijdarê, bin Alî, ku hingê serokwezîr e, serok Bourgîba ji kar dixe, wî nexweş îlan dike û di şûna wî de dibe serokê dewletê.
- **1988**: PSD navê xwe dike Kombûna Destûrnameyî ya Demokratîk (RCD).
- **1994**: Hilbijartin. Bin Ali tenya namzet e. % 99,3ê dengan bi dest dixe. Di 1999ê de, hê jî tenya namzet e û % 99,9ê dengan, di 2004ê de % 94,5ê dengan û di 2009ê de % 89,6ê dengan bi dest dixe.
- **Sibat 1999:** Xwepêşandanên dijwar ên lîseyîyan li Gafsayê. Desteserkirinên girseyî.
- **Çile-gulan 2008**: Grevên li kanên madenê yên Gafsayê: Rêveberîya neteweyî ya UGTT destekê nade tevgerê.
- **17 kanûn 2010**: Mohamed Bouazîzî agir berdide bedena xwe. Xwepêşandanên li Sîdî Bouzîdê ku wê li tevahîya Tûnisê belav bibin.
- **14 çile 2011**: Serokwezîr Mohammed Ghannouşî îlan dike ku ew ê bi awayekî wextî şûna Bin Aliyê ji welêt reviya, bigire. Dotira rojê, serokê parlemanê Fouad Mebazaa, weke serokdewlet tê tayîn kirin.

www.arsivakurd.org

TÛNIS

# Guherîneke çawa li pêş Tûnisê ye?

AMIN ALLAL *

Ev demek e ku Tûnis ji nav vê lîstika siyasî ya tevizandineke demdirêj derdikeve, pêşengên partî, sendîka û komeleyan ji bo qayimkirina şûna xwe têdikoşin. Lê belê pirseke girîng li vir xwe dide der: roleke çawa divê ji bo nifşên nû yên di nav liv û tevgerê de ne, bê spartin?

Partîya serok a berê, Kombûna Destûrnameyî ya Demokratîk (RCD), wê wisa pir bi hêsanî, bi fermaneke esmanî ji holê ranebe. Çavdêrîya bi navgîna tevneke hûr û berfireh a welêt tenê rûçikekî desthilatdarîya wê bû. Partîya ku li nav dil û hinavê kargerîya welêt geriyayî, di qadên aborî, çandî, werzîşî… de xwedî gelek fonksîyonan bû. Wê hem dikaribû hin gep û bertîl bidana eşîran, hem jî devê xizanan şîrîn bikira. Ev jî ji bo partîyê dibû misogerîya bandora kontrola siyasî û di heman demê de jî misogerîya pêkanîna bingeheke girîng a civakî. Ev kokdarî ne astenga yekane ya li pêşîya şoreşê ye. Li alîyekî, artêş xwedî ciyekî serdest e *(gotara Olivier Piot bixwînin, r. 14)*; li alîyê din, hêzên weke ku nobeta valahîya heyî wergirtiye ser xwe, bi çetinahîyên mezin re rû bi rû ne.

**UGTT sazîyeke pirrû û guhêrbar e**

Yekîtîya Gelemperî ya Kar a Tûnisîyan (UGTT), ku sendîkaya yekane ye, pir caran weke rêxistineke xwedî jêhatîbûna tevgerkirinê tê rave kirin. Bi hebûna xwe ya li her derê welêt, ew ê, li gor hin analîstan, bibûya pêşenga serîhildana niha ya berdewam û alternatîveke RCDê. Rewş veguherî pir dûrî vê îmaja hevgirtî, UGTT sazîyeke pirrû û guhêrbar e. Pênc hezar endamên wê xwedî bergehên cur bi cur in û gelekan jî xwe li RCDê girtiye. Bi taybetî, rêveberîya wê pir caran pê li frênên çalakîyên protestoyî dikir, mesela çalakîya Gafsayê ya 2008ê. Di navbera rêveberî û girseya sendîkayê de hevnegirtinek heye: ji kongreya 1989ê ve, çerxa karîgerîya wê di nav demê re bû navendî. Ev rewşa ku ber bi berjewendîya sekreterê giştî veguherî, zerar da kadroyên herî daxwazker û paşî dûrxistî û di nav bêdengîyê de hatî hiştin.

Partîyên dijberîya legal, ên ku sazkirina hikûmeta yekîtîya neteweyî guftûgo kirin, di nav rewşa xwe ya mutewazî de şerpeze ne. Wan ji xwe re pir hindik cih dît li dorbajarên (El Kasserine, Sidi Bouzid, Gafsa) ku di salên dawîyê de ji her derê bêhtir têkoşîn meşandin. Wekî din, daxuyanîyên wan ên dawî dilbijokîya serokên wan ên ji bo serokomarîyê didin der: Ji Kombûna Sosyalîst a Pêşverû (RSP), Nejîb Şebbî; ji Forûma Demokratîk ji bo Azadiyan û Kar (FDLT), Mustapha Benjaafar; û heta ji Ettajîdê, Ahmed Brahîm.

Herî dawîyê jî, rêxistinên parastina mafên mirovan û rêxistinên din ên serbixwe nekarî xwe bidin xuya kirin, ji ber ku bi hemû liv û tevgera xwe ve, xwe dan têkoşîna li dijî zext û zorên ku lê rast dihatin. Ji nav rêxistinên ku, heta niha, neçarî meşandina kar û barên binerdî bûne, Partîya Komunîst a Karkerên Tûnisî, li dijî sazkirina hikûmeta yekîtîya neteweyî radibe. Herçende bi çalakbûna xwe ya li Gafsayê ya 2008ê xwe rewa kir, ev partîya çepa radîkal weke komikên piçûk virnî ma. Partîya îslamî, Ennahdha, bi encamên zordarîyeke dirinde re rû bi rû dimîne û gelek kadroyên wê mexdûrî sirgûnê bûne. Nîhayet dijberê li sirgûnê, Moncef Marzoukî li hemberî Bin Elî bû sembola biryardarîyeke pir zexim, nebû xwedî derfeta li hev komkirina mîlîtanan. Wî da zanîn ku dilê wî heye wezîfeyên xwe radestî ciwanan bike.


Weke henekeke dîrokê, dîktator 2011 weke "sala ciwanan" îlan kiribû. *"Bin Elî biryareke wisa da, em jî wê di cî de pêk bînin"*: ev hevoka xwepêşanderekê balê dikşîne ser hevnegirtin û jihevdûrketina siyaseta bijarte, komeleyî û sendîkayî û nifşên nû yên ku gelek caran ne rêxistî, ne jî girêdayî ne. Li gel vê yekê jî, ev meha raperînan dihêle ku apolîtîkîtîya wan a mijara gotinê êdî bi çavekî din were nirxandin.

Ev nifşên nû bi giranî ji nûgihîştîyên ku bi çavsorî sînga xwe didin ber guleyên polîsan pêk tên û piranîya kesên rêzên pêş ên di xwepêşandanan de cih digirin, temenê wan di bin sî salî re ye, eynî weke xwepêşanderê ku êvara 13ê çileyê ji Kramê ber bi Qesra Carthajê kete ser rê. Ji dotira rojê û vir ve, ciwan rasterast dixwazin ku dîktator welêt terk bike. Ew dixwazin êdî dawî li xanedana baviksalarî bînin û ji bo vê yekê deverên qedexekirî dagîr dikin û polîsan neçar dihêlin ku serîhildana wan silav bikin. Herçende eger bikaranîna Înternetê bûbe sembola amadekarîyên serîhildêran, tecrubeya komîteyên teqayuzê jî di vê de roleke girîng lîst. Di dema van teqayuz û nobetan de ciwan di navbera xwe de dipeyivin, hev agahdar dikin û biryarê didin. Bi pêkanîna ewlekarîyê, ew rola hêzên nîzamê jî digirin ser xwe. Sloganên pêkanîna nîzamê tên gotin: bila tax bi tax lîsteyên mîlîtanên RDCê bên amade kirin, bila kes dibistanan neşewitîne… Serê sibê, bi komkirina çopên li kolanan serîhildêr xizmetên şaredarîyan jî bi xwe bi cih tînin.

Ciyê ku di avakirina siyasetê de ev serîhildêrên hejmara wan bi sedan hezar e, bigirin, venûkirina figur û kar û barên siyasî, wê paşeroja şoreşê diyar bikin.

* Lêkolînerê li Enstîtuya Lêkolîna Siyasî ya Aix-en-Provenceyê, ya girêdayî Enstîtuya Lêkolîn û Xebatên li ser Cîhana Ereb û Misilman (IREMAM).

Wergera ji fransî: Baran Nebar



FEWZÎ BILGE: **Payîz**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 44 x 23 cm

## TÛNIS

# Êdî kes li benda Godot * nîne…

CELÎL KAYA **

Ji meha kanûnê ve hemû cîhanê berê xwe dabû Sûdanê û meraq dikir ka di encama referandûma li ser cihêbûna başûrê vî welatî de dahatûya welêt dê çawa bibûya. Lê hîna ku encamên referandûmê bi awayekî fermî nehatin aşkere kirin, li welatekî din ê Afrîkayê, li Tûnisê desthilatdarî, mirov dikare bibêje ji nişkan ve, hat guhertin.

Ev guherîna deshilatdarîyê ne di encama darbeyeke leşkerî de, lê belê di encama tevgereke sivîl a hevwelatîyan li dij bêkarî, bilindbûna buhayê xwarinan, gendelî û nebûna azadîya xwe derbirînê, bi lidarxistina meş û xwepêşandanên li kolanan pêk hat. Di encamê de roja 14ê çileyê çapemenîya Tûnisê ragihand ku serokdewlet Zine El Abidine Ben Ali (Zeynelabidîn bin Elî) piştî deshilatdarîya xwe ya 23 salî, ku bi lepeke hesinî bi rê ve dibir, dest ji karê xwe kişandiye û li Erebîstana Suûdîyê doza penaberîyê kiriye.

Hevdem, çapemenîya cîhanî jî wekî meyla van demên dawîyê navekî rengîn li van bûyeran kir: "Şoreşa Sosîsan". Şoreşên din ku wekî şoreşên rengîn tên binav kirin ev in: Şoreşa Gulan li Gurcistanê (2003), Şoreşa Porteqalî li Ukranyayê (2004), Şoreşa Dara Sedîrê li Lubnanê (2005), Şoreşa Laleyan li Qirxizistanê (2005), ku jê re Şoreşa Pembe jî tê gotin û Şoreşa Kesk a xwendekaran li Îranê (2009).

Weha xuya dike ku êdî kes li benda Godot namîne û şoreşa xwe bixwe pêk tîne. Helbet, hin faktorên din jî hene ku şoreş weha bê çek û ji nişkan ve çêdibin, lê belê xelk pê dizanin ku guherîn ne bi qasî ku xuya dike, dijwar e.

### Yekemîn şoreşa xelkê ya erebî: Tûnis

Piştî destpêkirina bûyeran, serok Zine el-Abidine Ben Ali bi hin taktîkan xwestibû ku bûyeran biçilmisîne: Di 12ê çileyê de wî zexta li ser çapemenîyê sist kir û ragihand ku piştî dawîlêhatina serdema wî ya serokatîyê, ku di 2014ê de bi dawî dihat, di hilbijartinan de dê nebûya namzet. Vê yekê têrî aştbûna xwepêşandaran nekir, lê dijberî wê, wêrekîya wan zêde kir. Di encamê de dîktatorê salan ji deshilatdarîyê hat xistin.

Lê belê tu kes li benda rûdanên weha nebû. Tûnis di nav welatên din ê ereban de wekî modern, sekuler û herî rojavayîbûyî dihat nas kirin. Wekî îspata vê yekê jî gelek gotarnivîsên rojavayî binxêz dikir ku li Tûnisê jin ne mecbûr in ku rûserî bidin serê xwe. Lê haya wan jê nîne ku ji bilî Erebistana Suûdî û Îranê (û Afxanistana Talîbanan) li welatekî din ê musulman jin ne mecbûr in serê xwe bigirin. Heta li welatên din ên wekî Tirkiye û Tacîkistanê jin nikarin li her derê rûserî bidin serê xwe. An ku pîvana Rojava ew e ku welatekî ereb/musulman ji hêla çandî ve çi qas nêzî Rojava bûbe ev welat hinde demokrat e. Pîvan ev e.

Dema ku li dîroka welatên ereban were nihêrtin, tê dîtin ku heta niha raya giştî ya ereban di guhertina hukûmetan de yan jî di bandora li ser siyaseta desthilatdarîyên xwe de tu cara nebûye faktorek. Ev yek bêhtir balê dikişîne ku li welatekî wekî Tûnisê, ku wekî dewleteke xedar a polîsan tê nasîn, tevgereke civakî encamên bi vî rengî derxistin holê. Her ji ber vê yekê, ev serhildan ne tenê ji bo welatên Bakurê Afrîkayê, lê her weha ji bo hemû cîhana ereb wekî erdhejekê bû.

Zine el-Abidine Ben Ali welatê xwe wekî cîranên xwe yên Cezayîr û Lîbya û herweha wekî hevgirên Amerîkayê, Misir û Urdunê bi rê ve dibir, ku li van welatan muxalîf tên girtin yan mişext kirin, çapemenî li jêr sansûra dewletê de ye û civaka sivîl tê çewsandin. (1) Çapemenî radigihîne ku di van 23 salan de li Tûnisê gendelî berbelav bûye û nifşên nû ji ber nebûna derfetên aborî û azadîyên siyasî bêzar bûne.

Tiştekî din ku balê dikişîne ev e: Bûyera ku tetika serhildanê kişandibû xwesotina Mohamed Bouazizi yê 25 salî bû, ku ji bo debara malbata xwe li kuçeyan tişt difirotin. Tiştê ku cîhan ´elimandî ye ew e ku li welatên musulman çalakîyên xwekujî li ser navê cîhadê bi bombeyê tê kirin. Lê belê vê carê weha nebû. Wî xortê ciwan xwe ne ji bo xatirê xwedê yan îslamê, lê belê ji bo nan û azadîyan şewitandibû. Wekî Jan Palach ê çekî ku di sala 1969ê de li dij dagîrkirina sovyetan xwe şewitandibû û wekî rahîbê budîst Thích Quảng Đức da ku darizandina rahîban a ji aliyê rêveberîya Vîetnama Başûr protesto bike, xwe şewitandibû. (Helbet gelek mînakên xwe-şewitandina protestoyî di dîroka nêz a kurdan de jî heye, lê belê van çalakîyan nikaribûn bi qasî ku dihat xwestin bala cîhanê bikişînin ser kurdan.)

### Hişyarî ji bo dewletên ereban û her weha ji bo cîhana Rojava

Di encamê de mutlaqîyetek, anku deshilatdarîya qral û mîran ku heta dawîya temenê didome, bi dawî hat. Ev yek divê ji bo hemû welatên ereban di serî de Misira Husnî Mubarek bibe hişyarîyek, ji ber rewşa aborî û siyasî ya welêt xeterek e û her ku diçe mezintir dibe.

Bûyerên Tûnisê herweha ji bo birêveberîyên rojavayî nemaze ji bo Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê peyamek girîng bû. Wekî mînak Obama, da ku hevdilîya cîhana ereb bi dest bixe, êdî qala demokrasî û mafên mirovan nedikir û wezîra karên derve Xanim Hillary Clinton hema piştî bûyerên li Tûnisê daxuyanîyek dabû û gotibû ku DY di vê mijarê de bêalî ye. Lê belê pir pê neçû Xanim Clinton daxuyanîyeke din da, ku tê de li dij deshilatdarîyên gendel û paşdemayî yên Rojhilata Navîn, bêyî ku navê demokrasîyê bi lêv bike, banga reforman kir. Birêz Obama jî paşê daxuyanîyek belav kir, ku tê de pesnê serhildana Tûnisê dida û banga hilbijartinên adilane dikir.

Lê belê tê zanîn ku cîhana Rojava, ku her tim qala demokrasî û azadîyên takekesî dike, li Rojhilata Navîn piştgirîya otokratan an ku dîktatoran dike. Sedema vê yekê aşkere ye. Rojava, rejîmên dîktator wekî enîyeke qewî ya li dij 'gefa îslamî' dibîne. Her ji ber vê yekê Cîhana Rojava di sala 1992ê de li Cezayîrê pişta artêşê girtibû ku mudaxaleyî yekemîn hilbijartinên pir-hizbî ya welêt kiribû. Di tûra yekemîn a van hilbijartinan de partîya îslamî ya bi navê Eniya Rizgarîya Îslamî bi ser ketibû. Herweha di sibata 2005ê de, her çend Husnî Mubarek bi soza bêhtir azadî û demokrasî qanûna li ser hilbijartinan guhertibû jî, di encamê de nehatibû hiştin ku Ayman Nourê serokê partîya îslamî ya bi navê El Ghad li hember Mubarek bikeve hilbijartinan. Cîhana Rojava xwe li hember van rûdanan kerr û lal kiribû.

Niha mînaka Tûnisê li ber çavan e. Divê ev helwêsta Rojava careke din were wezinandin û nirxandin. Ev rejîm nikarin him hebûna xwe biparêzin û him jî li peşîya nifşê nû, ku bala xwe pirtir dide ser demokrasîyê, ne li ser îslamê, asteng in.

Gotarnivîs û analîstên amerîkî, bêyî ku wext derbaz bikin, tawsîye li Obama kirin ku digel Fransa û Yekîtîya Ewropayê rista xwe di demokratîzasyonê de bilîze. Bi rastî jî Tûnis xwedî potansîyel e. Her çend figureke hêzdar a muxalefetê nîne û partîyên siyasî gelek qels dimînin jî avantaja vî welatî ew e ku, tundrewên îslamî wekî li Cezayîr û Misirê, bihêz nînin.

Destûra Tûnisê dibêje divê di nav 60 rojan de hilbijartinên serokayetî werin li dar xistin û serokê parlamentoyê, ku niha wekî serokdewletê demkî peywirdar(wezîfedar) e, dîyar kir ku hilbijartin dê di nav vê serdemê de werin li dar xistin.

Serokê Lîbyayê Muammer Qeddafî bûyer wekî peyam fêm kiriye, ji ber ku piştî destkişandina Ben Ali peyamek weşand û tê de serhildan şermezar kir û belgeyên Wikileaksê wekî sedema alozîyê nîşan dan. (2) Ev peyam dikare wekî nîşandana fikarbarîya serokên din ên ereban jî were şirove kirin, ku ew jî wekî Ben Ali bi salan e li ser desthilatdarîyê ne. Nûçegihanên ewropî herweha ji devê serokmuxalefetên misirî ragihand ku bûyerên Tûnisê îlham daye wan û ew xwe ji her demê bêhtir nêzî guherînê dibînin. Her weha lê zêde dikin, şîddet berhema zexta salan bû. (3) Serokdewletê Misirê Husnî Mubarek jî divê van bûyerên dawî baş şirove bike. Mubarek ji 1981ê û vir ve serokdewlet e û di hilbijartinên îsal de wê careke din were hilbijartin. Kurê wî jî amade ye ku li dû bavê xwe wekî xelefê wî serokatîyê bike. Heger Misir di dahatûyeke nêzîk de pergala xwe ya siyasî neguherîne serhildana ciwanên bêzar, bivênevê ye ku li vî welatî jî pêk were. Lê belê hebûna îslamîyên tundrew ên li vî welatî nîşaneyek e ku heger Mubarek bi tevgereke weha were rûxandin nayê wê wateyê ku welat bibe demokrat.

### Îslamî û Şoreşa Tûnisê

Di bûyeran de, ji bilî îslamîyan ji her alî kes beşdar bûbûn. Her çend li welatên sekuler ên ereban, wekî Misir, Urdun û Cezayîr îslamî li dij deshilatdaran zahmetîya herî mezin in jî, li Tûnisê muxalefet ne ji îslamîyan lê belê ji rewşenbîr, huqûqnas û sendîkayên sekuler hat. Mirov dikare bibêje ku nebûna muxalefeteke bihêz a îslamî encama siyaseta hukûmetên Tûnisê ye, ku di van pêncî salên dawîyê de hewlê didin ku teşeya jiyaneke îslamî ji nav jiyana gelemperî derxin.

Ji salên 90ê û pê ve Ben Alî jî bi rikdarî ev siyaset meşand û bi sedan endamên tevgera sereke ya îslamîyên Tûnisê, Al-Nahda xistin girtîgehan. Endamên vê partîyê tûşî îşkence, zindana heta dawîya jiyanê û mişextîyê bûn. Wekî encam piranîya vê muxalefeta îslamî li derveyî welêt dijî û yên li welêt mayî jî ji neçarîyê hevbendî digel sekuler û komunîstan girêdane.

Analîst dibêjin ku her ji ber vê yekê serokdewlet bi dilrehetî diyar kiribû ku ew dê di hilbijartinên dahatû de nebûya namzet. Lê heger îslamîyan di vê serhildanê de risteke girîng bilîstaya tedbîrên ewlekarîyê ku li dij xwepêşandaran hatibûn stendin dê dijwartir bûbûna. Anku serhildan li dij elîtan pêk hatibe jî, rûxandina sekularîzma dewletî ne mebesta xwepêşandanan bû. Sedema vê yekê jî weha tê şirove kirin. Dewleta Tûnisê li ser îdeolojîyeke sekuler a ereban ava dibe û sekularîzm û neteweperestîya wê li gor cîranên wê kevintir û hêzdartir in. Ji alîyê din, ji ber ku Ben Ali ji bo malbata xwe û elîtên gendel ên karsazan pere îsraf dikirin, ku ev yek ne bi dilê artêşê bû, giregirên serbazan jî bo parastina deshilatdarîya wî tiştek nekirin û xwe paş de kişandin.

Jixwe dema ku selefê Ben Ali, Habib Bourguiba, bavê Tûnisa piştî kolonyalîzmê, piştî hatina xwe ya ser kar, dest danîbû ser erdên dezgehên îslamî, dadgehên îslamî veguherandibûn dadgehên sekuler û qanûneke medenî ya sekuler çêkiribû. Wî herweha wekî Komara Tirkîyê, îslamî wekî gefeke li dij dewletê dîtibû û ji ber vê yekê derfet nedabû wan ku di pergala siyasî de cih bigirin. Piştî hin êrişên li havîngehên tûrîstan wî fermana înfazkirina îslamîyan dabû û peçeya jina jî wekî tiştekî kambax bi nav dikir.

Ben Ali jî di riya Bourguiba de çû. Her çend qralê Fasê Muhemmedê Şeşemîn û serokdewletê Misirê Husnî Mubarek xwedî unvanên îslamî ne û dixwazin deshilatdarîya xwe bi îslamê meşrû bikin, Ben Ali unvaneke îslamî li xwe nekir û tu car hewl neda ku digel îslamîyan hevkarîyê bike, şûna wê, ew li derveyî siyasetê hiştin.

Ev faktora taybetmendîyên civaka Tûnisê divê li ber çavan were ragirtin. Anku nebûna muxalefeteke hêzdar a îslamî hişt ku tevgereke weha li Tûnisê bi ser keve. Lê ev yek dikare ji bo welatên din ên ereban, ku îslamî lê rêkxistî ne, weha nebe. Wekî mînak heger deshilatdarîya Husnî Mubarek bi awayekî wekî Ben Ali hilweşe ne dijwar e ku îslamî deshilatdarîyê bixin destên xwe.

### Ji niha û şûn de Tûnis

Dijwar e ku mirov guman bike ka ji niha û şûn ve Tûnis dê ber bi ku ve here. Lê hin şoreşên rengîn ên li welatên wekî Ukrayna, Gurcistan û Qirxizistanê her çend bi hêvîyên mezin pêk hatibûn jî ne bi awayekî ku xwepêşandaran dixwest bi dawî hatin. Di hilbijartinên (2010) ji bo serokdewletîyê de li Ukranyayê dijberên şoreşa purtaqalî bi ser ketin. Li Gurcistanê jî, ew kesên ku di Şoreşa Gulan de cih digirtin îro dijberîya hukûmetê dikin û dibêjin rêxistina Sorosê ku piştgirîya şoreşê dikir êdî bûye parçeyeke hukûmetê. (Çend rêvebirên Enstîtuya Civaka Vekirî- OSI ya bi ser Sorosê ve di parlamentoyê de ne.)

Di vê navberê de divê mînaka 'înqilaba îslamî', ku di 1979ê de li Îranê pêk hatibû, jî were bi bîr anîn. Li wê derê jî darbeyeke leşkerî na, lê belê tevgereke xelkî (û partîyên cur bi cur) hebû ku ji komunîstan heta îslamîyan, ji kurdan heta azerîyan her kes tê de cîh girtibû. Lê belê di talîyê de îslamîyên şiî deshilatdarî bi dest xist. Ev yek ji welatekî ereb her tim wekî xetereyek e.

Ji bo paşeroja Tûnisê, Rojavayî Tirkiyeyê wekî mînak nîşan didin. Ew pêşniyar dikin ku Tûnis dikare muxalefeta îslamî li derveyî pergala sîyasî nehêle û wan bi awayekî tev li siyasetê bike. Bi vî awayî ew dikare bibe Tirkiyeya cîhana ereb. Helbet tirk, ku xwe wekî welatekî sekuler bi nav dikin û naxwazin navê welatê wan bi îslamê re bi hev re were bilêvkirin, bi awayekî germ li vê dirûvbirînê nanihêrin. Lê belê çi dibe bila bibe heger demokrasîyeke rasteqîn were Tûnisê divê îslamî jî tê de hemû partî û muxalefet tev li pergala sîyasî bibin. Ev yek him pêşî tundrewîyê digire him jî Tûnis pê dikare pêşengiya cîhana ereb bike.

* Li Benda Godot (îngilîzî:Waiting for Godot, fransizî: En attendant Godot) lîstika şanoyê ya nivîskarê îrlandî Samuel Beckett e. Lehengên vê lîstikê, ku du kes in, li benda kesekî yan tiştekî bi navê Godot in. Gelek kes Godot wekî 'şoreş' bi nav dikin.

** Huqûqnas/Rojnameger

1 Li gor Rêxistina Rojnamegerên Bêsînor di warê azadîya çapemeniyê de di nav 178 welatan de Tûnis di rêza 164emîn de, Misir di 127emîn de, Cezayîr di 133emîn de, Lîbya di 160emîn de, Fas di 135emîn de ye. Binihêrin: http://en.rsf.org/press-freedom-index-2010,1034.html

2 Binihêrin: http://www.guardian.co.uk/world/2011/jan/16/muammar-gaddafi-condemns-tunisia-uprising

3 Ibid. (heman çavkanîya jorîn)

www.arsivakurdi.org

TÛNIS

# Tûnis û serîhildana biserketî

HICHAM BEN ABDALLAH EL ALAOUI *

Sekreterê Giştî yê Lîga Ereb 19'ê Çile di dema civîna bilind a li Şarm el-Şêxê (Misir) got, "ruhê ereb ji ber xizanî û bêkariyê şikestiye". Ne mumkin bû ku me tirsa hikûmetên herêmê yên ku dîtin şoreşa tûnisî rejîmên wan jî dixe tehlûkeyê, bi rengekî baştir xulase debibirin.

Tûnisîyan rejîmeke despotîk ji textê wê anî xwarê, ku veguherîbû kleptokrasîyeke -pergaleke li ser hîmê dizî û bertîlê hatî danînducarî ya otokrasîyeke zordar. Di vê sîstemê de desthilatdarî bi malbatekê bi gewde dibû, malbateke ku civaka tûnisî talan dikir. Xweşewitandina ciwanekî lîse qedandî yê bê hêvî yê ku li ser dezgeha xwe ya seyyar mêwe û heşînayî difirotin, serîhildanek da dest pê kirin. Vê serîhildanê yek ji rejîmên herî zordar ên cîhana ereb têk bir. Tevî ku dîktatorî li herêmê têra xwe hene.

Ev serîhildana qehremanî ya milletekî mezin, mînak e. Nedihat pêşdîtin, rêbertîyeke wê ya siyasî ya bi rastî nebû, xisleta wê ya neavakirî bi kêrî serîhildanê hat. Heke xisleteke wê ya bi vî rengî ji berê de hebûya, rejîmê wê ew bi îhtîmaleke mezin bitepisanda. Bi tenê mentiqê "êdî bes e" ya li dijî otokratîya Zeynelabidîn Bin Elî, serîhildêr dikirin yek û wan bi riya Înternetê peywendî bi hev re datanî. Rejîmê nedizanî çawa pêşîyê lê bigire (tevî ku Tevgera Kesk li Îranê 2009ê ji alîyê teokrasîya deshilatdar ve hate kontrol kirin). Di demeke ji mehekê kintir de, ji serîhildanê hat ku pişta vê rejîmê bide erdê, vê rejîma ku nêzî çaryek sedsalê Tûnis kirî yek ji welatên herî girtî yê Afrîkaya Bakur û Rojhilata Navîn.

Avantajên serîhildaneke bi vî rengî êdî lawazîya wê ya sereke ne: nebûna lîder, bernameya siyasî yan jî jêhatîbûna ku piştî ji desthilatdarîyê xistina serokê şermdêr, berpirsiyarîya civakê bigire ser xwe.

Welatê ku xelkê wê yek ji xelkên herî baş perwerdebûyî û herî zêde sekulerbûyî yê cîhana ereb e, heta îroj jê hat ku pêşîyê li her şêwazê serdestîyeke îslamperestên tundrew bigire. Ya ku derdikeve holê, weha xuya ye ku wê derfetê nede îslamperestên tundrew da ku bi şiddetê desthilatdarîyê bi dest bixin. Ji ber vê jî heke partîyeke îslamî (weke *Nahda* (1) qebûl bike di lîstika demokratîk de cihê xwe bigire, ev yek wê bi kêrî bicihkirina wan a di pergala siyasî de û bêhtir marjînalkirina îslamperestên tundrew, were.

Hestên neewlebûnê yên darîçav ên ku piştî ji text ketin û ji welêt reviyana bin Elî peyda bûn, çavkanîya wan nebûna elîteke siyasî ya xweser e ku dikare guherîna dewra desthilatdarîyê û derbasbûna bi ser rejîmeke demokratîk misoger bike; ya mayî hê jî bi tenê elîta rejîma hilweşiyayî, partîyên siyasî yên hê pêşneketî û sendîkayên serê wan jêkirî ye. Heke tirsa ji kaosê, bawerîya bi kapasîteya xwebirêvebirinê ya civakê û realîzma siyasî serdest bin, dibe ku avahîyên siyasî peyda bibin. Di ser riya demokrasîyê de ciwan wê weke kozekê bi kêrî civakekê bên û ji vê civakê hat, bêyî ku zirarên vegera ji wan nebe, lê bibin, ji dîktatorîyê xilas bibe.

### Tirsa ji îslamîzmê rê li ber desthilata gel digire?

Bi nêzîkbûna yekemîn hilbijartinên damezirêner re, gelo birêvebirên nû wê careke din xwe bispêrin tirsa ji îslamîzmê da ku redkirina desthilatdarîya gel bi hikûmetên rojava bidin qebûl kirin? Dema wê dikudînin, rê xwedîyên nû yên desthilatdarîyê ditirsîne. Ji bo pêşîlêgirtina pirroletîyên şiddetê, qet nebe bi qasî ku beşekê ji desthilatdarîya serokdewletê têkçûyî biparêzin, dibe ku rejîma derbasbûnê hewl bide statukoyekê biparêze. Bi lidarxistina hilbijartinan di demeke nêzîkkirî de, tehlûke heye ku ev rejîm giranîya elîtên êdî ne rewa, zêde bike, ew ê jî xwe ji nû ve bi rêxistin bikin da ku etîketa guhertinê îstîsmar bikin.

Şema klasîk e. Em di destpêka salên 1990ê de li Bulgaristanê û Romanyayê jî wê dibînin. Li van welatan, rejîma berê bi elîtên kevin re dixebite da ku bi reng û rûyekî nû vejî. Mesela Ukraynayê jî van her duyan jî bêhtir tiştan îfade dike: qutbûn bêhtir bingehîn e (lewma dewleteke nû derdikeve holê), lê belê çawa xir û cir û tevlihevî kêmtir bûn, kadroyên kevin ên siyasî vegerîyan ser kar. Xeta hevpar a di van rewşan hemûyan de ew e ku li dijî otorîteyên nefret ji wan tê kirin, gel seferber dibe û hilweşîna rejîmê di cih de zexta gel kêm dike, dihedinîne. Li deverên ku civaka sîvîl kêm bi rêxistin bûye, ev yek astenga sereke ya tevahîya derbasbûnan e.

Serhildana çileyê ya li Tûnisê dîsa jî hêvîyê dide gelên din ên ereb. Tecrûbeya azadîyê vedigire, him li Cezayîrê, him li Misir, Urdun, Fas û Sûrîyeyê, heta bi Filistînê jî. Li her deverê hinekî, nifşên nû yên ji pergalên otorîter zivêr bûyî, bê hêvî dibin ku xwe ji wan azad bikin. Lê belê, jixwe *ji ber ku* kes li bendê nebû, tecrûbeya tûnisî wê nikaribe bi heman rengî li cîhana ereb a mayî dubare bibe.

Li Tûnisê artêş nisbî têra xwe ji rêxistinên îstîxbaratê û –polîs jî di nav de– ji yên zordarîyê cihê bû. Ji bilî muhafizên serokdewlet, para bêhtir mûçeyê wan kêm e, dîsa jî ji van rêxistinan hat ku serîhildanan bi sînor bikin, kirinên guhnedanê hê pêk nehatî bifetisînin. Lê belê wan nedizanî çawa serîhildanên hindikî organîzekirî û li gelek tebeqeyan belavbûyî bitepîsînin, ji heq wan werin der.

Ne weke Cezayîra dîktatorîya wê belav e –û ne di destê mirovekî de kombûyî ye–, belê weke Misira ku Reîs tevahîya kîn û nefretê kom dike, ji bo gel wê teşhîr bike dîktatorîya tûnisî armanceke hêsan bû. Hema bêje destê tevahîya malbata Bin Elî di zept û repta welêt de bû û vê jî ev fenomen xurttir dikir. Li gor dîktatorîyên ku yek rûyê diyar di hisa gel de nûnerîya wan dike, weke mînakên bi herkesî diyar Şahê Îranê yan jî Suharto li Îndonezyayê, zehmettir e dîktatorîyên belavbûyî ji textê desthilatdarîyê werin xistin. Wekî din, li gorî dîktatorîyên takekesî, koalîsyonên olîgarşîk xwediyên bingehên firehtir in: di encama vê de jî ew hindiktir hesas in û bêhtir xwegirtî ne. Dema beşeke desthilatdarîyê didin gel û nemaze komên cihê yên berjewendîyan, sîstemên otorîter ewqasî bêhtir xwegirtî dibin. Dema mirov li ber Tûnisê bigire, desthilatdarîyên Fas û Cezayîrê kirin ku tevnên gelekî firehtir û tevlihevtir ên berjewendîyan derkevin holê û ew jî bi van desthilatdarîyan ve girêdayî ne. Li Cezayîrê kara ji petrolê gewdeyeke siyasî ya ku yekser dixwaze rejîmê li ser piyan bigire, pêk tîne.

### Lawazîya civaka sîvîl, "xurtbûna" rejîman e

Xisleteke din a pergala tûnisî ew bû ku wê hilbijartin vediguherandin referandûmên xemgîn (sala 1989ê % 99.27ê dengan, sala 1994ê % 99.91ê dengan, sala 1999ê % 99.45ê dengan, sala 2004ê % 94.49ê dengan, sala 2009ê % 89.62ê dengan) û tu rê ji muxalefetê re nedihiştin. Qada siyasî, ya rastî, nebû. Li Misirê rewş ne ev e. Sîstema hilbijartinê ya Misirê bê guman di bin nîrê sextekarîyeke mezin de ye, dîsa jî cihekî liberrabûn û xwe li hev rakişandinê ye. Wekî din, hevsarê çapemenîyê ne qasî ya li Tûnisê şidandî ye.

Li Cezayîrê jî rewş bi heman rengî ye. Li wir wekî din kara ji petrolê destûrê dide radîkalbûneke hêrsa gel. Qet nebe bi qasî ku hîyerarşîya eskerî him hevgirtî dimîne, him li ser dika siyasetê kêm tê dîtin û him jî jê tê ku beşeke aktorên siyasî yên ku lîstika destnîşankirinê qebûl dikin –dema vê dike serî li wan ditewîne– bigire nav xwe. Jixwe wekî din piştî şerekî navxweyî yê bêhtirî deh salan dewam kir, xwîn di Cezayîrê de nehişt û kir ku welat ji bo serîhildana li dijî rejîmê kêm amade be, rejîmeke ku di berdêla sedhezar mirîyan de li dijî îslamperestîya tundrew bi ser ket.

Dimîne Fas, cihê ku heta îroj kîna gel berê tîrên xwe nedaye monarşîyê. Lê belê, ji ber nebûna perspektîvan, ji ber lîstikeke siyasî ya xitimî, sazîyeke zordar ya ewlekarîyê û ji ber tevnên hevparêz ên zordest, dibe ku ciwanên heqê wan hatî xwarin ji bo serîhildanekê sedemekê bibînin. Ev serîhildan dibe ku ji ber tevlihevîya avahîya welêt radîkal bibe. Ya rastî, bi pêvajoyeke yekrengkirinê ya kêm pêşketî, qelşên etnîk li wir him pir zêde ne û him jî kûr in.

Li van welatan hemûyan modeleke pêşketinê ya hindikî dînamîk û pir newekhev, ya ku kurtêlxurî û hevparêzîya di nava sazîya dewletê de nîşanên wê ne, dorgirtineke xurt a gel û nebûna pêşîvekirina li qada siyasî, dikin ku ev rejîm gelek caran ji ber lawazîya civaka xwe ya sîvîl "xurt" bin. Lê belê dema ku kêmasîyeke herî piçûk jî xwe di zirxê wan de da der û beşek ji nerazîbûnê jî xwe bavêje ser, hingê jihevketina pergalê li ber derî ye.

Di tecrûbeya tûnisî de tam jî xisleta kurmî ya rejîmeke tengavbûyî û ne rewa, kir ku serîhildana gel peyda bibe. Gelo mêweyeke gihayî bû û ket? Dîsa jî, desthilatdarîya Bin Elî weke yek ji yên herî zexm û bi îstîkrar ên herêmê dihat qebûl kirin. Qelş xuya nedikir û mirov nikarîbû li ya ku wê biqewimiya bifikire.

Rejîmên din evqasî hesas nînin û di heman astê de jî nînin. Temendirêjîya wan dike ku ew bibin nêçîrên hêsan ji bo tevgerên îroj em bi zor dikarin li wan bifikirin, lê belê wê paşê derkevin holê, ev yek bi qasî ya ku pişta rejîma tûnisî şkand, bivê nevê ye. Dîktatorîya Bin Elî bi hêsanî li hember êrîşên ciwanan serî tewand, ev yek îşaret bi bêkêrîya sazîya zordestîyê li dijî tevgerên bi carekê weke brûskê peyde bûyî, dike.

### Cudatîyên di navbera herêman de rejîm da ber xwe û bir

Newekhevîyên pêşketinê yên di navbera herêmên cihê yên welêt de bi kêrî serîhildana tûnisî hatin. Sermayeguzarî herî zêde li herêmên peravên deryayê hatibû kirin da ku tûrîzm were teşwîq kirin, lê belê herêmên dûrî peravan bê xwedî hatibûn hiştin. Ya ku rejîm da ber xwe û bir, tam li wir peyda bû. Li welatên din ên ereb jî hemin ev newekhevî heye, lê belê bi awayekî din. Di civakekê de ku komeke gelekî piçûk û nerewa pergala wê ya siyasî desteser bike, ew welat wê nikaribe bi rengekî mantiqî bi pêş keve; helbet heke xweserîya teknokrasîyeke weke modela Çînê tevdigere nebe. Lê belê piranîya welatên ereban teknokrasîya xwe li ser qurbangeha bertîlxurîyê û otorîtarîzmê bi gorî dikin.

"Trabendîst û ciwanên nizanin çi bikin, ku pirî caran zanîngeh xwendine, li kolanan in, pişta xwe didin dîwaran: gelo "hittîst" (2) ew kes in ku meyila wan heye îslamîsmê tercîh bikin yan jî qurbanên sîstemekê ne ku ji wan re qet şansê bi awayekî bi rûmet bijîn, nehiştî? Yan bêhêvîbûna wan weke li Misir û Cezayîrê xwe îfade dike (bêyî ku karibe rewşê biguhere, ew ê bi agirekî piçûk vemire). Yan jî ew weke kîna nedayî der dimîne (weke li Urdun û Fasê). Carinan bêyî pê bihisin, rejîm îstîqrara xwe li ser hîmê xemnexwarîya civakeke ku êdî nikare serî ji hilde, datînin. Roja ku qehr û kîn diteqe, ev civak bi tenê kortir û bêhtir bi şiddet e.

Heta ku bêhêvîtîya ciwanan negihe wê astê ku xwe bi kirinekê ve girêbide ya ku dikare êgir bi barûdê bixe, ev rejîm wê bi saxî û silametî dewam bikin. Lê belê "kirineke din" a herî piçûk weke xweşewitandina ciwanekî, dibe ku têrê bike ku civakeke sihê li pişta serîhildanê çeper bigire, serê pêşî li deveran û herêmî û bike ku rejîm di nav şermê de bi lezeke hişê mirov bisekinîne, ji hev bikeve.

Bandora tevgera tûnisî ya li ser cîhana ereb wê girêdayî jêhatîbûna wê ya demokratîkkirina welêt be. Heke demokrasî xwe bi rêxistin bike, em ê bi îhtîmaleke mezin şahidîyê li belavbûna wê bikin, bi taybetî jî li Mexrebê. Daxwazên gel wê pê re zêde bibin, heta ku bigihin daxwaza pirrengîbûn û tevlîbûna siyasî. Heke bi bin keve, rejîmên otorîter wê hêzdartir bibin û berdêla wê jî wê bêhêvîtîya gelan be: bibe sedema kaosê jî, piranîya rejîmên ereb hemin ya duyemîn tercîh dikin.

### Du senaryo. Gelo rejîmên ereb wê kîjanê hilbijêrin?

Em dikarin li du senaryoyan bifikirin: yan rejîmên ereb wê guh bidin daxwazên gelên xwe û dest pê bikin ku di warê siyasî de xwe vekin; yan jî berdêla wê çi dibe bila bibe, bêyî ku bersivê bidin daxwaza beşdarîya siyasî ya welatîyên xwe, ew ê hewl bidin desthilatdarîya xwe biparêzin.

Heke îhtîmala pêşî pêk were, li ser rê wê gelek kemîn vedayî bin. Piştî bi gelek dehsalên girtîbûn û zordarîyê, rejîmên ereb divê ya rastî hêdî hêdî pêşîyê li xwe vekin da ku pêşîyê li şokeke ji hember ya ku wê ber bi hilweşîna wan ve bibe, bigirin. Mirov nemana hêvîyên gel li ber çavan bigire, hingê pêşîlêvekirina wan a demokratîk divê têra xwe jidil be, da ku weke êmekî xapandinê neyê dîtin û divê têra xwe pêşverû be da ku pergala siyasî werneke nav bahozên şoreşgerî. Dîsa jî heke jîrbûn û hevrikîya elîteke siyasî nebe ya ku wê ne îstîqrarê û ne jî pêdivîya lezgîn a bi demokrasîyê bi gorî neke, guhertinên hêdî hêdî jî nikarin pêk werin. Gelo kapasîteya rejîmên heyî heye ku ji elîteke bi vî rengî alîkarîyê bixwazin û têra xwe hêzê bidinê da ku erka xwe ya pêşîlêvekirinê bi cih bîne, ev yek gumanbar e.

Ya dimîne, çareserîya girtîbûna siyasî ye. Rejîmên otorîter ên erebên ku ders ji tişta li Tûnisê qewimî girtin, hewl didin sedemên yekser ên serîhildanê bê tesîr bikin, nexasim bi şerê li dijî buhabûna zad û qûtên ku pêdivîya sereke ne (nan, şekir, goşt, hêk û hwd.). Paşê ew bi xurtkirina şarezayîya sazîyên xwe yên ewlekarîyê û îstîxbaratê dadikevin.

Mînaka Tûnisê nîşan dide ku qelsîyekê xwe di pergala ragihandinê, Înternetê de da der. Înternet ji bo muxalifên ku bi riya YouTube, Twitter, Facebook û hwd. bi hev re danûstandin, weke stargehekê bû. Sîstema zordariyê ya tûnisî jî derb ji hevkarîyeke xirab a di navbera ast û qonaxên xwe yên cihê de (polîs, îstixbarat, general û artêş) xwar. Rejîmên ereb êdî îlhamê ji modela îranî ya tepisandina tevgerên civakî digirin û fêr dibin Înternetê parzûn bikin û heke pêwîst be wê bi tevahî asê bikin. Di rewşên pir radîkal de yan rojnamevanên biyanî der sînor dikin yan jî wan mecbûr dikin ku li devereke diyarkirî bimînin. Li gor modela bêsîcên (3) li Îranê, bi dabeşkirina li taxên ji hev cihê û danîna nuqteyên stratejîk ên ku bi kêrî destwerdanên herêmî bên, ew hewl didin serîhildanên li bajaran bifetisînin. Kurt û kurmancî, di rewşeke bi vî rengî de em ê şahidîyê li "hemdembûn" û "berfirehbûneke" sazîyên zordestîyê bikin. Lê bi van navgînan nikarin pêşîyê li şêweyên nû yên çalakîyên kolektîv bigirin ku tevgerên civakî yên biqewimin, dikarin wan derxin holê. Çareserîyên

www.arsivakurd.org

tepisandin û zordarîyê di rewşa herî baş de jî bi tenê di dema kurt de bi kêr tên.

Erê li rojava sempatîyeke mezin ji bo Tevgera Kesk a li Îranê hebû, lê ji bo serîhildana li Tûnisê tiştekî bi vî rengî nebû. Heta, vê serîhildanê rê li ber reaksîyonên pêşîya xwe nabînin û bi tevahî ne di cih de jî vekir. Nexasim jî li Fransayê, welatê ku heta dawîyê dilsozê dîktatorîya Bin Elî ma. Di vê navê de Waşîngton jî paytextên din ên rojava jî, bi nîvdilî di bin lêvan re destek da serîhildanê. Ango bi qasî misqalekê jî daxwaza Rojava ya ji bo demokrasîya li welatên ereban nîne, ev dîsa jî retorîkek e ku carinan der dikeve pêş. Tevgera Tûnisê dikare bibe derfet û munasebeta guhertina helwêstê, nemaze li Parîsê.

Cîhana ereb dek û dolabên bi dîktatoran re weke dewama kolonîkirin û împeryalîzmê bi riyên din dibîne. Li hemberî vê, li vê cîhana ereb palpiştîya demokratîkbûyînê weke pîvaneke rêzgirtina ji bo civakên rejîmên ne rewa zordestîyê li wan dikin, tê dîtin. Çi tirsa ji îslamperestîya tundrew û çi jî ji ber berjewendîyan, Rojava ji kerê xwe nayê xwarê û piştgirîya tevgerên bi vî rengî nake, lê belê qet nebe dikare pozîsyoneke bêalîtîya niyetbaş biparêze.


* Endamê Desteya Şêwirmendiyê yê Human Rights Watchê, li Freeman Spogli Institute for International Studies ya zanîngeha Stanfordê (Kalîforniyayê) lêkolîner.

1 Tevgera ronesansa çandî û siyasî ya ku dawîya sedsala 19ê derkete holê. Ew daxwaza reformkirina Îslamê û veguherîna civakê dixe nav hev. Bixwîne; Anne-Laure Dupont, "Nahda, la renaissance arabe" ["Nahda, renesansa ereb"], *Manière de voir*, hejmar 106, tebax-îlon 2009

2 Hittîst (ji *hitt* ji gotina "dîwar" a bi erebî tê): bêkarên ku tevahîya rojê pişta xwe didin dîwarekî û rûdinin

3 Bêsic dildarên ciwan ên artêşa pasdaran (Artêşa Muhafizên Şoreşa Îslamî) in

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



FEWZÎ BILGE: **Payîz VI**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 67 x 34 cm

## TÛNIS

# Çavdêrîyên sefîrekî

ERIC ROULEAU *

Eric Rouleau tîrmeha sala 1985'ê weke sefîrê Franseyê yê Tûnisê hat dest nîşan kirin. Wezîfedarkirina wî pêrgî demekê hat ku li Parîsê, der barê warisê damezrênerê komarê Hebîb Bûrgîba de ya li gorî baweriyê "di demeke nêz de wê pêk bihata" fikar dihatin îfade kirin.

Dema ku li Parîsê der bareyê weraseta damezirînerê komarê Hebîb Bûrgîba de tirs û fikar dihatin îfade kirin, ya ku weke "nêzîk dibe" dihat dîtin, Eric Rouleau tîrmeha sala 1985ê weke sefîrê Fransayê hat dest nîşan kirin.

Wezîfeya min ji hin alîyan ve gelekî dişibîya lêkolîneke li welatekî ku ji riya xwe derketibû. Bi gelek rasthatinan ez pêrgî serokê Bûrgîba hatim; rengê ku ji tevahîya erkên xwe razî be, pê nediket. Di dema hevdîtinên me de, bi axaftinên xwe yên kêm dîplomatîk û heta hevnegirtî jî, wî wezîrê xwe yê karê derve Becî Seîd Essebsî dixiste rewşeke teng û nexweş, ji ber vê yekê wezîr neçar ma paşê doza lêbihurînê bike. Serokê fermandarîya giştî ya artêşa fransî general Maurice Schmitt, di çarçoveya serdaneke navneteweyî ya nezaketê de çûbû Tûnisê. Di dema serdanê de beriya silavê bide Schmitt û destê wî bigre, Bûrgîba rabû ser xwe, helbesteke dirêj a Victor Hugo xwend. Piştre jî, monologa wî hat. Di vê monologê de, wî ji bîr kir ku behsa mijara wezîfeya mêvanê xwe bike, yê ku dîsa jî ewlekarîya neteweyî derxiste pêş.

Rojê bi tenê çend saetan li ser hişê xwe bû û hevsarê dewleta ew serokê wê bû, ne di destê wî de bû. Ji hikûmeta xwe –Muhemmed Mzalî hikûmet bi rê ve dibir– ne bêhtir. Hikûmet bixwe dabeşî ser çend klanên hevrikên hev bûbû. Serokwezîr piranîya dema xwe bi parastina îmaja xwe ya biqîmet derbas dikir; armanca wî ya diyar jî ew bû ku li desthilatdarîyê şûna Bûrgîba bigre, vê yekê dikir ku li qesra Kartacayê diran werin sîqirandin. Birazîya Bûrgîba bixwe ya ku li ser wî xwedî bandoreke diyarker bû, heyranîya xwe ya bi rengekî xurt meyla wê ya ji general Zeynelabidîn bin Elî re nîşan dida, venedişart; wê demê tu kesî nedianî hişê xwe ku ew ê ji bo wî bibe pêlpêlka ber bi desthilatdarîyê ve û bi vî rengî destekê bide ji desthilatdarîyê xistina apê xwe.

Di salên 1985–1986ê de general bin Elî yê ku pêşî bû wezîrê karê derve, piştre wezîrê karê hundir, ji bo fransîyan mamikek bû. Bi gelek behaneyên cihêreng wî red kir ku kesatîyên girîng ên fransî bibîne, di nav van de wezîr Edith Cresson û Pierre Beregovoy -ya ku mirovan bêhtir matmayî dihêle– û serokê beşa dijsîxurîyê ango Midûriyeta Giştî ya Ewlekarîya Derve (DGSE, tîpên destpêkê yên navê wê yê bi fransî ne) GeneralRené Imbot jî hebûn. Dema ku ateşeyê hêzên çekdar ê sefaretê Albay (paşê dibû general) Yvan de Lignières ji min re got, bin Elî bi hefteyan wî boykot dike, lê belê gelek caran serokê buroya Tûnisê yê Central Intelligence Agency (CIA) dike mêvan, êdî em gihiştibûn asta herî jor. Xwendekarên berê yên Saint-Cyr'ê (1) ya rastî, samîmî bi peyva 'tu' xîtabî hev dikirin û adeta wan bû ku behsa berjewendîyên hevpar bikin. Yvan de Lignieres gaullîstekî çepgir bû, ji bo kirinên xwe yên eskerî yên di şerê li dijî Rêxistina Çekdarî ya Nepenî (RÇN) li Cezayîrê hatibû xelat kirin, bi erebîya Tûnisê bê aksan diaxivî, ji dilsozîya bi welatê lê ji dayikbûyî bêhtir bi adilbûna xwe navdar bû. Hemin, bi rengê telegrafeke nepenî û ji hejmareke bi sînor a rayedarên payebilind ên Quai D'Orsay û Elysee (2) re, ev agahî ji Parîsê re hatin şandin.

Nakokî li sir û razê zêde bû: bin Elî ez dikirim mêvanê xwe û bi tenê em her du hebûn. Hevdîtinên me para bêhtir li ser firotina pergalên ragihandinê yên herî pêşketî, yên ji bo Muhafizên Neteweyî bûn. Ji bo fînansmana kirîna van pergalan, kredîyên merdane yên dewleta Fransayê amade bûn. Di vê navê de serokwezîr Mzalî bi awayekî sîstematîk li dijî vê kirînê bû. Wî ji min re digot, ev yek wê li ser budceya neteweyî bibe barekî giran. Li gorî agahîyên me, ev bi tenê behaneyek bû ; serokwezîrî bawerî bi daxwazên siyasî yên wezîrê xwe yê karê hundir nedianî.

Rast e ku karîyera wezîrê karê hundir, bawerîya endamên sivîl ên hikûmetê bi xwe nedianî. Ew weke "polîsê super" ê xeddar navdar e, ku serîhildanên ji ber birçîbûnê yên sala 1984ê, herweha gelek xwepêşandanên nerazîbûnê yên karker û xwendekaran di nav xwînê de tepisandiye. Li dibistaneke mezin a îstîxbaratê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwendiye, heta asta ku mirov karibe nave nexweşîyê lê bike, gumanê ji mirovan dibe; dihat zanîn ku wî li ser her tiştî, herkes deq dikir û agahî kom dikirin.

Di dema hevdîtineke me de bi rengekî ne guncaw, wî sê hêmanên dibe ku rejîmê bê î stîqrar bikin, jimartin: rewşa zêde xirab a civakî, tengezarîya bi Lîbyaya Qedafî re, "tehlûkeya îslamî" ya ku li ber çavên wî ya herî bi tehlûke bû. Wî ta bi derzîyê ve kir û got, tevgera Reşîd Xennûşî sûbayên ciwan jî di nav de, di nav her derdorê de ye. Bi awayekî şanogerane wî pê li bişkoka amûrekê kir ku di cih de lîsteyeke bêdawî ya navan derxist. Wî ev lîste weke lîsteya gumanbarên ku timî di bin çavdêrîyê de ne, bi nav kir. Bin Elî yê muhendisê agahdarîyê, dildarê teknolojîyê, ji bo armancên polîsîye, wê dev ji bikaranîna vê zanista muameleya bi agahîyan re, bernedaya.

Hemin, wî Xennûşîyê ku bi aweyekî fermî garantî dabû hikûmetê ku ew ê tu carî şîddetê bi kar neyîne, dişopand. Encama wî ji vê yekê derxistî ew bû ku divê ew nîzama siyasî derxe pêş, ango bi rengekî din û cidîtir, lewma wî his dikir ku ji wî nayê ku bêyî xema wî be, li "belavbûna bi lez" a tevgera îslamî temaşe bike. Ez pê re hemfikir nebûm, lewma agahîyên di destê sefaretê de û fikra bisporên li Parîsê, her duyan îşaret pê dikir ku mezinbûna tevgera îslamperest, ya rastî, hê jê dûr bû ku ji bo rejîmê tehlûkeyek be. Wekî din, du salan piştî ku warisê Bûrgîba bû desthilatdar, sala 1989ê hilbijartinên parlemanê yên nisbî azad pêk hatin. Di van hilbijartinan de partîya îslamperest % 14ê dengan bi dest xist. Vê yekê pêşî li bin Eli negirt ku partîyê fesih bike û bi hezaran sempatîzanên wê têxe zindanan. Wê gelek ji van sempatîzanan di êşkenceyê de bimirana. Wî her dewam kir li ser tehlûkeya îslamperest biaxive. Ev yek bi kêrî wî hat ku hêzên rojhilatî û piranîya dewletên ereb piştgirîyê bidinê. Vê jî kir ku, laîk jî tê de, ji bo tepisandina tevahîya muxalefetê, ew heman stratejîyê bide ber xwe.

Xennûşî ew zilamê ku propagandaya tûnisî nîşan dida, nebû. Min ew berî û piştî mişextbûna wî ya li Londdonê ya 1990ê dît. Min tespît kir ku "Şêx" –ji ber doktoraya wî li Sorbonneyê ya di teolojîyê de ew hêjayî vî sifetî hatiye dîtin– bawermendekî dilsoz e, îslameke azadker ya ku dikare dadê û sihhetê ji tevahîya welatîyan re misoger bike, qebûl dike. Lê belê profesorê filozofîyê fikrên xwe bi hesasîyeteke aqilmend li ser wan derdibirî. Bin Elî ev fikir, şexsî, weke "gumanbar" dinirxandin. Bi hemdembûna fikra xwe û qebûlkirina civakeke pirreng -ya ku dikir ew ji bo otokrasîyên heyî bi tehlûketir be, lewra wî pesnê bikaranîna şiddetê bidaya wê evqasî bi tehlûke nehata dîtin-, ew ji birêvebirên din ên îslamperest ên cîhana ereb, cihê bû.

Di dema hevdîtineke dirêj de ya ku min hezîrana 1996ê li paytexta Ingilîstanê (Fransayê red kir mafê penaberîya siyasî bidiyê) pê re kir, wî ji min re rave kir ku bikaranîna şiddetê "tesîreke berepaş dike" çawa ku li deverên din jî ev yek hate pişt rast kirin. Ji hingê ve wî kadroyên partîya xwe yên ku pesnê êrişan didin ku armanca wan lawazkirina rejîma bin Elî ye, ji partîyê derxistin. Ew xwe nêzî wan tevgeran dibîne ku bi serketî tercîha cihgirtina di nav jiyana sîyasî, parleman û heta hikûmetên cîhana ereb de bikin. Riya dayî ber xwe ya "îslamo-demokratên" tirk tîne bîra mirovan, ên ku rêzê ji sîstema laîk a Mustafa Kemal sazkirî re digrin, û bi ser ketin ku bi riya parlemanê bibin desthilatdar. Xennûşî bi rêk û pêk tevahîya êrişên terorîstî yên tevgerên din ên navê îslamîbûnê li xwe dikin, şermezar dike. Ji hingê ve ji bo min normal bû ku di dema erka xwe ya dîplomatîk a li Tûnisê de ez weke muxalifên din ên Tûnisê muameleyê pê re bikim. Min navê wî li lîsteya navên mêvanên resepsîyonên sefaretê zêde dikir, ya xuyayî jî ew bû ku pir bi dilê wî bû di van resepsîyonan de hazir be. Vî tiştê nedîtî, gelek kes şok kirin.

Ev qutbûna lihevneker tenya sedema xirabûna misêwa ya têkilîyên min ên bi wezîrê karê hundir ê wê demê re bû. Roja ku ez ê bi temamî ji Tûnisê veqetiyama, di dema serdaneke nezaketê ya min dayî wî de, hê nû wî bi nerazîbûneke diyar a ku di nav atmosferekê ne li cih de hatî daqurtandin, ji min pirsî ka çima ez wî weke sîxurekî CIAyê yê zêde meyldar dibînim. Wî gotinên xwe hema hema gotin bi gotin ji ber telegrafên nepenî yên ku min ji Quai d'Orsayê re şandî, girtibûn.... Ango Sefîr jî ji endamên tevna wî ya sîxurîyê xilas nebûbû.

* Rojnamevan, kevnesefîr

1 Jêrenota wergêr: Dibistana artêşa fransî ya ji bo perwerdekirina femandaran

2 Jêrenota wergêr: Quai d'Orsay devera ku wezareta karê derve lê ye û Elysée jî cihê qesra serokkomar e

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Serîhildan û Tora Berxwedanê li Cezayirê

# Cezayir: Dewlet, civak, nakokîyên welatekî

Kader A. Abderrahim *

Serîhildanên li Tûnisê, di rojname û nûçeyan de, ji bo serîhildanên ku Cezayir jî hejand, cihekî piçûk hişt. Li wê derê, êdî welatî bêyî dudilîyê seferber dibin da ku dengê xwe bidin bihîstin: Sala 2010ê bi tenê Midurîyeta Cendirmeyan a Neteweyî 11500 pevçûn, xwepêşandanên giştî an jî kombûnên li çarhêlên welêt jimartine.

Sala 2011ê, digel bicihanîna tevdîrên bacê yên ji bo kêmkirina aborîya nefermî, dest pê kir. Heta niha, şirketan bi tenê ji bo vegerandina *Baca li ser Nirxê Zêdekirî*, fatûra dixwestin. Lê qanûnên nû, ferd jî di nav de vê yekê li ser herkesî ferz dikin. Wê jî rê da ku fiyeta berhemên pir pêwîst ên weke rûn, şekir an ard, yekser pir bilind bibe -rabûna fiyetan ya li ser bazara dinyayî jî li vê bilindbûnê zêde bû.

Wekî din, hikûmetê biryar da ku ji niha û pê ve, dê pareyê hemû danûstandinên ji 500 000 dînaran (nêzî 5 100 euroyî) bêhtir bi riya çekê bê dayîn. Wê, ji bo ku livên diravî bêhtir di bin çavan re derbas bike û rêjeya vegerîna aîdatên civakî û bacan bi giştî bilind bibe, ev gav avêtiye.


> Beriya Sîdî Bûzîd bi xwe jî, li paytext Cezayîrê li dijî zêdebûna bihayan serhildan çêbûn. Ev serhildan him nîşana xirabbûna asta jiyanê û him jî nemana baweriya bi elîtan e.

Lê ji bo xelkî, ku jixwe di bin şert û mercên jiyanê yên dijwar de ye (destheqa mehane ya navincî 15 000 dînar, yanî 153,50 euro ye), bi yekcarî encameke din ji van qeraran derket: zêdebûneke mezin a fiyetan (weke mînak, buhayê şêkir % 30 zêde bû). Ji bo torên ku bazara paralel di destê wan de ye, biryarên hikûmetê dibin sedema zirarên fînansî yên ku nayên texmîn kirin. Lihevbûna reaksîyonan jî ji wir tê. Ji 4ê heta 10ê kanûna paşî, xwepêşandanên aloz li bajarên cihê yên welêt rû dan, pir caran jî di navbera millet û polîs de şer derket.

Careke din, biryardêran hizra civakê nekir û bi awayekî zalimane gavên xwe avêtin, bêyî ku bi torên hedefgirtî mijûl bibin an jî tercihên xwe rave bikin -digel ku hin ji wan tercihan, weke pêwîstîya dîyarkirina hemû xebatkaran (li gorî Yekîtîya Giştî ya Xebatkarên Cezayirî (UGTA), heta niha, mîlyonek patron vê yekê nakin), dikarin piştgirîyê xurt bikin jî. Hin aborînasan pêşniyaz kiribû ku şerê li dijî vê aborîya nefermî gav bi gav bê meşandin û fikirên pêşxistina toreke belavbûnê û pergaleke bankayî ya rasteqîn parastibûn. Kesî dengê wan nebihîst.

### Sazkirina civaka bertîlxurîyê

Bersiv bi lez û bez hat: Çend saet piştî 4ê kanûna paşî, serîhildan li tevahîya welêt belav bûn û bûn sedema pêleke şiddetê û qurbanên wê: bi kêmanî sê kes mirin û çar sedên din birîndar bûn.



Fewzî Bilge: **Montaj I**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 25 x 35 cm

Torên neqanûnî yên bazirganan, bi zimanê rojane *trabendo*, xwedanên hêzeke fînansî ya xurt in. Ew di salên 1980yê de piştî ketina xurt a kûrên neftê, derketin holê û ji tuneyîyên li welêt sûd wergirtin. Ev jî bû destpêka trafîkeke berhemên ewropî, ku li bazara reş belav dibin. Îroj, trabendo tevneke pîrhebokê ya nefermî û berfireh e ku bi hezaran ciwanan dixebitîne; ev ciwanên han jî, li dijî polîsan şer dikin, heta ku qanûn betal bibin. Rakirina Baca li ser Nirxê Zêdekirî (BNZ) mafên gumrikê û baca li ser qezencên fîrmayan heta tebaxa bê û pesendkirina qanûneke fînansî ya temamker, taloq bûne.

Ev dijberî careke din tesîra torên veşartî dide xuya kirin: Ew vê civaka ku divê li çareya serê xwe binêre, saz dikin û her reformek jî ji bo kesên xizan, weke jidestdana feydeyan xuya ye; herçî kontrolkerên vê bertîlxurîya tevnî jî, hinek ji bandordarîya xwe jî berze dikin.

Ev şiddet nîşana tevgereke dualî ye: guherînên kûr -aborî û civakî- yên dehsalên dawîyê û nebûna rewabûna elîtên siyasî. Diviyabû dewletê berjewendîyên giştî biparastana, lê helwêsta desthilatdaran bixwe van berjewendiyan pûç dike; lewre jî, gel van nirxên giştî napejirîne.

Di dîrokê re, dewlet dor bi dor weke sazîyeke hegemonîk, monopolîstîk, zilmkar, parêzvan an jî bi adanê xuya bû. Lê ew niha ji van sîfetên rastî an xeyalî daket. Weke encam, piranîya cezayirîyan li karên giştî naaliqin; beşdarîya kêm a li dengdanên neteweyî an herêmî yên dehsala bihurî jî vê yekê piştrast dike.

Ev bi dehan sal in ku ev diyarde her bilind dibe: Di serê her cezayirîyekê/î de diyar e ku divê ew ji riya adetî derkeve û rêbazên xiraker bi kar bîne da ku bigihîje armancên xwe yên ferdî. Ev yek di encamê de bû sedema jihevveqetîna rêxistina fermî ya civakê û dînamîzma civakî.

Ev jî bû sedema girêdana torên şexsî, ku ji bo parastina berjewendîyên yekser têkilîyan deynin. Ev girêdan di hemû beşên civakê de -perwerdekar, bazirgan, leşker an memûran- hene û li ser esasê "tu çi bixî kewarê, ew ê bê xwarê" çêdibin. Bi riya wan, mirov dikare xizmetekê bistîne an jî ji cezayan bifilite.

Ev "civaka kenaran", encama pevajoyeke dirêj a xirabûnê ye, ku ji dema serxwebûnê ve dest pê kir. Divê bê gotin ku, li derveyî şerê rizgarîyê, Cezayîr tu caran nebû xwedana pergaleke giştî ku bikaribe neteweyê bi rê ve bibe, lê ew hertim weha bi rêxistî bû ku welatî di vê pergalê de weke elementekî/e xeter hat hesibandin. Ji ber ku riyên hiqûqî nikarin ji pêwîstîyên civakî re bibin bersiv, xelk bi jîrekîya bêhempa qanûnan ditewîne û dewletê dixapîne. Vê adeta civakî, terzekî jiyanê ê xurt bi cih kir. Bertîlxwarin li ber çavên xelkê weke xizmetkirinê xuya ye.

### Ber bi Perestroykaya mexribî ve

Welatî di her derfetekê de kiryarên *duwla*yê (dewletê) rexne dikin, lê têkilîya di navbera rêbazên xiraker -yên ku ji ber helwêsta wan derdikevin holê- û birêvebirîya rayedaran de, li ber çavan nagirin. Dijberîya di navbera dewlet û gelî de, tenê paşê ku dirûvekî siyasî girt û îslamperest derketin holê, hat dîtin. Lê bi rastî, ew pir kevin e û li gor rewşê bi awayên cihê xwe dide der.

Paradoksa Cezayîrê ev e ku welat zengîn e, lê civak, her ku diçe feqîr dibe. Ji ber vê, helwêstên ferdî neguherîn, sadiqî û fedakarî radibe û yekîtîya neteweyî dixe xeterê. Heta salên 1990ê, "mînaka cezayîrî" xwe dispart sê rêbazên sereke: perwerde ji herkesî re, belaşbûna pergala tenduristîyê û çi bigire misogerîya derfeta kar di şirketên sektora dewletî de. Lê rewşa şerê li dijî komên çekdar ên îslamî û birînên ji siyasetên sererastkirina strukturel, ev pergal têk bir. Aniha parsekî û fihûş berbelav in. Nexweşîyên weke jana zirav, tîfo an jî koleraye, bi taybetî piştî erdheja gulana 2003ê li Bûmerdas a li rojhilatê Cezayîrê, ji nû ve derketin holê. Bi giştî, nebûna derzîyan û rewşa beredayî ya xizmetên tenduristîyê, bûn sedema ji nû ve peydabûna navendên nexweşîyên vegir, yên ku berê hatibûn tune kirin, yan kontrol kirin. Xelk jî her ku diçe bêhtir, bi zorê xwe li ber vê rewşê radigire.

Ji îqtîdarê ketina Zeynelabidîn bin Elî [serokê Tûnisê yê berê] nîşana vê yekê ye ku dîktatorî, bi xêra pêwendîyên digel navber û mişterîyên xwe ên li nav civakê, zîndî dimînin. Bi qutbûna van pêwendîyan, desthilata tûnisî jî hilweşiya. Lê belê rewşa her du welatan ne mîna hev in. Helbet, ew di warê birêvebirina zalimane ya civakê de hevpar in -weke hemû welatên dinyaya ereb jî. Li Cezayîrê, zemînên azadîyê ku şoreşa 1988ê bi dest xistibûn, ji ber têkoşîna li dijî îslamîyan winda bûn. Şerên xwînrêj ên salên 1990ê jî "demokrat" bela-wela kirin. Vî şerê birakujîyê civak ji hev xist û partî û komeleyên ku piştgirî dane perçiqandina dij-îslamperestîyê marjînalîze bûn. Li hemberî Enîya Rizgarîya Neteweyî (FLN) û Kombûna Neteweyî ya Demokratîk (RND), zemînê siyasî vala bû. Ji bilî Enîya Hêzên Sosyalîst (FFS), hema bêje, qet muxalefeteke li ser lingan ku dê bikaribe daxwazên gelî bide bihîstin, nemaye.

Heta ku daxwazên xwepêşandêran li zemînê siyasî deng venedin, serîhildanên demkî ji desthilatê re nabin pirsgirêk. Hevdemîya nerazîbûnên civakî nikare ji vê îqtîdarê re, ya ku heta niha tim bi awayekî hovane serîhildanên gelî perçiqandin, bibe talûke. Lê eger ew ê bikeve xeterê jî, gelo dê artêş li hemberî meyla azadîyê û edaletê çawa tev bigere? Tercîha rayedarên cezayîrî çi dibe bila bibe, divê muxalefet bi lez û bez daxwazên gelî yên tevlihev, siyasî bike. Dibe ku wext bigire. Lê belê, perspektîva perestroykayeke mexrebî li asoyê hiltê.

* Lêkolînêrê Enstîtuya Têkilîyên Navneteweyî û Stratejîk (IRIS), li Parîsê, nivîskarê Indépendance comme seul but [Armanca Yekane: Serxwebûn] Paris Méditerranée, Parîs, nîsan 2008.

1 "Le gouvernement a-t-il saisi lemessage de la rue ? (Gelo hikûmetê peyama ji kolanan hatî girt?)", Liberté, Cezayîr, 27'ê kanûna 2010'ê

2 Daxuyaniya sekreterê giştî yê UGTA'yê dayî bernameya nûçeyan a radyoya Kanala 3'yê, 10'ê çileyê 2011'ê

3 Kurteya peyva bi îtalî contrabbando ("qaçaxçî")

4 Bi erebî dewlet, bi maneyeke berfirehtir tevahiya sembolên dewletê jî

5 Ev bernameyên sererastkirina strukturel (avahiyê) di gulana 1989'ê, hezîrana 1991'ê û gulana 1993'ê bi Bankeya Cîhanê û Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) re hatin pêşxistin

6 Di çiriya pêşî ya 1988'ê de ji ber şertên jiyanê ên kambax, ciwan daketin qad û kolanan. Di encama tepisandinê de (li gorî daneyên fermî) sed û heftêûşeş kes mirin

Wergera ji fransî: Simko Destan

TÛNIS

# Di neynika şoreşa tûnisî re Misir

SARAH BEN NEFISSA *

Her kesî weha bawer dikir ku demokratîkbûna dinyaya ereb, herêma dawî ya cîhanê ku ji xirakirina dîwarê Berlînê ve di warê siyasî de pêşketinên mezin lê çênebûbûn, dê ji Misirê dest pê bike. Avakirina tevgera Kefayê, sala 2005ê, ku li ser daxwazên demokratîk û redkirina derbasbûna desthilatê bo kurê serokê niha Husnî Mubarek, radiwestiya, her wekî têketina leyistika siyasî, sala 2009ê, ya kevnesekreterê giştî yê Dezgeha Navneteweyî ya ji bo Enerjiya Atomî (IAEA) Mohamed El-Baradai, weke nîşanên pêşî yên ve yekê dihatin dîtin. Lê weha çênebû.

### Desthilata Tûnisê çima qulibî, lê ne ya Qahîreyê?

Desthilata Tûnisê çima qulibî, lê ne ya Qahîreyê? Divê em li ser têkilîya navbera protestoyên civakî û sazûmanên siyasî bisekinin, da ku em wê baştir fêm bikin. Hin kes weha îddia dikin ku ferqa herî mezin a di navbera her du welatan de ew e ku desthilata Zeynelabidîn bin Elî zalimane û polêsane bû. Dibêjin Misir guhertoyeke nermtir û şarezatir a otokrasîyê nîşan dide: azadîya derbirînê heye -di çapemenî, televîzyon û blogan de- û heta mirov dikare çend gavên siyasî jî biavêje û pêşketina bilez a xwepêşandanên civakî jî nîşana vê yekê ye. Hêjayî derbirînê ye ku daxwazên civakî yên derdorên xebatkaran, bi "peyrewa" tevgera siyasî ya 2005ê li hev zêde bûn, lê hîn bêyî ku li zemînê siyasî xwe bide der.

Bi dîtina wan, Tûnis jî "negatîva" vî resmê Misirê ye: serîhildana civakî, ku kokên wê xuya nakin, bi awayekî pir lezgîn ji bo qulibandineke siyasî guherî, tevî -an jî ji ber- perçiqandina xwînrêj ku xwest wê bifetisîne.

Lê belê, rewşa her du welatan jî bi rengekî xerîb mîna hev e. Tu hêza siyasî nikare bi rastî xwedîtîya şoreşa tûnisî bigire ser xwe. Halê Misirê jî eynî ye: hêzên siyasî yên muxalif li gor xwepêşandanên civakî li paş dimînin. Li vî welatî, tevgerên protestoyê di serî de bi leyistikvanên medyayî yên cihê re hevkarîyê dikin, yên ku parvekirina desthilatdarîyê tînin rojevê: bihêlin, guhdarîya xwestekan bikin, pêwîst bibe jî paş ve gavê bavêjin. Lê bi tenê qismî. Lewma, dema protestoyên bi daxwaza xizmet û ekîpmanan ne bi tenê li derdorên karkeran belê her weha li taxên nefermî yên kevîya bajaran (ên mîna bajarên ji tenekeyan = bidonville) bi pêş ketin, -Brayên Misilman (1) jî di nav de – tevahîya çîna siyasî ya misirî matmayî hişt.

Heta nexweşan jî li hemberî kalîteya xirab a xizmetên nexweşxaneyan serî hilda. Lê diyardeyeke nûjen heye. Beşên xelkî yên ku di warê civakî, çandî û siyasî de herî xizan in, êdî bi axaftinên ku ji 2005ê ve li zemînê giştî berbelav dibin û behsa "civaka sîvîl", "demokrasî", "mafên mirovan", "welatinî" û "reformên" siyasî dikin, hesiyane. Retorîka navneteweyî ya serdest jî bi bandor e: leyistikvanên cuda, li nav sinifên jêr jî, lê xwedî derdikevin û wê li gor dilê xwe diguherînin.

### Du awayên tevgera protestoyan

Medyayê jî dengê êşa civakî veda û xwepêşandanên gelî yên pirhejmar dişopîne. Li hemberî girtina tevahîya warên derbirîna siyasî –kilîtkirina hilbijartinên parlemanî yên mijdarê û kanûna pêşî ya 2010ê, ku bi serkeftina digel % 90ê dengan a partîya dewletê, Partîya Neteweyî ya Demokratîk (PND), bi encam bûn jî nîşana vê yekê ye-, medya weke zemînên siyasî yên alternatîv tên pejirandin. Ji ber vê yekê, berî hilbijartinan, rayedaran tevgereke kedîkirina rojname, radyo û televîzyonan dabû dest pê kirin.

Berî vê vegirtina medyayê, tevgerên protestoyê li Misirê bi du awayan bi pêş ketin. Li alîyekî, kiryarên tundrew zêde bûn: girtina riyan, ji bo protestokirina mirinên qezayî yên ji ber tamîrnekirina riyên hin taxan, her wekî tehdîdên xwekuştina di kolanan de, ku piştî întîxara Bouazîzî zêde bûn. Ev alozî li dijî korbûna rejîmê ya li hember kiryarên bi rengekî din bersivek e. Ji ber ku "ne-siyasî" bûn, dilê desthilatê xweş bû û wê êdî bersiv nedida xwestekên ku ji beşên stratejîk dernediketin.

Lê belê, rayedaran piştî rûdanên li Tûnisê, bi awayekî pir lezgîn bertek nîşan da: taloqkirina pesindnameya reforma statuya memûran, xebitîna di warê giştî de, diyarkirina gavên civakparêz û hwd. Her çi desthilatên dînî yên fermî, wan bi bîr xist ku xwekuştin kiryareke şkestina bawerîyê ye -ev ne fikirê mela Youssef Al-Karadhaouî ye, ku li ser televîzyona satelît Al-Jazîrah behsa Bouazîzî jî kiribû.

Pirbûna daxwazên ku li ser esasên nasnameyî an civatî saz dibin jî, taybetmendîya duyem a tevgera civakî ya misirî ye. Bedewîyên Sînayê li hember gavên ewlekarîyê ku ji ber nêzîkatîya Îsraîlê li ser wan tên ferz kirin, derdikevin; xelkê nûbî yê ji şert û mercên jiyana xwe nerazî ji dewletê gazincan dikin û tazmînatên piştî koçbûna wan a di dema avakirina Bendava Bilind a salên 1960ê de ji wan re sozdayî jî dixwazin. Lê xwepêşandanên qiptî -ku piştî teqîna li ber Dêra Îskenderîyeyê, şeva 1ê kanûna paşî ya 2011ê *(r.18 bixwînin)*, rû da-, ji ber rêbazên xwe yên nû, mijarên sereke yên baldarîyê ne.

Li gor analîstên misirî, tevgera civakî û siyasî ya tûnisî "hemdemtir", gihaştetir, siyasîtir e, ji ber ku ew bi piranî encama pêrabûna sinifên perwerdekirî û xwenda bû: ev çînên navîn ku bi zimanê kubar ê mafên mirovan, azadî û demokrasiyê (2) diaxivin. Gelo zimanê "civatî" û "nasnameyî" li Tûnisê ji holê rabû? Bi temamî na, "civatparêzîyeke herêmî" hê jî heye li ba nifûsên ku li paş

> Ji 2005'ê ve Misir şahidiyê li tevgerên protestoyî dike. Tevî tepisandinê jî ji dawîya çileyê ve ev tevger zêde bûn. Birayên Misilman jî di navê de tevahiya çîna siyasî mat û zendegirtî ma.

"mucîzeya tûnisî" ne û bûne pêşengên şoreşê hê jî heye: vê diyardeyê berî ku bigihîje dorbajarên perîşan ên paytext û dawîyê li bulvara Burgîba ya Tûnisê li Gafsayê, Sîdî Bûzîdê, Thalayê, Kasserîneyê û Jendûbayê xwe da der.

### "Îbrîdbûna" rejîmên siyasî

Li Misirê jî, îfadeyên protestoyê pirrengî ne. Zimanê exlaq û olê di tevgerên civakî yên derdorên xizan de bi kar tê, nemaze li taxên nefermî, ji ber ku bi tenê bi vî zimanî dizanin. Li derdorên perwerdekirî mîna yên memûrên bacê an yên mamosteyên lîseyê, zimanê protestoyê şorî edaletê dike û bi israr li ser karaktera sinifî û bi tenê civakî ya doza wan radiweste. Înkarkirina siyasetê, jixwe dide xuya kirin ku ev leyistikvan tê gihîştin ka sînorên kiryarên protestoyî li hemberî desthilata zalimane çi ne.

Herweha, xwepêşandanên ciwanên qiptî piştî teqîna Îskenderîyeyê jî, bêhtir weke derketina ji sînorbûna "civatî" tên fêm kirin, bi mebesta ku "pirsgirêka qiptî" têxin rojeva gelemperî ya neteweyî. Digel dirûşma "em [rêzgirtinê ji] mafên xwe [re] dixwazin", ku ji bo wekîlên dewletê tê hildan (3), em zimanê welatîbûnê jî dibihîzin. Li Misirê, daxwazên ji nû ve niqaşkirina şertên yekîtîya neteweyî li ber çavan in. "Civatparêziya" herêmî ya tûnisî jî, xwedîya xwestekeke hevreng e.

Bouazîzî li hember avahîya walîtîya Sîdî Bûzîdê xwe şewitand, û xwepêşandana mezin a 14ê kanûna paşî ya 2011ê li ber wezareta karê hindûr çêbû. Li zemînê protestoyê yê misirî, pêwendîyên digel dewletê jî bi vî rengî ne; ew jî dirûvê çalakîyên rûniştinê, kombûnên li ber wezaretan, walîtîyan an qereqolan digire. Ev taybetmendîya hevpar, girêdana xelkî -di serî de yên herî feqîr- a bi dewleta civakparêz a pişt-serxwebûnê ve radixîne ber çavan, ku ev dewlet di dehsalên dawîn de bi piranî ji hev hat xistin (4).

Lê belê, tevgerên protestoyê yên tûnisî û misirî, bi riya medyayan, ji cîhanê û raya giştî ya navneteweyî re jî peyamên xwe dişînin (5). Ev jî guherîneke girîng e: ev civakên di "globalîzebûnê" gihîştin ku ew êdî girtîyên giregirên ereb nînin û dinyaya derve ne cihê xeterê ye.

Em di serdema "îbrîdbûna" rejîmên siyasî yên li dinyayê de ne -ev teorî dibêje ku çarçoveya globalîzasyonê îmkanên dewletan piçûk dike û xeta di navbera desthilatên zalimane û yên demokratîk de jî ziravtir dike (6) - û xwepêşandanên li her du welatan, îbrîdbûna hevdem a dirûvên kiryarîya giştî û awayên îfadeya siyasî didin xuya kirin. Heta li welatên ereb jî, êdî siyaset ne tenê meseleya sazîyan e. Li Misirê, kilîtkirina zalimane û guherîneke bingehîn a têkilîyên dewlet û civakê li cem hev in (7). Tûnisê jî da xuya kirin ku mesafeya di navbera protestoyên civakî û çînî û protestoyên siyasî de evqas jî dûr nîne.

* Lêkolînera Enstîtuya Lêkolînê ji bo Pêşxistinê (IRD), Yekîtîya Têkel a Lêkolînê (UMR) 201

1 Houssam Tammam û Patrick Haenni, "Les Frères Musulmans égyptiens face à la question sociale: autopsie d'un malaise socio-théologique". ["Birayên Misilman li Hemberî Pirsgirêka Civakî: Tehlîla Nerehetîyeke Civaknasî-olnasî"]. *Etudes et analyses [Lêkolîn û analîz]*, hjm. 20, Institut Religioscope, Freiburg, 2009

2 Amr Choubaki, "Pourquoi les élections 2010 représentent-elles les pires élections que l'Egypte ait connues?" ["Çima Hilbijartinên 2010ê di Dîroka Misirê de yên Herî Xirab Bûn?"], *Al Masry Al Youm*, Qehîre, 2ê kanûna pêşî ya 2010ê

3 Laure Guirguis (rvb.), 2008, Conversions religieuses et mutations politiques. Tares et avatars du communautarisme égyptien [Guherînên Dînî û Guherînên Siyasî. Nerindî û Taybetmendîyên Civatparêzîya Misirî], Editions Non Lieu, Parîs, 2008

4 Myriam Catusse, Blandine Destremau û Eric Verdier (rvb.), *L'Etat face aux débordements du social au Maghreb [Dewlet li Mexrebê li Hemberî Nerazîbûnên Civakê]*, 2010, Parîs, IREMAM/Karthala; Amin Allal, Karine Ben Afla, "Les mouvements protestataires de Gafsa (Tunisie) et Sidi Ifni (Maroc): des mobilisations en faveur du réengagement de l'Etat ou contre l'ordre établi?" [Tevgerên Protestoyê yên Gafsayê (Tûnis) û Sîdî Îfnî (Fas): Çalakîyên ji bo Dîsa Têwerdana Dewletê an li Dijî Rewşa Heyî?"] dê di kovara *Tiers Monde [Dinyaya Sêyemîn]* de biweşe

5 Khadija Mohsen-Finan, *Les Médias en Méditerranée - Nouveaux médias, monde arabe et relations internationales [Medyayên li Deryaya Spî - Medyayên Nû, Dinyaya Ereb û Têkilîyên Navneteweyî]*, Actes Sud, Arles, 2009

6 Michel Camau û Gilles Massardier. (rvb.), *Démocraties et Autoritarismes. Fragmentation et Hybridation des régimes [Demokrasî û Zalimî. Parçebûn û Îbrîdbûna Desthilatan]*, Karthala, Parîs, 2009

7 "Verrouillage autoritaire et mutation générale des rapports entre l'Etat et la société en Egypte" ["Klîtkirina Zalimane û Guherîna Giştî ya Têkiliyên Dewlet û Civakê li Misirê "], di P. Blanc de (rvb.) Egypte : l'éclipse [Têkçûna Misirê]. *Confluences Méditerranée [Hevherikînên Deryaya Spî]*, 2010, (75), r. 137-150

Wergera ji fransî: Simko Destan



FEWZÎ BILGE: **Gulgeş**, Boyaxa rûnî li ser tûwalê, 40 x 30cm

www.arsivakurdi.org

## Swîsre

# Gelo bi rastî jî dawîya sira bankayên swîsreyî tê?

Sébastien Guex *

**Berne di dawiyê de sala 2009'ê razî bû ku saziya bankavaniya nepenî bide ber topan. Lê belê tawîzên wê bi sînor in, û meydana malî ji bo ku bandora wê kêm bibe, zend û bend badane jî.**

Li destpêka 2009ê, ji ber zext û tamdanên welatên sereke yên Yekîtîya Ewropayê û Dewletên Yekbûyî, Rêxistina Hevkarî û Geşedana Aborî (RHGA) piştî ku demeke dirêj li ber xwe da, dawîya dawî biryar da ku gavekê biavêje. RHGAyê gef li Swîsreyê xwar ku navê wê li ser lîsteyeke bihuşta bacê qeyd bike – ku bi vê yekê ev welat wê bi dayîna cezayên mezin re rû bi rû bimaya (1) eger Bernê bi lez û bez qet nebe dwanzdeh peymanên bi navê "backirina cot" (CDI) di ber çav re derbas nekirana. Peymanên mijara gotinê xwe dispêrin prensîba hev-alîkarîya navneteweyî ya ne tenê di warê sextekarîya belgeyî ya bacê, lê herweha revandina bacê de jî.

Qanûnên swîsreyî bi rastî jî cudahîyekê dixin navbera sextekarîya belgeyî ya ji bo nedana bacê -ango bi riya şaşagahîyên belgekirî ku weke sûcekî li dijî qanûnê tê qebûl kirin, xwerizgarkirina ji dana bacê– û revandina bacê, ku bi lêpirsînên besît ên îdarî tê derbas kirin û ji bona destûra rakirina sira bankayê nayê dayîn. Ji ber vê yekê, heta sala 2009ê, miracaatên ji bo hev-alîkarîyê yên ji alîyê dewletên biyanî ve pêşkêşî rayedarên swîsreyî hatine kirin, pir kêm hatine pejirandin, ji ber ku daxwazên wisa ji dîwarên bilind ên sira bankayî dizîvirîn.

Di paralela liv û tevgera RHGAyê de, Dewletên Yekbûyî jî zend û bendên xwe badan. Bi xêra lixwemikurhatinên gerînendeyekî sermayeya Yekîtîya bankayên swîsreyî (UBS), ku keştîya amîral a diravê swîsreyî ye, Waşîngtonê delîlên acizker bi dest xistin: ji gelek salan ve ye, vê bankayê destekeke berbiçav dida mişterîyên xwe yên amerîkî ji bona ku di warê bacdayînê de sextekarîyê bikin. Ji payîza 2008ê û vir ve, dadgerî û bacgerîya amerîkî ji UBSê xwest ku tevahîya daneyên têkildarî hejmareke mezin –bi qasî pêncî û du hezar – a mişterîyên xwe yên ji Dewletên Yekbûyî radestî wan bike.

Li ser mijarê, Bern û Washingtonê hevdu bê minet kirin; demeke dirêj hev birin û anîn, û di heman pêvajoyê de rêvebirîya amerîkî gilîyê Bernê kir, û bi taybetî UBS bi lêpîrsîna qanûnî tehdît kir –ku ev ê muhtemelen bihata wateya îflasa wê. Asoya diravkarî ya Swîsreyê careke din jî di 2008 û 2009ê de ji ber lîsteyên ku hikûmetên alman û fransî bi dest xistin, tarî bû. Ji ber ku li ser wan lîsteyên ji bankayên swîsreyî û lîştenşteinî hatibûn dizîn û ketibûn destên hikûmetên alman û fransî, nav û hesabên bi hezaran mişterîyên biyanî yên li welatên xwe sextekarîya bacê kiribûn, hebûn.

Piştî rûbirûmayîna bi gelek zextan re, rayedaran dawiya dawî paş ve gav avêtin. Di berdêla rawestandina prosedurên li dijî UBSê de, wan qebûl kir ku di du qonaxên li pey hev de –yek jê di sibata 2009ê û ya din di havîna 2010ê de–, daneyên têkildarî çar hezar û pênc sed mişterîyên bankayê bidin bacgerîya amerîkî. Di derbareyê CDIyê de jî, Bernê di adara 2009ê de daxwaza RHGAyê qebûl kir, bi şertê ku Rêxistina Hevkarîya Geşedana Aborî dawîyê li, gefên xwe yên "nivîsandina navê Konfederasyonê li ser lîsteya reş a bihuştên bacê" bîne. Ji hingê ve, Konfederasyon ji bo guftûgokirina peymanên nû yên ku cudahîya navbera sextekarîya belgeyî ya bacê û revandina bacê ji holê radikin, bi qasî sî dewletan re kete nava danûstandinan. Bi vî awayî, nav û dengê destwernedana li sira bankayên swîsreyî, ya ku demeke ewçend dirêj bûbû sembola diravkarîya zexim a swîsreyî, derbeke pir dijwar xwar.

### Tawîzên swîsrîyan tên wateya ku sira bankayan êdî çû ser dilovaniya xwe?

Ev êriş helbet ne ya yekemîn bû (li nivîsa di qutîyê de binêrin). Ji destpêka sedsala XXemîn ve -serdema ku jê û ber bi vir ve derdorên sermayedar û rayedarên Swîsreyê bi coşeke mezin ketine nava hewldanê ji bo ku vî welatî veguherînin ser bihuşta bacê û ji bo ku vê yekê bikin ji alîyekî ve giranî dan xweşbînîya di warê bacê de, ji alîyekî din ve jî sira bankayî bi awayê herî têkûz zexim kirin– êriş hema hema qet ranewestiyan. Tevî vê yekê jî, heta 2009ê bi helwesteke pir zexim a bi tesîr Bernê karî li ber xwe bide. Sekreterê giştî yê RHGAyê ev rewş bi awayê xwe dest nîşan kir gava di çileya 2010ê de daxuyaniyeke weha da: "Di deh mehên dawîyê de me ji dehan salan bêhtir tişt bi dest xistin (2)"

Mezinbûna paşvegavavêtina Swîsreyê bi kombînezona çar hêmanan dikare were ravekirin. Pêşî, bi buhrana kûr a diravî û bankayî ya ku tesîr li tevahîya dewletên pîşesaz kir, Konfederasyon di heman demê de bi êrişa hêzên sereke yên cîhanê re rû bi rû ma û nekarî dijberên xwe ji hev parçe bike.

Hêmana duyemîn UBS ye; dezgeha pêşî ya Swîsreyê, ku bi tena serê xwe xwedî giranîya nêzî % 40ê tevahîya bîlançoya bankayî ye, û bacgerîya amerîkî ew di karûbarê destekdayîna sextekarîyên bacê de li ser sûc girt. Divê li vê rewşê were zêde kirin ku di 2008-2009ê de UBS li ber hilweşînê bû: ew bi xêra alîkarîyeke pir mezin a hêzên gelemperî, bi taybetî jî yên amerîkî hat rizgar kirin. Di vê rewşê de jî wê êdî nikaribû red bikira ku navên hejmareke têra xwe mezin a sextekarên bacê bide Waşîngtonê û di berdêla wê de jî, ji Xezîneya Federal destekeke bi qasî –herî hindik 75 mîlyar dolar (58 mîliyar euro)– ya ku ji reqîbên wê yên amerîkî re jî hatibû pêşkêş kirin, wergire.

Ya herî dawî jî, bi serxweşbûna serkeftinên xwe yên di pevçûnên heta niha de bi dest xistin, sazîya siyasî û bankayî ya swîsreyî wisa qure û bi xwe bawer bû ku şûr simbêlê wê nedibirî. Di adara 2008ê de, şêwirmendê federal ê ji diravgerîyê berpirsiyar, Hans-Rudolf Merz, hê jî diwêriya bibêje: "Ez garantî dikim ku kesên êriş dibin ser sira bankayê, wê rojekê di vî karî de diranên xwe bişkînin (3)" Rayedaran jî, ji ber vê yekê xwe baş amade nekirin, û bi derengî û bi helwesteke tevlihev li dijî zextan derketin.

Gelo tawîzên swîsrîyan tên wateya, weke ku gelek şîrovekaran jî anî ziman, ku sira bankayan êdî çû ser dilovaniya xwe? Herî hindik sê sedem hene ku mirov berevajiya van şîroveyan bifikire. Berî her tiştî, li ser xaka Konfederasyonê, cudahîya di navbera revandin û sextekariya belgeyî ya bacê de hebûna xwe didomîne –bi awayekî din mirov bibêje, dewletên biyanî li vî welatî ji niha û pê ve ji dewleta swîsreyî zêdetir xwedî derfetên lêpîrsînan in! Zehmet e mirov bibêje heta kengê ev rewşa huqûqî ya ecêb wê karibe xwe ragire û bidome. Vê gavê, çepgir jî di nav de heta niha ti derdorê ji bilî rexneyên nerm ti gazinên mezin ji vê rewşê nekirine. Bi rastî jî li "demokrasîya herî qedîm a cîhanê", nêrîna gelemperî ji demeke dirêj ve ye ku, zirarên berbiçav ên digihîjin prensîba wekhevîya li hember qanûnan, bi xweşbînî pêşwazîyê dike û heta teqdîr dike. Pergala bacê ya dihêle ku pênc hezar biyaniyên herî dewlemend ên li Swîsreyê bicîhbûyî hema hema qet bacê nedin, şahidîya vê xweşbîniyê ye.

### Navên mişterîyên bankayan veşartî dimînin

Li alîyê din, Bernê li ber daxwazên navendî ya Yekîtîyê serî netewand: pevguhertina jixweber a agahîyên der bareyê bacê de. Bi CDIyên nû re, dewletên gilîkar, weke prensîp, rewşa revandina bacê jî di nav de wê karibin di derbareyê sextekarîyên bacgerîyê de agahdarîyan bi dest bixin. Li gel vê yekê jî mesafeya di navbera prensîp û heqîqetê de wê mezin be. Rayedarên swîsreyî di eslê xwe de di qanûngerîya pêkanîna van peymanan de, karîn gelek sînor û bendan deynin. Eger rêvebirîya Swîsreyê karibe van bisînorkirinan bixe pratîkê, ku ev ê bimîne li ser danûstaninên ji niha û şûn ve yên hêzan ên di navbera Bernê û welatên gilîkar de, evên dawîyê divê baş zanibin ku ew ê di nêz de, berî ku daxwazên xwe formule jî bikin, dîsa bikevin pey karmendên bankayên swîsreyî (4)…

Axirî, ji bo şer bi dawî bibe hê pir zû ye. Dibe ku derdorên karbidest ên Konfederasyonê neçar bimînin, weke pêwistîya veguherîna danûstandinên hêzên navneteweyî, hin tawîzên din jî bidin; dibe ku, berevajî, ew karibin, eynî mîna berê, valahîyan dagirin. Ew bi her halî bi coş û heyecan vî karî dikin, û ji serkeftinê jî bêpar namînin. Ew bi awayekî çizirîn nava enîya heta niha yekbûyî ya dijberên xwe yên sereke yên ewropî û dawîya dawî, berî demeke nêz derfet bi dest xistin ku li gel hikûmetên alman û brîtanî li ser projeyeke Weqfa Swîsreyî ya Karmendên Bankayan derîyê danûstandinên fermî vekin. Bi kurtî, rayedarên swîsreyî qebûl kirin ku bacê ji pereyên ji alîyê biyaniyan ve radestî bankayên wan tên kirin bibirin û wê bacê li dewletên xwedîyên wan pereyan vegerînin, lê belê sira bankayî biparêzin. Bi gotineke din, derfetê bidin kesên ku pereyên mezin di destê wan de ne, navên wan vêşartî bimînin. Di berdêla vê yekê de, Berlîn û London jî wê nema ji Bernê parvekirina agahîyên di derbareyê bacê de bixwazin.

Bi her halî, gengaşeyên ku ev demeke cîhana diravgerîya swîsreyî li nav hev dixin, efsaneyeke bi dehan salan e li ser zarê herkesî ye, da ku çembereke pîroz li dora parastina sira bankayan were afirandin, dihejînin: efsaneya ku li gor wê eger derbeyek li vê prensîbê bikeve, wê ji bo Konfederasyonê bibe felaket. Di sala 2000ê de, rojnameyeke sereke ya cîhana karsazan a swîsreyî piştrast dikir ku qelsbûna sira bankayan wê "vemayîna pîşesazîya [wê] ya bankayî jî (5)" bike mijara guftûgoyê. Piştî saleke din, lêkolîneke aborînasekî navdar ê swîsreyî, Jean-Christian Lambelet, digihîşt wê encamê ku qelsbûneke wisa karibe bi xwe re "encamên kambax" bîne: dibe ku bi dehan hezar karmend ji karên xwe bê par bimînin, û bivê nevê "dewleta civakî ji nû ve were biserûberkirin"; lêkolînê bê dudilî îdîa dikir, dibe ku pêwist be "Cenevre bixitime (6)". Di sibata 2009ê de jî karmendekî girîng ê bankayê digot ku, eger cudahîya di navbera revandina bacê û sextekarîya belgeyî ya bacê de ji holê were rakirin, navenda diravî ya swîsreyî dikare "heta nîvê bejna xwe (7)" piçûk bibe.

Yek ji wan îdîayan tenê jî neqewimî. Tevî guftûgoya herî cidî, ji şerê duyemîn ê cîhanê û vir ve, ya li ser sira bankayên swîsreyî, diravgeha swîsreyî, çalakîyên wê yên sereke, û birêvebirina sermayeyê, di rewşeke baş de xuya dikin. Di 2009ê de, bi taybetî bi desteka hêza franka swîsreyî (CHF) li hemberî euroyê, kîsên pereyan ên ku mişterîyên biyanî spartin bankayên Konfederasyonê, kêm nebûne û di ser de zêde jî bûne: çendeya net a herikîna pereyan bi qasî 120 mîlyar frankên swîsreyî ye (8). Her tişt îşaret jî pê dike ku çendeya 2010ê jî wê têr û sertêra bankavanên swîsreyî bike (9).

## Ji 1907ê ve...

Ji destpêka sedsala 20emîn ve, sira bankayên swîsreyî bûye mijara gelek rexne û êrişên dewletên biyanî, bi taybetî yên dewleta fransî. Sê nimûne:

- 1ê Tîrmeha 1907ê, li Meclîsa parlamenteran, wezîrê malîyeyê yê fransî Joseph Caillaux amadekarîya vê gefxwarinê dike: "Ez hîn nebûme bi dengekî bilind ne behsa projeyên xwe bikim (...) ne jî danûstandinên bazirganiyê bikim, lê belê ez dikarim ji bo yên welatîyên xwe yên ku, bi fors û nîşanên xwe, bi hêsanî biçin Swîsreyê, vê yekê bikim (...) û divê ew ji ber vê yekê zêde şaş û şok nebin. Bi her halî, ez dikarim pir bi zelalî ji wan re bibêjim ku pêkhatina peymanan [li ser pevguhertina saloxdarîyên di derbareyê bacê de] êdî tenê li ser destnîşankirina tarîxekê maye; lihevkirin bivênevê wê rojekê bigihîjin encamekê (1)". Hewldan û pêdaketinên Caillaux tu caran neçûn serî û fêkî nedan.

- "Sira bankayan ne dogmayeke navneteweyî ye (2)": bi wan gotinan, di çirîya pêşîna (oktober) 1923yê de li Civaka Neteweyan, birêveberê kargerîya malî ya belçîkî, bi xwespartina nûnerên fransî dest bi kampanyayekê kir û armanca wî ew bû ku di derbareyê pevguhertina saloxdarîyên karûbarên têkildarî bacê de bi Konfederasyonê re lihevhatinekê pêk bîne. Kampanya bi ser neket.

- Di çirîya pêşîna (oktober) 1932yê de, hikûmeta Edouard Herriot hesabê hingavtina derbeke mezin dike. Hikûmeta wî li Parîsê digire ser şaxên bankayeke sereke ya swîsreyî ya demê û dest datîne ser lîsteyeke navên hezar welatîyên fransî –ku hemû jî kesên ji qata bilind a civakê ne– yên ku bi alîkarîya wê bankayê dizîya bacê dikin. Ev skandaleke pir mezin e, lê belê operasyon wê negihîje encamên hêvîkiri. Ev yek wê bike ku rayedarên swîsreyî sira bankayê baştir veşêrin û di 1934ê de bi derxistina qanûneke taybet, parastina vê sirê saxlemtir bikin. Wisa xuya ye ku operasyon, berevajî armanca xwe, bûye sedemeke girîng a hilweşîna hikûmeta Herriot di kanûna 1932yê de (3).

S. G.

* Profesorê dîroka hemdem li zanîngeha Lozanê. Nivîskarê pirtûka "Siyaseta Kasayên Vala. Dewlet, Pereyên Raya Giştî û Cîhanîbûn", Tevgera Lêgerînê di Zanistên Civakî de, hej. 146-147, adar 2003.

1 Bo nimûne, dihate pêşbînî kirin ku geryana sermayeyan li gel welatên li ser lîsteya bihuşta bacê, were astengkirin an jî qedexekirin; cf. Neue Zürcher Zeitung, Zurich, 7-8 adar 2009

2 Neue Zürcher Zeitung, 29 çile 2010

3 Bultena fermî –îfadeyên devkî yên Konseya Neteweyî û Konseya Dewletan. Konseya Neteweyî, 19 adar 2008, www.parlament.ch/F

4 Bruno Gurtner, "Bank Secrecy: Switzerland Circles the Wagons" ["Sira Bankayê: Swîsre wagonan bi hev ve girêdide"], Tax Justice Focus, www.taxjustice.net, cild 6, cotmeh 2010, r. 4-5

5 Le Temps, Cenevre, 28 mijdar 2000

6 Jean-Christian Lambelet û Alexander Mihailov, " Giranîya diravgehên swîsreyî, cenevreyî û lemanî", Institut Créa, Lozan, 2001, r. 50 û 52

7 Le Temps, 24 sibat 2009

8 Neue Zürcher Zeitung, 15 çile 2010, û L'Hebdo (Lozan), 22 nîsan 2010

9 Neue Zürcher Zeitung, 18 mijdar 2010

Wergera ji fransî: Baran Nebar


# KULTUR-POLÎTÎK

KEJO BAJÂR

## Teyrê Sîmir: Ehmed Huseynî

*Me bar dikir û qantirên bînçikiyayî beriya me diwestiyan, bi çavine girikî li me temaşe dikirin û hêdî hêdî digiriyan".*

Hûtên dijminê serê peyva me, an peyva ma ser jê dikirin, an jî buxçikên dildarên peyvê dida ser pişta wan û berê wan dida bajarên Ewropayê yên stewr. Di nav van geometrîyen şayîk de an meriv dev li zimanê xwe dike û aş dibe, an jî mirov boxçikên xwe vedike û bi qêrîn welatan ji nuh de ji xwe re ava dike. Ehmed Huseynî yek ji wan kesan e ku li ser tûmekî beton yê "şaristanîyê" rûniştî, destê wî li ber rûyê wî, çavên wî tije toza bablîsokan û bi fantazmagorîyeke bi xwîn berê xwe daye birînê û welatên tozê.




Temenên cênîkên wan derizandî tim axîn jê diherin. Ew axîna ku di nav serdemên pak de xanîyên kerpîçî ji xwe re ava dike. Ew axîn, di salona jiyanê de li pîyanoya qewmekî parsûşikestî dixîne. Ew axîn li bin çîyayê bedirxanîyên helbestê digevize.

Ew çav tim li pey koremarê do dikeve û koremarê wî jî li pey wî. Ka kî keysê bi kê xîne dê hevdu jahrdayî bike. Her ku ew çav dixwazin ber bi *"Newala Zerê"* werin, newal hew qasî dibin rewrewk û bi dûr dikevin, her ku dixwazin li *"Girê Mozan"* kon vegirin, gir hew bi qasî ji goristanên xaka xwe dûr dikeve. Ne belasebeb e ku em di nav helbesta Huseynî de ew çend rastî nîşaneyên xatirwestinê tên.

Bênder, oxir, hûçik, qantirên li nav sînoran, libakirina destmalê, kezî, gulî, Zînên kelogirî, kulînên nivîna,"dara tuyê ya li hewşê, xanîyên ku derhal ba karibe pişta wan bişkîne".

Ji dûr ve rabirdû tim mobilezekiriye *"cîqen havînî ne sînga wan û Bayê Zozik li hev nakin"*

Çar sirûdên li dengê me hatiye rast kirin, roka ala me ji hev belawela kiriye û em kirine koçerên sîberê. Her li heyata me belav bûne, navbera me û peyva me firehtir kirine. Ew mesafe eger bihustek be kirine deh bihust, gavek be kirine deh gav, werîsek be kirine sed werîs.

Hilm heya xwe digihîne peyvê qeşa digire. Ev zemîna qutifandina elfabeyê ye, ev xwestina daqurtandina zimanek û zemanekî ye. Ev danjibirkirîna tarûmarkirina peyvan e, peyvên ku dikarin qala me bikin.

Di nav seqayê de peyva Ehmed Huseynî , "bîra hişê" me vedike û peyvê ji wir derdixîne, bi şkestina xwe vê yekê av dide û dixwaze zimanê ketî hilîne.

Tîna hibra Ehmed Huseynî (wek pêşîyên xwe) ruh bi elfebeya kurmanciyê ve tîne. Peyva hatiye şkenandin di nav lepên poema Ehmed Huseynî de êdi bi xwe bawer e. Şiîra wî di nav warên wêran de, warekî xweşik û bêndereke henûn ji bo çêlkewên helbestvanan amade dike.

Eger mirov rabe û ferhenga Ehmed Huseynî ji hev veke, mirov dê pêrgî karesatên kurdan bê. Ew peyv, li Çarçirayan sirûda ala yetam dixwîne ku di sînga Komarê de veşartî mabû. Ew peyv pehîna li sêdaran ketiye, êşa wê pehînê di nav parsûyên xwe de hîs dike. Wê peyvê derba xwe xwariye. Ew peyv, bi dixana li ser Sînemaya Amûdê ketiye re bûye hogir. Ew peyv, rextên Berîtanê baş nas dike ji ber ku gelek caran pê beligoşkên bîranînê teqandiye.

Ew peyv *"hespa xalê xwe bêsiwar"* e. Ev peyv, dizane xwe ji bircên Zekîyayê biavêje, ew peyv li deşt û çiyayên zikçiryayî xwe li dirûtina ferhenga zikçiryayî radikişîne. Wê peyvê pişta xwe daye dîwarên ku hema hema dike bihedime.

Genimê helbesta Ehmed Huseynî li nav sînorên şkestî şîn tên, li wir sînoran dicebirîne."Şînocan" e.

**Nave pirtûkê**: Dîwan-Berhemên Giştî

**Helbestvan**: Ehmed Huseynî

**Çeşin**: Helbest

**Buha**: 23 TL


**Weşanxane**: Avesta

**ISBN**: 975-6637-33-9

## Bendewarên Adarê: Mihemed Ronahî

Romana Bendewarên Adarê ji kuxikek Mihemedê Saryayê heta kuxixek dinê ya Mihemedê Saryayê, bi hesabê kurmancî yê ji yekê adarê ta yekê adareke din, ji şikestîyên serhildanekê ta ber bi trajedîya malbetekê ve, dimeşe. Mihemed Ronahî wekî efsûnbazekî li ber tasa ava xwe rûdinê, bûyerên civaka feodal yek bi yek bi kurmancîyeke xas lê dike. Her ku pêlên ava tasê li ber wî dikevin, rûqetên vê romanê jî yek bi yek derdikevin holê: Hosteyê dîwaran Mihemedê Sarya li gundê İbika jina xwe ya duyem aniye û aqûbeta jina wî ya ewil jî nayê zanîn. Li gor hinekan wexta Mihemedê Sarya vegeriyaye malê, ew di nexweşxaneyê de miriye, hinek jî dibêjin wexta mêrê wê vegeriyaya malê, ew ji nexweşxaneyê revandine û li Stenbolê xistine ser rêya xerab. Elîyê ji Fatmayê (jina ewil) nixurîyê malê ye û şivantîya pezê xwe dike. Elî bixwe xezeb di çavên wî de ne. Her roja xwedê ku serê hinekan neşkîne tuneye. *''Jixwe min xaltîya xwe Besê kuşt, qene ez vî Remoyê bênamûs bikujim û birevim.Tê cem Remo . Xeberan ji Remo re dibêje û xwarê erdê dibe. Kevirekî digire û du sê caran li serê Remo dixe. Remo dikeve û Elo baz dide berê xwe dide deştê.''* Piştî ku Elo hewqas xwîn di nav romanê de li dû xwe dihêle ji bo ku diya xwe ya mirî an jî ya sax bibîne, dest bê rêwîtîyekê dike.

Qonaxa ewil ya rêwîtîyê, gundê Beşîlê ye. Li wî gundî Elî dest bi şivantîya malbateke dewlemend dike û dilê wî dikeve kevaniya malê Sitê. Çend mehan bi şûn de jî perê xwe yê şivantîyê dixe bêrîka xwe û berê xwe dide Stenbolê. Êdî li pey diya xwe, li pey cebirandina sêwîtîya xwe ye. Weke kirûyek sosoyolojîk em dizanin ku gava mirovên kurd diçin biyanistanê di karê herî bêrûmet de dixebitin û wisa aborîya xwe ava dikin. Barkêşî, mîdyefirotin, solboyaxkirin, cixarefirotin ji wan kara ne. Dendikfiroşî jî dê bibe para Elî. Elîyê ku bi carekê lingên wî bi bajaran nebûye, li bajarekî weke Stenbolê mat û metel dimîne. Bi dendikfiroşîyê dikeve nav gramera wî bajarî û bi nigekî qop ji gramera wî bajarî derdikeve. Hevalê wî Şêrô rojekê kutanê ji xwedîyê dikanekê dixwe. Elî bi vê dihese û li pey heyfê dikeve. Derba xwe bi keviran li xwedîyê dikanê dixe, lê bi damançeyê derba xwe jî dixwe. Sê gule li Elo dikevin. Ya li çîpa wî dikeve, nigê wî seqet dihêle.




Romana kurdî çer ku ji warê xwe derdikeve, dewx dibe. Çawa ji tora otantîkbûna xwe derdikeve, hemû dîmenên ku ava dike di ser serê xwendekar de hildiweşin. Bendewarên Adarê jî dê me di vî warî de hêvîşkestî nekin. Mînak: *"Li hember mezinahîya Stenbolê dewxa wî çûbû. Gava otobos di ser pirê re derbas bûbû, yekem car bahr dîtibû."* Lê yê ku piçekî bi bajarê Stenbolê dizanin vê yekê jî baş dizanin. Mirov berî têkeve wî bajarî li Îzmîtê çav li bahrê dikeve. Di dîmenên kartpostalan de hişê romana kurdî diderize û lejantên rêya xwe wenda dike.

Li ser pencereya romanê ya ku berê wê bi hêla Kurdistanê ve ye, ev bûyer diteyisin: Hewê ya xwişka Elî bi sorikan ketiye û miriye. Mihemedê Saryayê bi jana zirav ketiye û li ber mirinê ye. Wexta Elî bi lingekî qop û bi xelatan (ku ji bo xwişka xwe ya mirî kirasek û cotek solên sor jî anîne) vedigere gund rewş ev e. Di yekê adarê de bav serê xwe datîne ser sînga lawê xwe û dimire.

Di fona vê romanê de, ku weke bûyerek feoadalî dixuye, serhildêrîya mah-kûman a li hember dewletê, weneyên Şêx Seîd yê bi dîwarên mala ve daliqandî, Pîroyê ku piştî serhildanê aqil avêtiye û dastanên kurd yên êvînê hene. Romanek di tahma kilamên radyoya Êrîvanê de.

**Navê pirtûkê**: Bendewarên Adarê

**Nivîskar**: Mihemed Ronahî

**Weşanxane**: Ronahî

**Çeşin**: Roman


**Buha**: 10 TL

**ISBN**: 978-6-0542-8707-9

## Şilfîtazî: Baba Tahirê Uryan

*Baba Tahir diçe medreseyekê û dixwaze li wir bi cî bibe. Li medreseyê şagirdên din jî hene û henekên xwe bi dilpakîya wî dikin û tu caran jê hêvî nakin ku ew ê mirovekî şareza û xwedî ilm û îrfan jê derê. Lê ew şagird dixwazin yarî û henekên xwe pê bikin. Tahir ji şagirdên der û dora xwe dipirse; "Gelo ez ê bi çi awayî bikaribim bibim xwedî ilm û îrfan?" Şagirdên medreseyê;*

"Ku tu şeveke zivistanê heta sibê di hewza medreseyê, di nav ava cemidî de bimînî; tu yê bigihîjî ilm û îrfanê." *Tahir jî wekî wan dike, di şeveke zivistanê ya bi qeşa de diçe dikeve nav ava hewzê û heta sibê dimîne. Serê sibê di nav ava cemidî de dema*




*bi xwe dihese, gotina wî ya pêşîn ev e: "Emseytu kurdiyyen we esbehtu erebiyyen" (Ez kurd raketim, ereb şiyar bûm.)*

Ji vê anekdota ku Azad Zal neqil dike mirov dikare weke metafor destpêka asîmîlasyonê û destpêkek bi qasî Mezopotamyayê dûr dest nîşan bike. Baba Tahirê Hemedanî destpêka helbesta Îranê ya nivîskî ye. Lê îranî lorîyan weke kurd qebûl nakin û wan li ser nasnemeya pars(ek)an qeyd dikin. Li hemû welatên ku li ser hîma netew- dewletê hatine damezrandin, ev tişt heye. Kengî etnîsîteyên di nav wê netewê de tiştekî baş derxînin holê wan li ser xwe dihesibînin; lê kengî ew tiştekî xerab bikin, dibin mijara girên dîrokî yên serdestên xwe û kerba xwe di serê wan de derdixînin. *''Ez ji ber vê çerxa çep dadê dixwazim."* Lê *''newaya nalînên"* dubeytên Baba Tahir wê ji tûrikên parsekan derkevin û li xwedîyên xwe vegerin.

*Delal, nava çavên min qesra te ye*
*Nav du çavên min cihê piyê te ye*
*Ditirsim tu xafil gav biavêjî û*
*Piyê te ji mûjankê min biêşe*

Ev dubeyta jorîn ku hezar sal berê hatiye nivîsandin, dikare li ser table-tan jî û li ber serê bahlîfa helbesta kurmancî jî bê nivîsandin. Herkes dikare vê dubeyta jêrîn ji yara xwe re bixwîne ku ji çîyayê Ferhad bilindtir û ji çola Mecnûn bi rewrewktir e.

*Eger dil dilber be, ma dilber kî ye*
*Dilber dil be, navê dil çi ye*
*Ez dil û dilber tevlihev dibînim*
*Nizanim ku dil kî û dilber kî ye*

Çi baba (Tahir), çi mele (Cizîrî), çi şêx (Senan), çi beg (Pertew), çi hezret (Xanî), çi feqî (Teyran). Di asta hêmasazîya helbestê de perîkên teyrikan yên di hibrêdekirî dê bikin ku helbestkar li ser yarê dîn bibin û ji dîn derkevin. Di zikra Baba Tahirê Uryan de ev rist derdikevin.
*''Dil ji cewra pûtan birîndar e."*
Her zikir pêş de biçe û dengê erbanê zêde bibe dê rist hêçtir bibin.
*Were were îmana min tu yî.*

Her ku xwîdan sar bibe û sîya tilîyên li ser erbanê aş bibin, dê tirafa dilê Baba Tahir gur bibe, gur bibe û berzûrî Xwedê bibe.
*Agir di sînga mi de ye, ey Îlahî*
Rîskek heye ku mirov li ser tekstên klasîk binivîsîne. Ji ber ku her di dawîya nivîsê de deqên klasîk xwe dişewitînin û ji bilî peyvên pênûsa xwe tiştekî nahêlin. Piştî wê şewitandinê li ser rûpelên reş hew tîpên elfebaya helbestkar tenê tên xwendin.

Di her xwendina dubeytên Baba Tahirê sotîdil de mirov "kurd radi-keve û kurd şîyar dibe."

**Navê pirtûkê**: Dubeytî

**Helbestkar**: Baba Tahirê Uryan

**Ji Lorî**: Sabah Kara

**Weşanxane**: Nûbihar

**Çeşin**: Dubeyt

**Buha**: 12 TL

**ISBN**: 978-9-9443-6084-5

www.arsivakurd.org

# *Jiyan bi kurdî xweş e*

## Televîzyonên Kurdî

Dîroka televîzyonên kurdî, televîzyonên zimanê kurdî gelek nû ye. Dema mirov difikire ku televîzyon ji salên 1950-1960ê ve di nav cîhana rojava de dest bi weşanê kiriye û di salên 70ê de ber bi rojhilat ve jî hatiye û zimanê kurdî heta bihara 1995ê, heta vebûna televîzyona satelît MED-TV jê bê par maye, wê demê zelal dibe ku televîzyon bi kêmayî 20 heta 30 sal derengtir ji zimanên din gihîştiye zimanê kurdî. Heta wê demê kurdan televîzyon tenê bi zimanê biyanî nas kirine. Vê yekê di serê gelek kurdan dê şopeke neyînî hîştiye ku qey bi kurdî televîzyon çênabe, kurdî ne ji wan zimanan e ku bikeve serzemînê zimanên din û pê weşanên televîzyonê çêbibe.

Di Adara sala 1995ê de MED-TV dest bi weşana zindî ya televîzyonê kir. Weşana televîzyona kurdî li ser satelîtê bû û ji her aliyê cîhanê ve bi rêya sêlikên peykî karibû bê temaşekirin. Li Rojhilata Navîn, di navbera kurd û dewletên cîran yên dagirker de derveyî şerê siyasî, çandî û çekdarî şerekî sêlikan jî dest pê kiribû. Bi taybetî dewleta tirk davêt ser malan û satelîtên kurdên ku dixwastin televîzyonê bi zimanê xwe temaşe û guhdarî bikin û sêlikên peykî dişikandin, ji holê radikirin. Kurdên hejar hew pê serî derdixistin ku sêlikên eslî yên peykî bikirin, di wê demê de dest bi nûvekariya(îcad) sêlikan kirin û bi sêlikên sifre û sehanan li televîzyonê temaşe kirin. Televîzyon ji bo kurdan bû moralek, baweriya pir kesan bi wan hat ku zimanê wan jî dikare di asta herî bilind, di asta satelîtê de bi kar bê. Televîzyon mîna "şoreş" mîna "bûyera sedsalê" dihat nirxandin. Herçiqas bernameyên kurdî ji yên zimanên din di yekemîn-televîzyona kurdî de kêmtir bûn jî, pêşwaziya MED TV ji aliyê hema bêje hemû kurdan xurt û bi kêf bû, moraleke mezin bû.

Duyemîn-televîzyona kurdî KURDISTAN TV bû, ku li Başûrê Kurdistanê vebû. KURDISTAN TV di sala 1999ê vebû û vebûna televîzyoneke din bi zimanê kurdî rewşa medyaya kurdî hîn çêtir kir, tirsa girtina televîzyona kurdî ji holê rabû. Êdî kurd xwediyê du weşanên satelîtî bûn. Rewşa înternetê jî, berepêş diçû, malperên kurdî ber bi zêdebûnê ve diçûn. Bi vebûna KURD-SATê di destpêka sala 2000ê (01.01.2000) rê li ber pêşketinê berfireh bû; tecrûbeya kurd û weşana televîzyonê gihîşt asteke din, asteke wêrekiyê, tirs ji ser têkçûn, jiholêrabûnê çû. Piştî sala 2000ê weşangeriya kurdî ji her aliyê ve zêde bû, di vê zêdebûnê de carna jihevcudakirina qelîte, neqelîte pirsgirêk dianî holê lê dîsa jî, pirbûna malperên zimanê kurdî, zêdebûna weşanxane, radyo û televîzyonan çanda kurdî gelek berepêş bir û hîn jî dibe.

Mirov dikare vebûna du kanalên din ên televîzyonê (KURDISTAN TV û KURD-SAT) bi demeke kurt pey hev mîna peqîneke pêşketinê binirxîne, piştî vê yekê heta roja me hejmara televîzyonên kurdî ji 30 (sihî) derbas bûne. Hejmar bi serê xwe mane nade der, divê ji aliyê kalîteyê û asta naveroka xwe jî bername û televîzyonên kurdî di nav hawirkanê de bin, hawirkana erênî dikare hejmara temaşevanan jî zêdetir bike. Gelek kurd hîn li televîzyonên zimanên biyanî temaşe dikin; hin ji wan kurdiya televîzyonên kurdî fêm nakin, hin jî, xwe bi televîzyonên kurdî îfadekirî nabînin, bername û tiştên pêşkêşkirî têr nabînin. Lê tiştekî zelal ew e ku êdî hîç kesek nabêje, bi zimanên kurdî televîzyon nabe, kurd nikarin bigihîjin rewşa gelên din. Bawerî û bi xwe bawerî çêbûye, niha ber bi qelîte û asta bilind ya naveroktijî ve gavavêtin li pêş hemû birêvebir û berpirsiyaran e. Dibistanên Medya û komunîkasyonê dikarin perwerdekirina kadroyên radyo û televîzyonê bînin cî; dibistanên weşangeriyê hebin, kêmasiya kadroyên televîzyonê ji holê radibe, bisporên vî karî zêde dibin. Bê şik zêdekirina pisporên televîzyonê beşek e ku girêdayê pêşketina bingehîn ya sîstem û organîzeya perwerdeya giştî ye.

www.arsivakurdi.org

## Naverok

SIBAT 2011


Hişyarîya bi xwe, di navbera nasnameya niştimanî û neteweyî de
Marwan Othman
R. 1

Gava rejîmên ereban dihejin
Riza Dinç
R. 1

Ji çapemeniyê
R. 2

Ya nemumkin diqewime
Serge Halimi
R. 3

Bi awirê hevalbendên wê, dîplomasîya amerîkî
Philip Golub
R. 5

Jinên başûrî û vejîna femînîzmê
Camille Sarret
R. 7

Girtîbûna rizgarker
Cathy Fourez
R. 8

Jinbûn li Çînê…
Laurent Ballouhey
R. 9

Amerîkaya Latînî xwe vedixwîne Rojhilata Navîn
Maurice Lemoine
R. 9

Li Başûrê Sûdanê kronîka serxwebûnekê
Marc Lavergne
R. 10

Başûrê Sûdanê – dema damezirandina dewleteke hatiye
Anne-Felicitas Görtz
R. 11

Bêîstîqrarkirina dewletan û jihevçirandina gelan li cem bîrên petrolê
Ahmad Faroughy
R. 12

PDKÎ çareserîyeke federal dixwaze
Ana-Helena Krulich-Ghassemlou
R. 13

Çirûska pêşî: Mihemed Bouazîzî
Olivier Piot
R. 14

Guherîneke çawa li pêş Tûnisê ye?
Amin Allal
R. 16

Êdî kes li benda Godot nîne…
Celîl Kaya
R. 17

Tûnis û serîhildana biserketî
Hicham Ben Abdallah El Alaoui
R. 18

Çavdêrîyên sefîrekî
Eric Rouleau
R. 19

Cezayir: Dewlet, civak, nakokîyên welatekî
Kader A. Abderrahim
R. 20

Di neynika şoreşa tûnisî re Misir
Sarah Ben Nefissa
R. 21

Gelo bi rastî jî dawîya sira bankayên swîsreyî tê?
Sébastien Guex
R. 22

Kultur - Polîtîk
Kejo Bajar
R. 23



## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB